

BERÎ HER TIŞTÎ ZIMAN

Gulistan



Dr. Abdullah Kiran
Rojen Barnas
Xurşîd Mîrzengî
Kaleciwan
Adar Jiyan
Rîza Çolpan
Enver Karahan
Recep Dîldar
Şahînê Bekirê Soreklî
Salihê Kevirbirî
Şerabî
Berken Bereh
Emerîkê Serdar
Rênas Jiyan
Xelîl Mûradov
Kawa Nemir
Evdile Koçer
Gelnasê Amedî
Huseîn Muhammed
Osman Mehmet
Mûsa Vazgalî

Sal: 1
Hejmar: 4
Gulan 2002

Gulistan

Kovara Çandî û Edebî ya Mehane
Gulan 2002

Bi Navê Evin Turizm İnşaat ve
Yayıncılık Ltd. Şti. Xwedî:

Zozan SEZEN

Berpirsiyarê Nivîsan:
Mahfuz YILDIZ

Şêwirmendên Hiqûqî:
Av. Kamber SOYPAK
Av. Ercan SEZGİN

Berpirsiyarê Giştî:
Dr. Abdullah KIRAN

Navnîşan (Adres)

Tarlabaşı Caddesi No: 95/1
Beyoğlu/İSTANBUL

Tel/Fax: 0.212- 237 10 61

E-Mail: kurtkav@ttnet.net.tr

dilges@ttnet.net.tr

ISSN: 1303-3743

Pergala Bergî û Rûpelan:
Ozgur BASUT

Şertên Abonetiyê (Salane)

Li Tirkîyê: 36.000.000 TL.

Li Ewrûpa: 48.- Euro

Li Amerika, Avusturalya

û Kanada: 45.- \$

Îlan:

Rûpelê Paşîn:

400.000.000 TL.

Rûpelê Navberê:

150.000.000 TL.

Hesabên Bankê:

Mahfuz Yıldız

Yapı ve Kredi Bnk. Taksim Şub.

No: 0552121-6 (TL.)

No: 3009448-2 (EURO)

Hesabê Postê: 1051173

Çapxane: Yön Matbaası

Tel: 0.212- 544 66 34

Kovara Gulistanê, di çarçowa
proja MATRA/KAPê de, bi alî-
kariya Sefaretxana Hollanda ya
li Stenbolê çap dibe.

NAVEROK

Dr. Abdullah Kiran2-3

Rojen Barnas Wêne4

Xurşîd Mîrzengî Ji Canê re.....5

Hevpeyvîn bi Zinarhe Xamo re.....6-11

Kaleciwan Hewara Xebatê.....12-17

Adar Jiyan Roman sîtava jiyanê ye....18-22

Riza Çolpan Reş Girêdan.....23-25

Enver Karahan Sê giyar û sê navdar...26-29

Hevpeyvîn bi Kerem Gerdenzerî re.....30-38

**Recep Dildar Ji hêviyên çavên xwe
ronahiyeke hîde min**.....39

Şahîne Bekirê Sorekî
Hîn hebû hêvî.....40-41

Salihê Kevirbirî Şakiro.....42-45

Şerabî Nameyeke vekirî
ji Şerabî re.....46-48

Eskerê Boyîk Bazin.....49-51

Edîp Polat Destanê Zend.....52-61

Îsa Eskîn Gulistana Zarûkan.....52-65

Berken Bereh Karapetê Xaço.....66-68

Emerîkê Serdar Hetanî kengî.....69-75

Rênas Jiyan Muptelayê Hibrê.....76-80

Xelîl Mûradov Ewledê Cimetê.....81-88

Osman Mehmet Du Kavil.....89

Temûrê Xelîl Têderxistinok.....90

Apê Emer Gotinên Pêşyan.....91

Evdile Koçer Kurdistan.....92-95

Gelnasê Amedî Welat û Gelvanî.....96

**Huseîn Muhammed Karakter û rewşa gelê
gelê kurd di romana "Fîlozof" de**.....97-101

Kawa Nemir Amadekarî.....102

Mûsa Vazgalî Kumreş.....103-106

Merheba!..

Ji bo ku zimanê min, dengên welatê min jibîr neke, ez xwe bi xwe re dipeyivim.

Ovidîus

(Şairek Romayî yê ku şandibûn surgûnê)

Em nebûne mîlet an ku em mîletbûna xwe hunda dikin?

Ez dixwazim bi lêborînekê dest bi vê nivîsê bikim. Ez ji tevahiya mîletê Kurd erzê xwe, ango lêborîna xwe dixwazim. Ez lêborîna xwe dixwazim, çimkî bi salan min şaşiyekê kir. Îro hewce ye ku ez vê şaşîtiyê rast bikim û ji ber kêmahî û qûsûra xwe bexişandinê bixwazim. Bexişandina xwe xwestin lebateke mirovî ye, karekî şereftî ye. Loma bi ya min, li dera ku em bi şaşiyê hesiyar, divê em zû zûka wê şaşiya xwe rast bikin.

Şaşî, ango çewtî çiqas were parastin, ewqas mezin dibê û hê bêtir mirov dêsîne. Ji şaşiyê vegeerîn, wek di ticaretê de ji nivê zirarê vegeerîne ye. Çimkî ji nivê zerarê vegeerîn kar e. Îcar wek ku min berê jî gotibû, pêncî hezar mirov ji tiştêkî şaş re bêjin rast e, dîsa jî ew şaşî rast nabe. Di rewşeke weha de, ya ku dibê ev e: Şaşiya biçûk hê mezintir û bi zîrartir dibê. Ji şaşiyê vegeerîn, berpirsiyariyeke mirovî û ehlaqî ye. Bêguman her ewqas jî helwesteke ronakbîrî ye.

Bêyî ku ez we xwendevanan di meraqê de bihêlim, ez dixwazim ku bêm ser wê şaşiya ku bi salan e min dikir. Gelo ev şaşî çi bû? Kesên ku me dinasin, kêm zêde bi me, bi bîr û rayên me, bi welatevîniya me ya bi dînîti dizanin. Bi salan min di nivîsên xwe de ev yek dianî ziman: Em Kurd hê nebûne mîlet.

Îro gava ku ez li pey xwe dinêrim, ez dibînim ku min şaşîtiyeke mezin kiriye. Îcar hê ku ev şaşîti bêtir mezin nebûye, bi destûra we ez dixwazim rast bikim û

bi vî awayî ji ber berpirsiyariyeke dîro-kî, ehleqî û mirovî derkevim.

Gotina, Em Kurd hê nebûne mîlet şaş e, şaşiyekê mezin e. Ev ne tenê şaşî, herweha neheqiyekê mezin e jî. Min ji nezaniya xwe hem şaşiyekê û hem jî neheqiyekê kiriye, loma li min biborînin.

Gelo çima gotina, Em Kurd hê nebûne mîlet şaş e? Helbet divê em vê yekê piçêkê eşkere bikin. Sedemê esasî ev e: Em Kurd mîlet bûn, hem jî ji zû ve, ji dema prekapitalîstî ve. Em Kurd ji zû ve mîlet bûn, çimkî hê bi sedan salan berî niha li ser axa welatê me bi zimanê Kurdî dihat peyivîn û em Kurd, ji Sêwasê heta Qersê, Kirmançşah û Silêmaniyê û derên din ên ku Kurd gihîştibûnê bi Kurdî dipeyivîn. Têgihîştin û ji hevdû fêmkirina Kurdan a sêsed-çarsed sal berê, ji dema îroyîn a multîmedyayî pîrr çêtir û xurttir bû. Eger şikek di serê we de heye, kerem kin, rakin qlasîkên Kurdî û li derên ku hê tenê Kurdî lê tê peyivîn bigerin. Hûnê bibînin ku bi çi awayê Elî Herîrî, Feqiyê Teyran, Meleyê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Evdalê Zeynikê tîna fêmkirin.

Welatê me li ser gergeha rîya Îpekê bû, bi hezaran bazirgan û karvan ji bo ku bigihîjin dera ku diçinê, bi rojan, bi heftan, bi mehan li ser axa welatê me rêwîti dikirin. Di rêwîtiya li ser axa welatê me yê ku ji hezar kîlometreyî derbas dibû de, zimanê ku dihat peyivîn, bêşik Kurdî bû. Kurdekî Sêwasî û Wanî, Kurdekî Diyarbekirî û ji Silêmani yê, Kurdekî ji Meletiyê û yekî ji Ormiyê, dused- sêsed sal berê, di gel ku bi sedan kîlometre di navbera wan de hebû û wusa bi rihetî nikaribûn biçûna ba hev jî, gava ku li hev rast bihatana bi Kurdî ji hev fêm dikirin. Çimkî yekîtiya zimanê me, bi qasî ku li tu dereke dinê nayê dîtin pêk hatibû. Û em miletek bûn.

Eşkereye ku çend sed sal berê, bi kê-

manî ji sedan 70-80yê civata Kurd ji hev fêm dikir. Hingê rewşa ji hev fêmkirina Kurdan bi gellek awayî di ser hin gelên ku îro bûne dewlet û zimanê wan li pir-raniya dinê tê hînkirin de bû. Gelo beriya ku Yekîtiya Almanyanê pêk were, ji sedan çendên Almanan ji hev fêm dikirin? Lê beriya şoreşa mezin a Fransizan? Gelek statîstîkên cihê hene, belê em dikarin bêjin ku li van herdu welatan jî demekê, ev zimanên ku îro resmî ne ji alî %80yê civatê ve nedihat fêmkirin. Belê îro li seranserê van welatan û hema bêje li nivê dinayayê ev ziman tên xwendin û hînkirin.

Me Kurdan fersendên dîrokî yên mezin hunda kir. Rast e, pirsra ziman pirseke siyasî ye û di siyasî de têkçûna Kurdan sedemek bingeîn e rewşa me ya îro ye. Belê dîsa jî, diviya ku ev ziman evqas jî neketa nav dest û piyan. Bi vî awayî bêrûmet nebûya.

Hemû diyardeyên dîrokî û civakî nîşan didin ku me Kurdan, beriya bi sedan salan ji îro bêtir û çêtir hev fêm dikir. Îcar îro, hûn ji hevdu fêmkirina me deynin aliyekî, bi sed hezaran, bi milyonan Kurdên ku Kurdî di malên wan de nayê xebitandin, roj bi roj ji Kurdî û Kurdbûnê re xerîb dibin hene. Mixabin ku ev sosret rastiyeke civata Kurd e. Nexwe ev sosret çi nîşan dide?

Bi derba pêşîn, tiştê ku ez dibînim ev e: Em Kurd gav bi gav wesfên xwe yên miletî hunda dikin û di çerxa heyî de dihelin û diçin. Dixwazin hûn ji vê yekê re asîmilasyon, dixwazin jî entegrasyon bêjin. Ferq tune. Hemû rê dertên deriyekî û ev derî jî rîya hundabûnê, ango rîya ji holê rabûna miletê Kurd e. Çimkî zimanê me, yanî ya ku me dike em diçe. Û em hunda dibin.

Em kî ne? Armanca min bi em rastiya miletê Kurd e. Bi gotineke din wî xelqê ku bîr û rayên xwe, hîsên xwe, şîn û şahiya xwe bi zimanê Kurdî îfade dikir.

Wî xelqê ku hîsên wî li hember Koçgirî, Diyarbekir, Dêrsimê, Geliyê Zilan, Mahabadê, Helepçe û Enfalê yek bû. Wî xelqê ku her bi eynî zimanî dipeyivî.

Sed heyf e ku ev ziman hunda dibe û zindîbûna vî miletî jî bi xwe re dibe. Ji ber vê yekê ye ku ez lêborîna xwe dixwazim. Loma ez dibêjim ku nêrîna, Kurd hê nebûne milet şaş e. Bi ya min, rastî ev e ku Kurd do milet bûn, belê îro bi hundakirina zimanê xwe re wesfên xwe yên miletî hunda dikin. Çimkî do, her Kurd bi Kurdî dipeyivî, ji bo her Kurdî doza ziman, doza namûsê û doza welat bû, belê îro ne wusa ye. Çi ji zilm û zora li ser me, çi tadayê, çi ji ber şertên aborî, çi ji ber surgûnê û çi ji ber sistî û bêhelwestiya me be, me dev ji vî zimanî, ango ji doza Kurdbûnê berdaye.

Tirk, beredayî ji bo me nabêjin Kurdnîjad. Kurdbûn tiştêk, Kurdnîjadî tiştêk e. Kurdbûnî, bi zimanê xwe, bi bîr û raya xwe, bi her tiştê xwe hê jî Kurd mayin e. Kurdnîjadî, dema çûyî ya ku bi îro re ne têkildar e destnîşan dike. Bi gotineke din, bav û kalên yê Kurdnîjad, Kurd bûne, belê îro ew bi xwe ne Kurd e û mensûbê miletekî din e. Ji bo Kurdekî ku hê jî Kurdbûna xwe dijî û di mala wî de bi Kurdî tê peyivîn re Kurdnîjad gotin neheqiyek e, ji neheqiyê zêdetir bêedebî ye. Kesên ku doza ziman, doza namûsê û doza welat dizanin, vê neheqî û vê bêedebiyê ranagirin.

Sed xwezî bi wan ku hê jî di malên xwe de, bi malîyên xwe, bi zar û zêçên xwe re bi Kurdî dipeyivin. Hezar xwezî bi wan ku doza ziman, doza welat û doza namûsê dizanin. Kurdnîjad, hay ji xwe hebin û xîret bikin. Çimkî em di merhele ji miletbûnê derketinê de ne. Loma, ne ku hê em nebûne milet.

Heta hejmareke din, di xweşiyê de bimînin.

Dr. Abdullah KIRAN

Wêne

Salên westiyayî di neynika

Ruyê wî de mane bêtaqet

Ku hîva çardeşevî jê geşî distend

Û jê hêzê, gurr-sûlava hêviyê

Gelo sal bê bext in? an

Zeman nankor e, ku d' pey demek de

Jarî davêje bedena pola

Û pîrpizêkê talan dike ji keviyê?


A girîng bîra min e, dîsa

Ku l' ser perdeya wê gul her geş e

Jê, hêza jînê difûre her tim

Ne talan dibe, ne d' çilmise, ne d' weşe...

Ji Canê re



Xurşîd Mîrzengî

Li Parisê, li Kafe du la Ferance, bi fincana qehweya serê, di nava wan bedewên feransawî de, tu hatî deşta xiyalên min, Canê.

Ew payiza ku em ji ser rezan hatibûn xwarê, piştî xurîniyê, ew palgehên ji qedîfeyê kesk ku me hîn nû kiribûn, te li ser pal dabû, fena Sara Birahîm Xelîlullah. Paldaneke bi bereket. Bi ferman te ji min re got: "Rabe ji min re qehweyek bikelîne! Bi-

la şekirê wî hindik be!" Fena niha tifikên gaz û elektirîkê tunebûn. Ez daketim hewşê û bihurîm metfexê. Min pêşî îspirto xist dora tifikdonê. Piştî germbûna wê, min derzî li kuna wê da û min pompe lê da. Xuşînî ji tifikdonê çû. Dûvê cezwe di destê min ê çepê de, ez bi destê rastê qehwê tev didim. Dema min şekir avêt, hindik mabû ez qehwê birijînim. Ew fincanên fêrfûrî ku Kalê min ji Hecê anîbûn, min li ser wê sêniya ku bavê min bi kirvê Dîkran dabû nîgarkirin, danîn û dagirtin.

Dema min sêniya qehwê bi tevî şerbîka cam ve anî, li pêş te li ser maseya nizam ya ku wî necarê çarşîya Xeratan arizî ji bavê min re çêkiribû danî, te serê xwe bilind nekir. Lewra Dîwana Seydayê Cizîrî li ser çogên te, tu zêde daketibû xwarê, nava felsefeya tesawîfê. Te serê xwe ranekir û sipas nekir. Xwendina Dîwanê çiqas bi te diketin. Eşkêrê bû ku felsefeya Mele te dîl girtiye. Diyar bû ku Seyda salix û silûxên bedewa jinan Selmayê dide. An jî tu di guft û goyên Mele û Mîr Emadedîn de xerk bûbuyî.

Ew fistanê te yê ji hevrişma Hevêdan, yê gulgulîn ku te bi destê xwe bi mekîneya Zenît dirûtibû. Pêşîya wî, ji binê qirikê heya dawa jêrîn bi qumçik bû, reng vedidan. Sê qumçikên dawa fistan, te vekirî hîştibûn. Ji ber ku te ling avêtibûn ser hev, bihustekî pişta jûnî, ranên te xuya bûn. Wan ranên gewezîn, ne tîrek, çar tîr bi hev re ji kevan berdan. Ez xulam, min bibexşîne, lê ger ez şaş nebim, derpiyên te yên kinik jî xuya bûn. Ger baş were bîra min, rengê wan çûr bû, ne wisa?

Li miqabil wê rûniştina te ya xanimane, fena beniyên dewra berê, ez secde bûn. Min ranê te yê rastê tewf kir. Ji ber ku te zanibû ez evdal û pepûkê te me, tu hîn hay lê buyî ku min qehweya te aniye, tu bi wî pepûkiya min bişiriyî. Te guneyê xwe bi wê rebeniya min anî. Ez kêma û zêde nabêjim ne wisa? Bi rastî ez wê gavikê ketibûm kirasê evdalan, rebenên binê dîwaran, yên dismalê radixin. De bibêje ne welê bû?

Çavên min berjor tehisîn, ew lêvên te, bi xwendina sirra Dîwana Mele bûbûn gil-yazê herêma Alan, yê bexçeyê bavê Memo. Ez bi kitêbên ser destê şêxan û melan sond dixwim, bê te min ew reng di tu lêvan de nediye. Ew çi reng bû gidî? Ez ji qalikê derxistim. Ji bona tewafeke wan lêvan ez karibûm dîne xwe biguherînim, bibim zerdûşî û herim ser tirba Şêx Hadî, bibim heciyê agirperest. **11. 08. 2001. PARÎS**

Zinarê Xamo:

Werger çêkirina tevnekê ye!

Lokman POLAT: *Birêz Zinarê Xamo, hinek wergerên te hatin weşandin. Li gor te werger çi ye?*

Zinarê Xamo: Ji bo min werger çêkirina tevnekê, lêkirina avahiyekê ye. Ev avahî ne bi kevir, çîmento û hesin, bi gotinan ava dibe. Yanî ew jî xuluqandinek e. Çawa ku tu ji rîs tevnekê, ji kevir, çîmento û hesin jî xaniyekî, ya jî qesrekê ava dikî, di wergerê da jî malzemeyên te gotin in û tu tenê bi saya wan berhemekê tînî meydanê. Lê ev xuluqandin ne ji tunebûnê, ew bi alîkariya yekî din, yanî bi alîkariya nivîskarê tu werdigerînî tê meydanê. Ev alîkarî karê meriv him zor û him jî hêsan dike. Zor dike, ji ber ku tu nikanî tişteki ji ba xwe lê zêde bike ya jî jê derxe. Hêsan dike, ji ber ku ew tim li ba te ye û bi dizîka alîkariya te dike. Wek ku

tu li dengbêjekî biyanî guhdarî bikî û dûra jî wê strana wî wergerînî zimanê xwe û bi zimanê xwe bistirê. Lê divê ev stran him bi gotinên xwe û him jî bi meqam û muzîka xwe wek strana eslî be, di tu warî da divê jê dûr nekeve. Dema yek lê guhdarî bike, her çiqas bi zimanekî din hati-be gotin jî, lê divê dîsa jî yekser ew wê nas bike û bizanibe ku ew ya kê ye û kî distirê. Helbet ev ne karekî hêsa ye, jê ra zanîn û hostatî lazim e. Tiştê nivîskar qal dike divê meriv baş nas bike. Yanî divê tarîx û çîroka li pey gotinan, li pey cî û waran baş bizanibe û vê zanîne bikanibe bide xwendevan jî. Mesele dema navê Mele Mistefa Barzanî, Qazî Mihe-med, Şêx Seîd ya jî serokekî Kurd yê din, ya jî navê bajarê Helepçeyê di roman ya jî di helbestekê da der-

bas be ji bo xwendevanekî Kurd ew tenê ne nav e, bêyî nav gelek tiştên din jî tîne bîra wî; keyaleke ji van navan gelkî mezintir pê ra peyda dike. Niha divê kesê werger bikanibe vê zanîn, tarîx û çîroka li pişt gotin û navan bide xwendevanekî ne ji wî zimanê jî.

Di xebata wergerê da bi nivîskar ra girêdaneke meriv ya pir xurt, samîmî û ji dil heye. Meriv tim pê ra ye, pê dişewire û hewil dide ku din-ya wî ji nêz va nas bike û bi xwe jî têkeve wê dinyê.

Te heta nuha çend pirtûk wergerandine Kurdî û tu nuha jî tişteki werdigerîni ya na?

- Min heta nuha çend tişt ji Swêdî wergerandine Kurdî. Di nav van wergerên min da xebata min ya herî girîng, romana Sûsanna Tamaro ya bi navê Bide Dû Dilê Xwe ye. Min çer ew xwend, tavilê min biryara xwe da ku vê berhema hêja wergerînim Kurdî. Ji ber ku mafê Kurdan jî heye ku romaneke wiha xweş bi zimanê xwe bixwînin. Wek tê zanîn ev romana Sûsanna Tamaro, romaneke gelkî meşhûr e û li dinyayê pir bi nav û deng e. Wergerên min yê din hemû nivîs broşur û meqaleyên edebî ne. Ji Tirkî jî min hin çîrok û nivîsên li ser dîroka Kurdan ya nêz wergerandine. Ev wergerên min bi piranî di rojnameya Armanç û kovara Nûdemê da hatin weşandin.

Di wergerê da zahmetiyên ku derdikevin pêşberî te çi ne?

- Ez dikanim qala du zahmetiyên sereke bikim. Jê yek, ez jî di nav da,

tu kes vî karî bi hawakî proveysyonali nake. Û jixwe ne mimkûn e ku bike jî. Çimkî ewê ji kê ra bike? Yanî wek hemû karên me yê din, di vî warî da jî her kes bi hawakî amatorî û wek hobi yek caran hin tiştan werdigerînin. Lema jî meriv nikane qala hin wergerên proveysyonel bike. Dema rewş wiha be helbet pêşketin jî çênabe û însan nikanin vî karî baş jî fêr bibin. Wek tê zanîn karê wergerandinê îro li dinyayê di gelek zanîngehan da wek derseke ilmî tê xwendin û însan bi salan teoriya vî karî fêr dibin. Ne ku hema her kesê ku du zimanan bizanibe dikane berhemekê wergerîne. Ev jî bi hebûna hin dezgehên netewî û weşanxaneyên pir mezin û xwedî îmkân mimkûn dibe. Lê yê me Kurdan tişteki wiha tune, em di rûnê xwe da diqijilin. Em bi destopelkê û bi zanîneke gelkî kê yekcaran hin tiştan werdigerînin. Ev yek jî gelek caran dibe sebebên hin çewtiyên mezin û zirarê dide zimanê me. Yanî bi kurtî ez dikanim bibêjim ku amatorî, zanîna gelkî kê û sathîti gelşeke pir mezin e.

Ya din jî tunebûna ferheng û ansîklopediyên mezin û ciddî ne. Wek tê zanîn hafiza kesê wergêr ne ferheng û ansîklopedî ye, meriv nikane hemû gotin û biwêjên zimanê xwe ji ezber bizanibe, meriv nikane navê hemû dar û beran, navê hemû teyr û tuyan, navê hemû nebatan bizanibe. Ev tişteki ne mimkûn e. Di dema wergerandinê da divê hin aletên ku ji wergêr ra bibin alîkar û karê wî hêsan bikin hebin. Ew jî wek min got, ferheng û ansîklopedî ne, ku yê ne

tune ne. Dema ev tunebin gelo meriv çawa bikanibe qala wergereke bi sihet bike! Ferheng û ansîklopediyên me dost û hevalên me ne. Ew jî her yek bi serê xwe dikanin bibin ferhengek çewt. Gotinên wan kêman caran hevûdu digrin. Tu ji kîjanî dipirsî, dibêje weleh li ba me wiha dibêjin. Lema jî dikanin bi zanînen xwe mala meriv bişewitînin û meriv bikin pêkenîn. Helbet kes viya bi nêteke xerab nake, bi rastî jî wer tê bîra wan û lema jî wer dibêjin.

Mesela di dema wergera romana Bide Dû Dilê Xwe da min gelek zahmetî kişand. Em bibêjin ku di romanê da navê kulîlkekê, navê darekê, navê çûkekê ya jî navê kêzîkekê derbas dibe û tu bi zimanê xwe vî navî nizanî, tu yê vê problemê çawa hel bikî? Ji wergêrekî Swêdî ra problemeke wiha tune, çimkî di her warî da, ji çûkan, pisikan, kûçikan, pinpinîkan bigre heta bi dar û kulîlk û masiyan yanî di her warî da û li ser her tiştî bi sedan ferheng û ansîklopediyên taybetî hene. Bêyî van, meriv dikane ji gelek komel û kitêbxaneyan jî di her warî da rism û agahiyên pêwîst peyda bike. Yê me Kurdan îmkaneke wiha jî tune. Yanî bi kurtî ez dikanim bibêjim ku zanîna du zimanan têr nake. Yek, divê meriv teoriya wergerê (tercume-yê) baş bizanibe û di vî warî da xwedî fikir û dîtin be. Ya din jî divê ferheng û ansîklopediyên netewî û taybetî hebin. Bi baweriya min tunebûna van herdu tiştan ji bo karê wergerê zahmetiyên herî esasî ne. Lê ji bo romannivîs ya jî şairekî hebûna ferheng ya jî ansîklopediyan qet ne

grîng e, heta ne pêwîst e jî. Çimkî dema meriv romenekê ya jî şîrekî dinivîse meriv ne muhtacî ferhengê ye, meriv bi xezanî gotinên xwe hisên xwe tîne zimên. Lê di wergerê da eksê vê ye, tu tercumanê hisên yekî din î. Bi kêmasî di xebata xwe da min ev gelş dît û tiştên wiha his kirin.

Te çima û çawa dest bi wergervaniyê kir?

- Berî her tiştî ez ne wergeran (mutercîm) im. Erê rast e, min hin tişt wergerandine. Lê belê ev yek min nake werger (mutercim). Çimkî wergervanî jî wek her sinetekî din, ew jî bi serê xwe sineteke. Rewşa min ne weha ye. Yanî min ev yek ji xwe ra nekiriye karekî daimî û ez hertim nakim. Lê li alî din ez yekcar nan hin berhemên ku kêfa min jê ra tê û dixwazim ku ew nivîs ya jî ew kitêb bi Kurdî jî hebe werdigerînim. Vana jî bi piranî meqale û çîrok in. Tenê ya S. Tamaro roman e û ew jî hîn çap nebûye. Min daye weşanxana Dozê. Ew jî Xwedê dizane ku ewê kînga biweşînin. Dibe ku tew dernekeve jî. Jixwe çîroka vê romanê jî gelkî înteressant e. Min ev roman li ser daxwaza Firat Cewerî jî Swêdî wergerand. Lê dûra dema werger qediya bi nameyekê ez agahdar kirim, got alîkarî nedan min, lema jî qeweta min nagihîjê ku çap bikim. Û neweşand. Lema jî kitêb di hustuyê min da ma. Min da kê, ya çap nekirin ya jî ji min pere xwestin. Yanî di ser wergera xwe ya belaş da divê min perê çapkirinê jî bida weşanxana ku ewê ew biveşanda.

Belkî ez dikanim di vî warî da qala sebebekî din jî bikim, ew jî ez dixwazim ku xwendevan yekcarnan hin nimûneyên baş jî bibînin. Çimkî tiştên tercumeyî Kurmancî bûne ez nebêjim giş, lê hema hema piraniya wan (bi kêmasî yên ku min dîtine) tercumeyên pir xerab in û nayên xwendin. Dibe ku yekî bi Kurdî baş nizanibe bikaribe berhemên weha bixwîne, jê ra ne problem be, lê ji bo ne weha ye, ez nikanim; divê ya ez zimanê wê rast bikim ya jî nivçe bihêlim û nexwînim. Dema meriv hin wergerên bi vî rengî dibîne meriv nizanane bigrî, nizanane bikene. Lê jixwe gelek tişt jî nehatine wergerandin, ez bawer dikim hemû çend kitêb in. Berê her tiştî kesên ev berhem wergerandine ne xwedî tu zanîn in û di ser da jî bi Kurmancî jî baş nizanin. Çi heyf ku ev nezanî cesaretê jî dide gelek kesan.

Esas ne di warê wergerê da tenê, mesela romannivîsê Kurd yê herî meşhûr Mehmet Uzun jî ku îro li Ewrûpayê pir hindik tê naskirin, bi Kurdî nizanane. Bi kêmasî bi qasî ku roman binivîsîne û hewqas meşhûr bibe bi Kurdî nizanane. Çimkî di van çend salên dawî da fêrî Kurdî bûye. Heta di hevpeyvîneke xwe da dema qala romana xwe TU dike, ew bi xwe jî vê rastiyê qebûl dike û dibêje, gava min dest bi nivîsînê kir û bi qasî 50 rûpelî nivîsî, min dît ku ez nikanim binivîsim. Ji ber ku Kurdiya min têrî nivîsîna romaneke Kurdî nedikir. Ez nikaribûm ji binî derkevim. Hingê min dev ji nivîsandinê berda û dest bi xwendin û temrînên nivîsîna Kurdî ya edebî kir. Demeke dirêj,

min berhem, eser û weşanên kurdî ku diketin destê min, xwendin. Min ji wan not derxistin, lîsta peyv, cimle, gotin, edet û ûsilên nivîsîn fikirîna kurdî çêdikirin. (Mehmet Uzun. Hêz û Bedewiya Pênûsê, r.134)

Di vir da tiştê herî balkêş ew bi Kurdî nizanane lê xwe li nivîskariyê radikşîne û xwe wek hîmdar û pêşengê romana Kurmancî dibîne. Dîsa ew gramer û rastnivîsîna Kurdî fêr nabe, lîsta peyv û gotinan derdixe, gotinan ezber dike ji bo ku kopye bike. Yanî xezîna wî vala ye, ew bi xwe bi Kurdî nizanane, wek yekî biyanî gotinan jiber dike, ji bo ku wan di nivîsîn xwe da bi kar bîne û bi kar tîne û aniye jî. Van gotinan di sala 1993 an da dibêje û di rûpeleke din da jî weha dom dike:

“Eger ez îro rahîştima pênûsê, heye ku min ê ew bi awayakî din binivîsiya. Gava min ew nivîsî, ez pir pê qayil bûm. Lê çaxa ez îro lê vedigerim, dibînim ku kêmasiyên wê pir in” (Mehmet Uzun. Hêz û Bedewiya Pênûsê, r 145)

“Metnên min destpêkê nivîsandin ez nikarim liwan binêrim” (Mehmet Uzun. Ziman û Roman, r.142)

“Ez gava weha vedigerim û li tekstên xwe yên destpêkê dinêrim, ew bêt zimanê Kurdî her tişt in. Îro, yanî piştî xebateke bîst salan, bawerim ku ez gihştîme vî rehetiya ku ez bikaribim zimanekî ava bikim.” (M. Uzun. Ziman û roman, r. 120-121)

Lê çî heyf ku rastî ne weha ye, piştî bîst salan jî ew hîn Kurdî fêr nebûye û nizanane cumleyeke pir basît rast bibêje. Mesela ji dêlî ku bibêje Eger min îro rahîştima pênûsê ya jî eger

ez îro rahîjim pêûsê, dibêje “Eger ez îro rahîstima(!) pêûsê.” Yanî hîn nizane pronoma ez û min rast bi kar bîne, lê di zarvayê Kurmancî da xwe romannivîsê herî mezin dibîne. Her wisa cumla duduyan jî çewt e. Dixwaze weha bibêje:

Gava ez weha vedigerim û li tekstên xwe yê destpêkê dinêrim, ez dibînim ku bêyî zimanê Kurdî ew her tişt in. Îro, yanî piştî xebateke bîst salan, ez bawer im ku ez gihîştîme wê rehetiya ku ez bikaribim zimanekî ava bikim Z.X.

Ez dixwazim çend nimûneyên hîn xerabtir bidim.

“Nûjenbûna zimên, li gorê ku bi roja me bigunce, hewldan ji bo ku bi peywendiyên roja me yê civakî û kulturî bê danîn mabest e. Belkî ji bo meriv divê mijarê de tiştêkî bibêje, hê dereng e.” (ez bawer dikim dixwaze bibêje hîn zû ye Z.X) “Afirandina kevneşopîya romanekê, li gorê bi vê yekê re digunce, afirandina ziman û uslubeke ku xîtabî xwendevanên roja me dike, vedibêje, afirandina uslubeke edebî ye.” (M. Uzun. ziman û roman, r.140)

Bira çewtiyên îmlayî û gramatik li wir bimînin, wek cumle tiştêk jê nayê fêmkirin. Du numûneyên din:

“Nivîsandina min ya bi Kurdî, vegevandina bi Kurdî peyre hatiye pê.” (eynî eser, r.141)

Ez bawer nakim bêyî şexsê wî, kesekî din bizanibe bi vê cumleyê xwestiye çi bibêje.

“Lê bela ku min Kurdî dinivîsim, van zahmetiyan bi hizdarî (êdî hizdarî tê çi maneyê Xwedê dizane) himbêz diki.” Yanî ev jî Kurdî ye?

Ez bawer dikim dixwaze bibêje “Lê bela ku ez bi Kurdî dinivîsim, ez van zahmetiyan hemûyan bi dilşadî qebûl dikim.” -Z.X-(eynî eser, r.141)

Di hevpeyvînekê da pirseke wiha jê tê kirin:

Ji pênc romanên te çend li Swêd hatin weşandin?

- Çar ji wan. Çapa duyemîn jî li Tirkîyê hate pêkanîn. Hemû bi Kurdî û tu ji wan nehatine wergerandinê Swêdî. Ne jî hatine wergerandinê tirkî. Du bi Erebi hatin wergerandin. Dê wergerandina wan ya bi Fransî û Îngilîzî jî derkeve. Ji bo ku bi Îngilîzî bîn wergerandin peymaneke li dar e.(...) Kurdologên li Unîversîteyê (îcar Kurdolog, Xwedê meriv ji bêtaran bisitirîne! Z.X) bi qasî ku karibin heq ji wan bîn der li ser vî karî ne zal in. Ji bilî vê ji kalîta tiştê ku meriv difirîne, nayê zanîn. (M.Uzun. Ziman û Roman, r.145.)

Nuha meriv çawa dikane ji vê gêrmiya gavanan ra bibêje Kurdî? Wek tê dîtîn, yek gotin jî ne rat nehatiye gotin. Ji ber ku nizane bibêje. Ez bawer dikim Erebeke ku sê mehan çûba qurseke Kurdî ewê Kurdiya wî ji vê Kurdiya M. Uzun tekûztir bûya. Di cumleyeke here basî da jî hîn nizane pronomekê ya jî fiilekê rast bikar bîne. Ev nezanî û çewetiyan zimên di berhemên wî yê dawî da jî her berdewam in. Lê ji ber ku vira ne ciyê wê ye lema jî ez numûneyan zêde nakim. Bes bi vê perîşaniya zimanê xwe jî ew ji nava xwe pir raziye, xwe li Kurdistana Bakur wek pêşengê romana Kurdî dibîne û qala avakirina zimanekî(!) dike. Mixabin li ba me Kurdan kî bi çi ni-

zanibe xwe li wiya radikşîne.

Ez dizanim, ez hinekî ji mijarê dûr ketim. Lê ne mimkûn e ku sosiretên wiha tesrê li meriv neke. Ji ber wê yekê jî min ev nimûne dan. Yanî dema ez kin bibêjim, yekcaran ji ber hezkirina ji peyva xweş û yekcaran jî ji ber derdê nezanan min hin tişt wergerandine Kurdî.

Li ser girîngiya wergerê tu çi difikiri?

- Bê guman di pêşketina kultur, edebiyat û zimanên miletan da rola wergerê pir e. Bi riya wergerê kultur, tercûbe û hemû serpêhatiyên netewan digihîjin hev û hevûdu dewlemend dîkin. Ziman bi pêş dikeve, şax dide û ji alî xezîna gotinan ve gelkî dewlemend dibe. Bi taybetî jî ji bo zimanên biçûk feydeya wergerê bê hed û bê hesab e. Mesela piştî Tanzîmatê, di salên 1860î da Tirkan odayeke tercumeyê (tercume odasi ya jî burosu) vekirin û bi saya vê odayê gelek klasîkên dinyayê tercumeyî zimanê xwe kirin. Dûra jî piştî Cumhûriyetê bi însiyatîfa Wezaretê Perwerdekariyê dîsa gelek klasîkên dinyayê wergerandin Tirkî. Bi xêra van wergeran zimanê Tirkî gelek hêz girt, fireh û xurt bû.

Numûneyeke din jî, wê rojê min di derekê da xwend, ji nivê hemû kitêben ku di salekê da li Swêd tîne weşandin (yanî ji %51-52) zêdetir werger in. Ev yek jî nîşan dide ku xelk çuqasî qîmetê dide wergerê. Heger em kanibin, hema çi dibe bila bibe, divê em wergerînin ê xwe. Ev yek ewê ne tenê zimanê me, her wisa ewê asoya me ya fikirandinê jî gelkî firehtir bike. Lê helbet ev yek jî bi îmkanan dibe, bi

weşanxaneyên xurt û bi bazarê dibe.

Çima kêmtir tîne wergerandin, gelo Kurd zêde girîngiyê nadin wergerê yan jî hin sedemên din hene?

- Bi bawerîya min ne ku Kurd girîngiyê nadin wergerê. Ji ber ku di van şertan da û bi van îmkânên îro hew dibe. Dema weşanxaneyên xwedî îmkân û xwendevan tunebin, werger jî nabe. Ji bo ku meriv kitêbekê wergerîne divê weşanxaneyek, dezgehê vî karî ji meriv bixwaze. Dûra jî divê bazara firotna wê hebe. Çimkî nabe ku hema meriv rabe bi serê xwe kitêbekê wergerîne û dûra jî li malê veşêre. Dîsa divê werger nan jî bide meriv, ji ku meriv bikanibe bi hawakî profesyonel bixebite. Lê ya herî girîng jî li welatê me xwendin û nivîsandina Kurdî qedexe ye, meriv nikane berhemên Kurdî li Kurdistanê biweşîne û belav bike. Dewleta Tirk rê nade vê yekê. Loma jî li Kurdistanê piraniya Kurdan hîn nikaninin bi zimanê xwe bixwînin. Dimîne bazara der û ew jî têr nake.

Kovarên Kurdî zêde ci nadin wergerê. Ji bo dewlemendiya naverokan nivîsên werger jî pêwîst in. Di vî warî da tu çi dibîjî?

-Wek min berê jî got, çi wek kitêb dibe û çi jî di kovar û rojnameyan da dibe, werger pir girîng e, heger îmkân hebe divê meriv hewil û ehemiyetê bide wergerê. Lê wek min li jor jî got, divê kesên ku jê fêhm dîkin vî karî bikin. Ya na, zirara wê dikane ji feydeya wê bêtir be.

Ji bo bersîvên te em gelek spas dîkin.

Kaleciwan

*Pir dijware bindestî
Nebî kû tû biwestî
Cehd û xebatê xurt ke
Waye kêr giha hestî*

*Ne karê me ye westan
Xebat çara bindestan
Sistî bo me Herame
Nivîstin û rawestan*

*Dûdili rev û sistî
Bermiraz nakit xwestî
Rabin wey piling û şêr
Bi dilgermî duristî*

*Barê me zor giran e
Ev bar barê xwenda ne
Hevra mildin binê bar
Ne bê çar û imkan e*

*Yekîtî û aşîtî
Ya qenc bo me başîtî
Bernameyek rast bikin
Bê xelet û şaşîtî*

*Xwe bighînin bajaran
Evîn û dost û yaran
Bi karmend û etaran
Bi karker û ticaran*

*Bigerin bazar û sûk
Bikolin dest û neynûk
Dêr û dergah û mizgeft
Şêx û tekya û silûk*

Hewara xebatê

Ji vir dakevin gundan
Rûsipî, hem xanedan
Bernama xwe bêjin wan
Ewin pêşengên Kurdan

Bi gundî û bajarî
Bi karker û bi rênçber
Bikevin ser riya heq
Bê lerz û tirs û xeter

Bibin hevalên ji dil
Ji dil mil bidine mil
Hevalbendî, yekîfî
Biser nakevit bê dil

Rûsipyên Eşîran
Dîgel Begler û Mîran
Malmezin û malbatan
Şivan, gavan, kizîran

Mal û dû bînin cem hev
Bibin yek dil û yek dev
Serî hildin bilindkin
Bixebitin roj û şev

Berê xwe bidin Botan
War û mesken û wetan
Yekîtiyê saz bikin
Nekevîne xeletan

Xwe bavêjin bextê mîr
Text û bextê me Cizîr
Melê Botî tewafkin
Şaîrê me yê kebîr

Herin Gurgil û Findik
Hem Cûd û Şax û Hewlêr
Li Serdehl û Basretê
Bibin mêhvan hûn bi xêr

Bang bikin li eşîran
Kîç û Tey, Sor û Mîran
Hacîbeyr û Şirnexî
Dost û nas gund û cîran

Erûx, Gerger, Aliyan
Hesinî û Memiyan
Dûdêr û Mehmûdiyan
Ebasan, Dawidiyan

Spêrtî û Batûyan
Şax û Berwar û Goyan
Garisan û Silopî
Heya Dêrgul û Jêlyan

Bêjin "Rabe ey Botan!"
Şûnwarê şehîdan î
Tû behîsta renginî
Welatê me Kurdan î

Welatê Nebî Nûhî
Warê Şêxê Garisî
Gula baxê îrem ço
Sorgula me çilmisî

Botan warê şehîdan
Şêr û pilingên welat
Wan mêrxas û egîdan
Ser danîn riya felat

Ji vir herin Şêrwanê
Gelo Salih Beg kanê?
Kanê textê Seîd beg
Kesêk nîne li dîwanê

Kifra, Erûn û Kormas
Şêrwî şervanên mêrxas
Ew xîretê bernadin
Tev birane, dost û nas

Werin dakevin Sêrtê
Ji bajarên pir xêr tê
Di warê xebatê da
Bajarvanî bi kêr tê

Xwe bavêjin Şêx Wefa
Bêjin: "Me dît pir cefa"
Warê qenc û ewliyan
Têkin nav hêz û refan

Kurd û ereb birane
Li bin destê gurane
Azadî, bextewarî
Ne tiştêk bê îmkane

Bi Ristaq û Berwarî
Bigerin li vî diyarî
Tiloya ilimdaran
Rewşa hemû aqarî

Bi Gurdil û bi Xerzan
Çiya û deşt û zozan
Dakevine Bayikan
Li me heram e razan

Li Weys û li Şêx Osman
Wan serdarên ewliyan
Seyda mela Mihyedîn
Dûadarê me Kurdan

Minar, Girdikan, Derzin
Em mafên xwe dixwezin
Waye ev du sed salin
Ceng û tevger û bezin

Fêrsaf, Ceznê, Werqanis
Erbo, Qesr û Bilwanis
Têlan, Erbin û Zoqeyd
Comanî û Siyanis

Welatê Şaqûlî Beg
Qeđîme bi nav û deng
Babos û Por û Pirta
Rabin nemînin dereng

Hevêdî û Etmakî
Gelo bo çi deng nakî?
Divê em azad bijîn
Bi xweşî û bi pakî

Bajêr Hezzo bajar e
Kela binê zinar e
Hikûmeta Sasûnê
Îro maye bê çar e

Meskenê Eliyê Ênis
Warê Qewmê çiyayî
Bi malbata Ezîzan
Tû paytextê Xerzayî

Welatê Hikimdaran
Pir bi nav û navdar e
Ey Seydayê Timoqî!
Welat bo we deyndar e

Meskenê Zenbûlfiros
Merd û mêrxas û camêr
Remza ar û namûsê
Xweyê taca zîv û zêr

Bedlîs warê şêra ne
Dîroka me Kurdan e
Bi nav û bi nîşan e
Peyitextê Roşkan e

Roşkî vê dê parastin
Xwedî kirin sed salan
Merd û camêr û rastin
Ew ji bab û ji qalan

Dilsoj û dilovan in
Pir jîrek û çeleng in
Parêzvanên welat in
Giş şervan û leheng in

Hemû dişibhê Ristem
Qehremanên bê tir sin.
Eşîretên Roşkiyan
Ji dîrokê bipirsin

Bipirsin ji Gurciyan
Serçoq û mîsîpiyan
Mîreş û Safewiyan
Siltanên Osmaniyan

Li mêjûyê mêzekin
Şerefnamê bixwînin
Mêrxasiya Roşkiyan
Bi çavên xwe bibînin

Ji Teter û Ozbekan
Tirkman û Herzemiyan
Ji Ereb û Farisan
Romî û Ermeniyan

Mûş, Xinûs û Xelatî
Canfidayê welatin
Motkî, Baykî, Zeydanî
Pilingên Rohilatin

Giş leheng û cengawer
Zana û jîr û şiyar
Bi salan û sedsalan
Man li ber pozê neyar

Bila bijî Roşkanî
Wî navî we li xwe danî
Bijî bajarê Bedlîs
Tû remza me Kurdanî

Şûnwarê Diyaeddîn
Bajarê xweş û şîrîn
Bi Nemrûd û bi Sîpan
Dêdeban û Şikêrîn

Payîtextê Şeref Xan
Malbata rûmet bilind
Dewleta Mîr Şemseddîn
Welatê pir xweş û rind

Gazên bilind avên sar
Çem û kanî dormedar
Seyranga û xweş mekan
Tetwan, Karêz û Kawar

Zozan zozanên mîran
Xweşin sûtên Sîpanê
Şêxhebîb û Şerefdîn
Nemrûd û bilîcanê

Tetwan û Kawar û Şên
Herin Oxîn û Norsên
Xwe bavê bextê Hezret
Xwedî taca zîv û zêr

Li Elcewaz, Xelatê
Warê Eysê û Fatê
Hoo Rebiyo! Ka bêje!
Ev derd û kul ji kûda tê?

Ji wê herin Hîzanê
Bêjin "Textê we kanê?
Kanê Miks û Spayêrt
Mîrekên Kurdistanê?"

Bêjin "Ev wext ka çi wext?
Bindestane tac û text
Ew neyarên bê awe
Bê qewl û bê soz û bext"

Ka Dawid, ka ew Siltan?
Ka li kû ye Mehmûd Xan?
Mîr Hesen Siltanê can
Di menzîla ewliyan

Kanên ew xan û eywan?
Dengê Feqiyê Teyran
Ka Arîf, ka Mitillah
Bi kûda çû ew dewran?

Bedlîs, Hîzan û Miksê
Kurd li Kurdan napirsê
Kurdno de zû şiyarbin
Nekevin xewf û tirsê

Bişkênin qeyd û bendan
Bikevin rêzegundan
Şabedîn, Mehmed Şîrîn
Şêx û Şehîdên Kurdan

Şehîde mela Selîm
Heqî, Ferhad şehîdin
Şewket şehîdê Tetwan
Parêzvanê pir helîm

Seyda Melle Brahîm
Xweyê îmana qaîm
Roşkan warê şehîdan
Li vê rê tim û daîm

Tewfîqê mala Cango
Lawê Edê ew mêrxas
Ebdiselamê Zengo
Ew xweşmêrê bê qiyas

Ûsîf Ziya yê dildar
Ji rastiye nehat xar
Kemal Fewzî xebatkar
Îhsan Nûrî ye Serdar

Xalid Begê Cibranî
Pir bi nav û nîşanî
Tû şehîdê welat î
Tû mêrxasî Roşkan î

Pir silavan li wan kin
Derdê Kurdan beyan kin
Bêjin "rewşa me ev e"
Bila bo me dûa kin

Derman her azadiye
Kes bindest nebû mirov
Zorbeyî li me dikin
Gur û keftar, hirç û hov

Neyarên me ne Tirk in
Ne Ereb û Faris in
Rêvebirên şovenîst
Qe ji Xwedê natirsin

Bilindkin kada millî
Tişt çenabin dûdilî
Xwe bidine binê bar
Bi cehd û xebat û gilî

Îro wa em şiyar in
Ji dinyayê diyar in
Em miletêk çil milyon
Li ber bîna neyar in

Bi zanîn û bawerî
Emê bibine serî
Bi gund û bi bajaran
Wê ev tevger bigerî

Hemî bibin hevalbend
Bira, pismam û piştêmêr
Azad û serfiraz kin
Vî welatê zîv û zêr

Rojên xweş û bextewar
Bila li me bîn bi xêr
Serbilind û serfiraz
Devbiken û tor û têr

Bibînin xêr û xweşî
Îdî bese bireşî
Şad û aram û xweşhal
Beşerxweş û dilgeşî

Me destpêkir ji Botan
 Ji Xerzan û Reşkotan
 Bi Şêrwan û Berwarî
 Sasûn û Sêrt û Xerzan

Em hatin dora Wanê
 Ber Cûwa Şahmiranê
 Tûşpa ya Urartiyân
 Dîroka Kurdistanê

Serek bidin Xoşavê
 Keleya devê avê
 Baregeha Xan Mehmûd
 Bikevine silavê

Paytextê Mehmûdiyan
 Warê merd û cindiyan
 Ji wê herin Gewarê
 Nav eşîr û-gundiyan

Ji vir herin Hekarî
 Welatê Mîr Nûrillah
 Şahê Şêxan tewafkin
 Şêx Seyîd Ibeydillah

Ji wir herin Bazîdê
 Xwe bavên dergê Xanî
 Xwe bispêrin wî şêrî
 Wî rêber û siltanî

Ixdîr û Erdehanê
 Bi Qers û Xoresanê
 Bi Pasîn û Erzirom
 Erzincan û Tercanê

Serêk bidin Koçgirî
 Cî û warê Elîşêr
 Ji vir herin Dêrsimê
 Cem Seyd Rizayê xweşmêr

Warê piling û şêran
 Ev welatê Melkişan
 Warê merd û camêran
 Bi nav û deng û nîşan

Çemîşkezek payitex te
 Bi kele û bajaran
 We Hezarsalan parast
 Qe rê neda neyaran

Dêrsim remza welat e
 Bi Munzûr û bi Gelfî
 Hemî leheng û şêr in
 Weka Hezretê Elî

Dêrsimîno hey hewar
 Werin îmdada welat
 Mil bidine binê bar
 Bikin hûn cehd û xebat

Bi Entab û Kilîsê
 Li Melet û Mereşê
 Bigerin hûn seranser
 Warê Naz û Binevşê

Em herin Sêwerekê
 Welatê Swêdiyan
 Meskenê Faîq Bûcaq
 Wî şêrê deşt û çiyân

Li Çepaxçûr û Palo
 Şevêk bibine mêhvan
 Warê Zazayên mêrxas
 Canê min bo wan qurban

Li Riha û li Mêrdîn
 Li Xarpût û Batmanê
 Serek bidin Amedê
 Ewe bûka cîhanê. **II.Tîrmeh.1985**

Roman

sîtava jiyanê ye

Adar Jiyan

adarjiyan@mynet.com

*Di romanê de sînor
nayê danîn. Lewr ra
di romanê de
hêmanên ku ji rastiye
têne wergirtin hêza
nigaş û
dewlemendiya
hundirî ya
romannivîs xurtir
dike û heta
heyînên jiyana rastîn
li pey xwe dixirikîne.*

Roman, têgîneke wêjeyî ya ku koka wê ji peyva Romanus ya latînî, ku tê wateya çiroka bûyera rastîn an jî nîgaşî ya pexşan tê ye.

Wekî cureyeke wêjeyê, pênasa û watedayina romanê ne tiştekî hêsan e. Lew ra roman jî wekî hemû cureyên wêjeyê, wate û raveya wê li gora dem û rêbazên wêjeyî an jî hunermendên demê tê guhertin. Belê mirov dikare bi kurtayî an di wateyeke teng de bibêje roman, nivîsên dûvdirêj yên ku bûyeran bi awayekî rastîn û bi zerengiyê berfireh hildide dest û lêkolîna xislet, civak, nêrît, hest û dahûrandina azweriyên mirov vedibêje ye. Armanca romanê, nasandina xisletan û ragihandina sêwirandina bêsiûdî û hejaniyan ya ku bi alaviya bûyeran tê vegotin e. Romana xurt û sergewer dikare xwe bi her awayî bikirîmişîne, bikeve her dirûvî û cihê cihê ji her mêjîyî, ji her bedewiyê û her mezinahiyê re bibe navgîn. Dikare bang li her nîgaşbaziye û rastîbnîyê/ê bike û gelek deriyên nepenî yên gerdûnê li mirov veke.

Her romanek jiyankê, cihanekê heta mirov dikare bibêje xwezayekê şirove dike. Di tevê romanê de tu kes nikare li du kes an jî du qewmînan ji hev rast bê. Heta di tevê wêjeyê de tu kes nikare li du

romannivîsên ji hev rast were. Roman, digel şewqdana civakî, di bin daraza fermana fikr û ramana romannivîs de dimîne. Roman mirêka sinc û gerdîşên civakê ye. Roman camidî ye. Ew tişteki veşartî nahêle û dîmena ku dibîne bi awayekî eşkere hildide dest. Tişteki ku di jiyana rastîn de hebe û derbasî romanê nebe nîn e. Di romanê de sînor nayê danîn. Lewra di romanê de hêmanên ku ji rastiye têne wergirtin hêza nîgaş û dewlemendiya hundirî ya romannivîs xurtir dike û heta heyînen jiyana rastîn li pey xwe dixirikîne. Bo wê gelek caran tê gotin ku romannivîs mirovê ku ji xwe bi dûr ketî ye. Belê ne qure ye; dilnizm e. Ew her gav xwe li pey lehengên xwe diheşîfîne. Ew kesekî/e veşartî û wînda ye. Tu kes nikare wî/ê di romanê de bibîne. Car caran wekî siyekê dide pey lehengên xwe, wî/ê dişopîne û bêdeng dimeşe. Romanivîs, lehengê xwe ber bi gêtiyeke nû de dixirikîne. Peyre hin bi hin mirov dikişîne nav rakêşarî, dilniwazî û veşartîya jiyana lehengên ku ew bixwe parçeyek ji jiyana me ya rasteqîn in. Jixwe romana rasteqîn jî ev e. Ango, divê ku romannivîs rêbayerê cawîdan efsaneyî bide çîrokê. Çendî ku çetîn be jî, ev çawanî bo roman û wêjeyê pêwistîbûneke girîng û jênager e.

Daraza ku em derbarê romannivîs de didin, girêdayî pirî an jî hindikiya tiştên nenasbar yên ku aşkerikirina kurahî, xweşikî û bedewiya şayesandinê dike ye. Digel hemû tiştî dîsa jî ne pêkan e ku mirov dikaribe bandora demê an jî mercên dî-

rokî, civakî û aborî yên li ser romanê mandele bike.

Wekî tê zanîn di derbarê romanê de di navbera romannivîs û vekolînerên wêjeyê de gelek nerînen cur be cur hene. Belê ne pêkan e ku mirov van hemû nerînan pevgîhîne an pênaseke xuya û aşkere bo romanê deyne. Bi hîmî gava ku mirov di maneya mêjuyê de berhemên romannivîs û wêjeyan li ber çavan radixê, sê cureyên romanê yên bingehîn derdikevin pêşberî me

1. Romana Destanwarî (epîk): Ev roman, serenc û serphatîyên lehengekî/e tek xislet yê westar vedibêje. Di vê romanê de lêqewmîn bê rawestan diguherin, belê leheng heman e. Qet naguhere.

2. Romana Dilşewat (dramatîk): Ev roman, guhertina leheng ya li hember lêqewmîn û jîyanê vedibêje. Di vê romanê de leheng bi demê re tê guhertin. Teverger zêde xwe nade pêş; bêtir derûniya leheng derbasî pêş dibe.

3. Romana Coşdar (lîrik): Ev roman, ji jîyan û mirov bêtir, bi awayekî hunermendane xebitandina herka giyana mirov vedibêje. Di vê romanê de bêtir nîgaş, sawêr, dilwasî û hestên nehevgerî xwe didine pêş; ango di romanê de her gav mirov wekî kesekî/e heliyayî dixuye. Mirov dikare romana Goethe ya bi navê Werther wekî minak nîşan bide.

Digel van hersê cureyên bingehîn yê romanê, dîsa mirov dikare gelek caran taybetiyên van hersê şewazan di heman romanê de li nik hev jî bibîne.

Wekî din jî li gora rêbaz û qaîdeyên romanê an jî lîteratûra wêjeyî hinek hêmanên romanê hene :

1. Bûyer: Romannivîs, mijara romana xwe qasî ku ji jiyana rojane digire dikare ji dîrok, çîrok, çîrvanok û mîtolojiyê jî bigire. Bi rastî mijara romanê, ji navgîna derbirîna hest û raman û nêrîna romannivîs pêve ne tişteki din e. Çi şayesandina jiyana rojane û çi jî rasterê vegotina gêtiya xwe ya hundirî, hest, nîgaş, xewn an jî nêrînên xwe yê derbarê jiyân û cîhanê; çi dibe bila bibe, her hunermendek di karê xwe de jiyaneke nipînû û cihêreng radixe ber çavan. Bi xwezayî ev jiyana ku di romanê de tê şayesandin ne jiyaneke rasteqîn e. Belê mirov dikare bibêje ew sentez an jî şirovekirina jiyana rastîn e. Heta jiyana romanê ji jiyana rastîn tîrtir û girantir e. Romannivîs hin beşên jiyana rojane yê yeknesan (monoton) dide alî û ji xwe re (bo romana xwe) beşên manîdar hiltîne. Peyre wan bi awayekî hunermendane digihîne hev û jiyaneke nû derdixe holê.

2. Kes: Bêşik kesên ku di romanê de behsa wan tê kirin mirov bi xwe ne. Ji ber ku romannivîs bixwe jî mirov e, di navbera wî/ê û lehengê/a romana wî/ê de pêwendiyê zexm û cihê xwe dide pêş. Ev pêwendiya taybet di tu şaxên hunerê de jî xwe bi vî awayî nikare bide der. Bo mînak : Wênesaz an peykertraşek çendî ku nexwaze jî dîsa dibe ku di hunera xwe de ji bilî mirovan heyberêki din vebêje. Belê romannivîs kêmbêr (pir-hindik) ji peyv û gotinên ku hest û raman, kêf û coş

an xemgîniyên wî/wê tîne zimên kesayetiyekê pêk tîne û li gora dilê xwe zayend û navekî lê dike. Ango kes û leheng gelek caran ew bi xwe ye. Bi vî awayî kesên ku di romanê de cî digirin ew kes in ku di mêjiyê romannivîs cî digirin bi xwe ne.

3. Pêwendiya Navbera Kesan:

Di navbera kes û lehengên romanê de gelek pêwendiyên cur be cur hene. Di romanê de kes û leheng, ji hev hez dikin, ji hev didexisin, dixwazin tola xwe ji hev bistînin, an jî alîkariya hev dikin. Di romanê de ev peywendî gelek caran di evîneke sêkuj (sêgoşe) de asê dibe. Du mêr ji jinekê, an berevajiyê wê, du jin ji mêrekî hez dikin. Pêwendiya navbera kesan li gora rewşa bûyerê teşe digire û têkoşîna navbera wan ya li hemberî hev jî bi wî awayî didome.

Belê di romana rastbîn ya komalî de mijara bingeş, têkoşîna navbera çînan e. Di şewaza romanên wisa de têkiliya navbera kesan, wekî lêkdana navbera karker û karsaz, axa û gundî, leşker û gerîla derdikeve holê.

Di romana gerdîşî de, têkoşana takekes ya li hemberî civakê û helwesta wî ya li dijî kevneşopiyên derdikeve pêş.

Di berhemên romannivîsê coşdar an jî di romana lîrik de bingeş, lêkdana mirov ya bi xwe re ango hestên kes yê binakok û têkoşîna hundirî ye. Car caran jî ev têkoşînê hundirî û derveyî di romanê de li nik hev an di hundir hev de tê dîtin.

4. Dem: Yek ji hêmanên romanê yê bingeşîn jî dem e. Lêqewmînen ku di romanê de cî digirin, an jî

guhertina mirovan ya ku bingeha romanê digire, di hundirê demekê de pêk tê. Dixwaze bila romannivîs şayesandina eyama xwe bike û dixwaze bila heyineke dîrokî vebêje an jî dixwaze bila demeke demande hilde dest, di romana wî/ê teqez hêmana demê heye.

5. Cî: Di romanê de ji cihê ku bûyer lê diqewime re wargeh (mekan) tê gotin. Di navbera jiyana lehengê/a romanê û wargeh de pêwendiyê jênager heye. Ji ber ku di navbera mirovê ku li gund û bajêr dijî de cudayî heye, her romannivîs, lehengê/a xwe, li gora rewşa civakî li wargehekî bihingam û guncaw bi cih dike. Bi vî awayî wargeh wekî dekorekê di her romanê de cihekî girîng digire. Ancax di hin romanên de wargeh ji dekoratîvê derdikeve; dibe pêkereke wisa girîng ku bandorê li ser jiyana û hestên lehengê romanê dike. Bo nimûne : Du wargehên ji hev cuda, an jî hevnasiya lehengê/a romanê ya bi du civak û şarezahiyên durî hev, dibe sedema şaşî û tewşbûna wî/ê

6. Hawirdora Komalî (civak): Di her romanê de wekî her mirovî/ê hawirdoreke komalî ya lehengê romanê jî heye. Leheng, car heye xizan car heye zengîn e. Her wiha hin caran nezan û hin caran jî têr zana ye. Car heye nijadperest e. Oldar e. Car heye, pêşverû û şoreşger e. Gelek caran jî xwedî pîşe û hokar e. Di romanê de hawirdora civakî bi du beşan derdikeve pêşberî mirov. Yek; civaka ku leheng pêgirê wê ye. Du; hawirdora komalî ya ku leheng tê de dijî ye. Ev herdu hawirdor hin caran

heman e û hin caran jî cihê ye. Gava ku cihê be di navbera leheng û civakê de lêkdan, bêahengî an jî nebanektî û ne lihevî rû dide. Çendî ku banektîya mirovê/a gundî bi bajêr re çetîn be; ya mirovê/a bajarî jî bi gund re ew qa çetîn e.

7. Derûnî (psîkoloji): Mirov di jiyana fîzyolojîk, psîkolojîk û komelayetî de wekî tevayiyekê tê dîtin. Romannivîsê/a serketî, mirov bi vî tevayiyê hilde dest û bi awayekî hunermendane wê pîrealîya wî/ê dinirxîne. Çendî ku girîngdayîna dahûrandina derûnî, bêtir di romana psîkolojîk de derdikeve pêş dîsa jî her romannivîs bêgavî dahûrandin û şayesandina gêtiya hundirî ya lehengê xwe dibe. An na romannivîs nikare bi temamî lehengê xwe bi xwendevan bide nasandin. Bo ku mirov dikaribe bizav û tevgerên lehengê romanê binirxîne bi qasî pêkerên ku bandorê li ser tevgerê dike, hewceyî bi têgihîştina sedemên derûnî jî heye.

8. Gelsên Felsefî: Di hin romanên de gelsên derî sirûştî (metafîzîk) jî wekî mijar tene neqandin. Romannivîs car caran di gêtiya ku tê dîtin re dibuhire, pêwendiyê bi gêtiya ku nayê dîtin re datîne û hewl dide ku raz û nepeniya wê biferisîne.

9. Bastûr û Plana Romanê: Di hemanên pîrcure yên romanê de pevgerêdayiya bûyeran li gora heyn, rêbazên wêjeyî û romanivîsan gelek caran diguhere. Îcar romannivîs, her gav hunerwerî şanpaziya xwe di bîhevxiştina hemanên pîrcure yên ku di jiyana mirov de cî digirin de nîşan dide. Di vir de rêzkirina bûyeran û

eyarkirina demê jî gelekî girîng e. Romannivîsê/a hêzdar û serketî, di jiyana mirovan de qewameke girîng hilde dest û hemû bûyerên din li dû wê rêz dike an li dora wê dicivîne. Veguhêziya bûyerên jiyânê yên lihevketî ne roman e. Çimkî di romanê de bijarte û sentez gelekî girîng in û heta mirov dikare bibêje du hemanên bingehîn in.

10. Şêwaz: Di romanê de şêwaz gelekî muhîm e. Belê şêwaza romanê jî li gora romannivîs û rêbazên wêjeyê diherere. Wekî hemû berhemên wêjeyî yên din, roman jî zêdetir bi şêwaza xwe dijî û li ser piyan dimîne. Ji do heta îro navdarî û nirxdariya romannivîsên klasîk û nûjen hemû bi saya bikaranîna zimanê şêwaza wan hatiye parastin. Her nivîskarek xwediyê şêwazeke xwe ya taybet e. Şêwaza aîdî romanê nîn e; şêwaza aîdî romannivîs heye. Wekî mînak : Gava ku Balzac romanê jî binivîse dê wekî Balzac û ceribandîne jî binivîse, dê wekî Balzac binivîse. Her wiha, şêwaza Proust ne wekî ya Stendhal e. Şêwaz, dirûvpêxistin û gencîneyeke peyvê ya her nivîskar an romannivîsî/ê ji hev cihê ye û xweser e.

Li gora rêbazên wêjeyî:

1. Romanên Romantîk
2. Romanên Rastîbîn (realîst)
3. Romanên Siruştîparêz (natûralîst)

Li gora mijarên xwe:

1. Romanên Serpêhatiyan (Mînak; Romana Alekxan Dumas ya bi navê Sê Cengawer
2. Romanên Dîrokî

3. Romanên Derûnî
4. Romanên Gerdîşî
5. Romanên Raştîbîniyên Civakî
6. Romanên Qerfî-Mîzahî (Mînak; Romanên Aziz Nesin)
7. Romanên Dozeyê
8. Romanên Herêmî
9. Romanên Bêganeyî (egzotîk)
10. Romanên Fenî (Mînak; romanên Jules Verne)
11. Romanên Polîsiye
12. Romanên Sporê
13. Romanên Jînenîgarî (biyografîk) (Mînak; romana Victor Hugo ya bi navê Wekî Xewnê
14. Romanên Lewiran (Mînak; romana Jak London ya bi navê Xwîna Gur)
15. Romanên Zarokan (Mînak; Poliyanna)

Li gora şêwaza vegotinê:

Bûyerên romanê bi awayên pircûre têne vegotin:

1. Romana ku ji aliyê kesê sêyemîn têne vegotin
2. Romana ku bi şêwaza serboriyê têne vegotin
3. Romana ku bi şêwaza nameyê têne vegotin
4. Romana ku bi şêwaza diyalogê têne vegotin
5. Romana ku bi şêwaza mirov xwe bixwe dikeve nava serboriyan têne vegotin
6. Romana ku bi riya wesîqeyan têne vegotin

Gotina dawî; li ser rêbaz û şêwaza romanê gelek tişt têne gotin belê romannivîs ne hewcedarî pêşniyazî û şîretê ye. Ew bi xwe riya xwe dibîne; mijar, şêwaz û cureyên romanê bi dilê xwe dîneqîne.

Çarînên jibo Helepçe
 "Reş Girêdan"

Hezar nehsed heştê heşt bû
 Kurdperweran reş girêdan
 Nûçe a reş zû belav bû
 Dost û yaran reş girêdan

Eman, eman, eman, eman
 Helepçe girt mij û dûman
 Pênc hezar Kurd cangorî bûn
 Birîndaran nedît derman

Eman, eman, eman yadê
 Zar-zêç, pîr-kal, teyrên Xwedê
 Bi ba yê kimyewî mirin
 Reş girêda Kurdo, Werdê

Hewa ewr bû, şilê û sar
 Şanzdeh Adar, demsal bihar
 Jehr belav kir dijminê har
 Deşt û çiyay reş girêdan

Firokan bombe barandin
 Kimyewî bûn can helandin
 Qîrîn, hawar û nalandin
 Erd û esman reş girêdan

Hewa yê jehr jiyay kir zor
 Cîhan bêdeng ma bû çav kor
 Mirin Kurmanc, Soran û Lor
 Zazan, Goran reş girêdan

Mij dûman bû esman, sema
 Zar-zêç mirin kesek nema
 Helepçe bû Hîroşîma
 Kurdistanê reş girêda

Pêşmerge zû derketin der
 Dijmin ba bû, nedibû şer
 Çav kor dibûn, guh dibûn kerr
 Kevir-daran reş girêdan

Mal-kûçan da mirî hezar
Hewşan da pez-dewar mirar
Kurdan dîtîn xeser, zerar
Hêzên rêzan reş girêdan

Di newal û çal û kortan
Tijî laşên keç û xortan
Girya Dersim, Amed, Botan
Tev Mem û Zîn reş girêdan

Çar hezar gund, war û banî
Dijmin xurand dawî anî
Bin axê da Feqî, Xanî
Tev Cîgerxwîn reş girêdan

Li derve bûn zarokên hûr
Bêt nûçe bûn, ji gunan dûr
Yekser mat man, çav kirin zûr
Kaw û gogan reş girêdan

Bav û dayîk tev zar-zêçan
Xortên ciwan, tev pîr-keçan
Bi hezaran hatin pêçan
Caw, tawûtan reş girêdan

Deh hezaran welat terk kir
Cîhanê dît, lê guh kerr kir
Kurdan ji jehrê ra şer kir
Rê û dirban reş girêdan

Pitik berê dayîk dimêt
Hewa jehr bû kesî nedît
Mirin mêrxas, gernas, egît
Kesên mayîn reş girêdan

Dijminê har, hov û bêbext
Gelê Kurd nêçîr kir bêwext
Şewitand war, nehîşt dar, text
Dar û beran reş girêdan

Mal da rûniştibûn pîr-kal
Li derve bûn Bawer, Delal
Hemû jehr bûn avên zelal
Kanî, çeman reş girêdan

Li ber pez bûn zarok, şivan
Mijek derket li pêş çavan
Mirin heywan, mirin gavan
Kulav, bilûr reş girêdan

Pitikên nav pêçekan da
Hembêza bav, dayikan da
Mirin li bin xaniyan da
Cil, dergûşan reş girêdan

Zar û zêç li pêş deriyan
Dileyîztin, digeriyan
Bombe jor da dibariyan
Ba û ewran reş girêdan

Hawariya zar û zêçan
Şîna dayik, girya keçan
Pitikên çûk natin pêçan
Paç, pêçekan reş girêdan

Xwişk û bira, dayîk û bav
Derketin der avîtin gav
Hêz da ketin, rijîyan çav
Ling û çêqan reş girêdan

Bavo kurê xwe hambêz kir
Jonî şikya, lê ranekir
Li tev zarok ruh radest kir
Şal û şapik reş girêdan

Maxa miriyan ketin ser hev
Pûç bûn ling-dest, neman çav, dev
Pirr li der man, bi roj û şev
Hîv, stêran reş girêdan

Bêt nefes man ketin erdê
Evîn, Dîlan, Şêrko, Werdê
Mirina wan nedît Xwedê
Xwedê nasan reş girêdan

Bi hewa yê jehr fetisîn
Bin tavê da can helisîn
Mirin teyr-tûr gişk melisîn
Anka û Baz reş girêdan

Ax li min, ax li min yadê
Newiyên Kurdo û Werdê
Mirin laş man li ser erdê
Tevir-bêran reş girêdan

Tawûs Melek, Ahûra Mazda
Her bêdeng man li tev Yezda
Qet hêzekî, hêzêk neda
Êzdî, Mazdek reş girêdan

Xuya nebû Zerdestê kal
Cî ranebû Rustemê Zal
Tijî meyît kort û newal
Deşt zeviyan reş girêdan

Zû belav bû ew nûça reş
Kurdek nema rûken, dilgeş
Şeş kîşwer û Hînd û Hebeş
Mirovhezan reş girêdan

Televizyonên cîhanê
Helepçe anîn ekranê
Jîn tunebû li meydanê
Temaşvanan reş girêdan

Emperyalan dengê nekir
Hukma Sovyet qet şerm nekir
Faşîst Saddam her dil şakir
Pêşverûyan reş girêdan

Saddam û Xumeynî, Ozal
Ew dijminin, rabin heval
Rewş li ber çav, ronî, zelal
Çav û devan reş girêdan

Dijminek jî Hafiz Esat
Ehrîmanê bêbext fêsat
Ev tevkujî li wi xweş hat
Selahaddîn reş girêda

Birayê kurd ders bistîne
Ji xwe ra rêkî bibîne
Cîhan negot "Ew kes kîne?"
Aştîxwazan reş girêdan


Ji bûyeran qenc mêze kin
Rastî, çewîf hev cûda kin
Bibin yek, neyar ra şerkin
Ku hûn bîrkin reş girêdan

Tirba xwe em xwe bikolin
Dijmin Erebb, Tirk, Moxol in
Me dikujin hezar sal in
Sal û qirnan reş girêdan

Birano dîrokê vekin
Rind bixwînin, qet bîrnekin
Ruhê Kawa bigrin rakin
Ku zû bîrbe reş girêdan

Şêx Saîd, Helepçe, Zîlan
Dersim, Agirî jan kir dilan
Va helbesta Rizê GURAN
Mala guran reş girêdan.

25.03.1988



Sê giyar û sê navdar

Enwer Karahan

enverkarahan@hotmail.com

Ji beriyêke bêserûbin, bir bi çiyayê Mazî ve, bi hênka-hiya bayê xerbî û bi afata bayê kur re, sê giyarên bilind rabûnin ser xwe.

Hersiyên bi hev re destên xwe li nava te danin hevdu, lê qudreta wan jî têrê nekiriye ku te di nava pençeyên xwe de bihefidîne.

Bergiya te vekirî maye û te eniya xwe daye wê rojava-ya ku wek bahreke reş û ew carinan şîn, carinan jî zer e. Ne ji wî Girqîjot û Girdodî bûya, tu kelem li bergiya te tune bûn, heta ku çav çavan dibîne. Te ew deşta bixêrûber daye ber xwe, heta bi cîhê ku roj lê dinuxume.

Yek jê Tûrcel e, gava ku qala wê dibe, vê re senboleki mêrxasî û neteweya kurd tîne bîra mirovî ku piştî 25 salan, 237 kurdên serbêjîng ew bi rûmeteke mezin bibîr anî. Paşê di bîra mirovî de rêz dibin kanî û delavên di newqa wê de, ji xêndî hefadiya wê ya bibext û bêbext. Ger meriv di kelkela germa navrojê de, ji Lata Sor û Dikên Biriya ser berjê bibe, ava Xabê mîna xizir bi bergiya mirovî ve tê.

Ji dengê kahr û berxan, li ser avê pêleke ji melodiya bilûra şivanan pêk tê, ji xêndî dengên serxwînk, zenqendîl û şalûrên li ser Xêxot. Bîhna tehew, kenêr û guhîjên ku ji nav baxçeyên te, tahma xwe dide şeraba ku filehên te bi ser de dirikrikin û îkrama mêvanên ezîz e ku ew bi hosteyiyeke mezin çê dikin. Dengê navdariya zeytûn, hinar û hijîrên te, çûye di felekan re derketiye. Kîjan cebeşa dikare xwe li ber cemidîbûna ava Xaba te bigre? Li piştî xwarina sêleke goştê kahran be jî; gava mirov firekê jê vexwe, ew vê re diferikîne û mirov dike mîna per. Ew wek qudretê, ji rengê ava Zimzimê ye.

Di nav wan çemên bidirî de, yekcarinan vexwarina araqê -ya bi dizîkaxweş e, (bêyî ku H. Cemîlê Hecî Osmanî bi merivî bihise) lê bi tahma fêkiyên te yên ji leman, ew weke şîrê çîrê ye. Li binê wan darûberan, pahn dibin xortên sohbetxweş, biwext û bêwext. Gelek caran mijara sohbet û awaza wan dehere ser wê helbesta Qedrî Canê rehmetî ku li ser te, bi hesreta dilan dilorand. Ew ciwanên te, ne bi tenê Newzadî bibîr tînin, her weha, Reşîdê Kurd jî bi çepitiya wî tînin bîra xwe, lê xuya ye ku bavê Tûrcelî bi xwe ye, ew ê ku ji wan re bûye ekoleke rêberî û îlhama kurdayetiye. Ew lorîn û axîna xortan e, li ser mêrgên Xab û Dahl û Kulêbeyaya te... Helbet, ne ev tenê nin hêjayiyên te yên binav û bênav. Roj heye ku em ê bikin qal û bahsa hemiyana, bêyî ku em ferqê têxin nav reng û qewim û eşîr û olên wan.

Me qala bavê Turcelî kir, lê ji ber xemla te, em piçekî bi dûr ketin. Heger em bi çend gotinan dîsa vegerin ser wî zatê nemir û navê Turcelê, da ew nebe sersebeba tevliheviyekê: Di sala 1967an de, gava jê re çêbû kurê

pêşî, wan navê wî danî Tûrcel. Paşê bera dû hev da, bi navê Welat û Şiyar, du naşiyên bê rêber

Li pê hersê kuran, Xwedê da wan keçeke bi navê Kurdistan, aqûbet ne li serê vî navê miqedes be, wê li Çoman emir da haziran.

Berî çûyina Başûrî bû ku ew bi navê Dicle û Firatê, xwediyê du rehên dilên me bû.

Li vê derê em ê nekin qala "dîwan" û parastin û helwestên wî yên di mahkemeyên teresan de, ji ber ku dîrok şahidê meselê ye.

Heger em careke din vegerin ser Tûrcelê: Tam li pozê vî giyarê te, bi navê Kanîka Reşo mêlavek heye, ew jî kalikê vî zatî ye ku ew mijara me ya vê gavê ye. Vî giyarê hanê pozê xwe bi ser deştê de daliqandiye û heta bi Wêranşehar û Serêkaniyê tîne ber lingê xwe, teva kevir û kuçikên şehêr, di reşahiya her şevên xalî de. Yekcarinan tê dengê şalûr, bilbil û suravêrkan, ji nîvê Lata Sor a ku xwe weke kenbereke zêrînî li nava vî giyarê bêûcax gerandiye. Anuha lê peyde nabin, darê kevot û qizwanan, lê di wexta xwe de xelkê beştên xaniyan ji wan darên wek ziyaretan jêdikirin, bêyî ku li ezemeta wan bifikirin. Di biniya Lata Sor re, bi dehan kanî û avzê mînan ku mekanê kewên nukilsor û çûkên terîsor û zerin, ji xêndî zinzîlik, ebabil, kokel û gabelekan. Li Kanî Kenêra ku di quntêra Lata Sor a te de, jî marê teyar bigire, heta bi yên cûn, yên reş, yên kor û tîrmar henin, di nav wan çavîyên zil û qamîşên ku sitara seyidvaniyan e.

Ji xwe, Xwedê jê razî be, ji ku navê wî lê bûye, meriv nizane, lê jê re dibêjin Kanîka Haro ku ji wan komorçî, êzengvanî û rêwiyên ji hêla Melebîkê, Golîkê, Şêbê, Kaniya Alî, Xarok

û Mabanê tê re, bûye cîhê lê bîhnvedan û xwehênikkirinê. Heta ku ev navê hanê lê nebûbû, jê re digot, "Firêşî" ku ew di hustu Çivikan û Peyarê re ye. Xuya ye ku piştî wî ew rezê tiriyên çilohûrik li newala pişta Tûrcelê danî û pê ve, damxeya xwe li vê kaniya hanê jî xistiye.

Di şevên Havînan de, nemaze berî ku qorix hilê, ji serê vî giyarê bêmedet, heta bi Mêrdînê xuya dibe, weke çiyayekî ji binê ava deryayên bêbinî derketibe, teva darên xwe yên berû û mazî û kevotan. Bi bîhna bayê sibehê re, xweş tê bîna xuşîla ku ji nav qeraçên hêla Remok, Sûsik û Girsarîncê. Ger mirov ji serê wî giyarî, di wan şevên ku di sibehên wan de avî dikeve û mesafeya orta wan bi qasî hukmê du tivingan e li wê kelaya Mêrdînê binêre, ew wek dînazorekî textikî xuya dike ku bi lampeyên qelseronî hatiye xemilandin û tîna xwe dide heta bi Amûda nemiran. Di sibehên van şapatan de, dibe wîrçîna roviyên çekalan, weke îbsizên xencerdiberdeçikandî. Ew li nav wan dar û davî û qîş û terîşan digerin, mîna pêxwasan. Me qala pêxwasan kir, divê tiştek nê ser dilê biraderên Xançepekê, ji ber ku em bi wasiteyekê bûbûn tarloqên hevdu, bêyî ku em li ser bikin dahk û qerarê bidin. Bi wê sayeyê bû ku ahlên me bihistibûn navê Celal Guzelsesî, hunermendê dengzela.

Heger em bi nav de herin, dê neyê dawiya pesin û marîfetên vî giyarê hanê. Berî ku em ji ser Turcelê vegezin, divê em xwe bera hêla Saadan û Kurkanê jî bidin, da qala Newala Bihîfê û Newala Qamîşê jî bibe ku li pala wî ya rojava nin.

Ger em piçekî bizîvirin ser wan herdu giyarên dinê, bêyî em navên

wan bilêv bikin, me di serê gotina xwe de qala wan kiribû. Yek jê Pozê Mancêlê û Textê Qîza Qirêl e û yê din jî Êrge Baba ye. Me li ser gotina Qedrî Canê rehmetî, nevê Pozê Mancêlê û Textê Qîza Qirêl, kirin yek, bêyî em Firneya Gawiran jî bi ser vekin. Di eslê xwe de, ew du giyarên cihê nin, lê di netîceyê de ew dighêjin ser hevdu. Me qala Qedrî Canê rehmetî kir, divê em wî bi wê helbesta wî ya ku li xerîbiyê û ji çardeh çarînan pêk tê, bi bîr binin. Ji xwe gava ku hûn van çarînan bixwînin, hûnê bibînin rismekî rehmetî û marîfetên wî yên hunerî. Hewce-dariya ku em bikin bahs û qala wî ciwanmêrî namîne, ji ber ku hûn xendevanên fêhm zêde nin.

Ger me qala rehmetî kir, divê em destbirak û rêhevalê wî yê sirgûnê jî ji bîra nekin, her çî qasî me xwe bera hêla Rewşatê neda be jî. Ji ber ku wî jî di taliya emrê xwe de û di ber sikratê de, anîbû bîra derûdor û malbata xwe, navê welatê bav û kalên xwe Dive ku hûn anuha bibêjin kî ye ev zatê hanê? Lê ez bixwe jî nizanim navê wî yê eslî çî ye, li gora ku navê wî yê li bin berhem û helbestên wî ye, jê re dibêjin, Reşîdê Kurd. Agahdariyên di destê me de, dibêjin ku ew di sala 1910an de li Rewşatê hatiye dinyayê û ji salên çilî û pê ve, maceraya wî ya kurdperwriyê dest pê kiriye. Dive ku em paşê vegezin ser helbestên vî ciwanmêrî, lê esas meseleya me li ser Qedrî Canê rehmetî vebûbû. Evana hemû hêjayiyên welatê bav û kalên me nin û hin kesên din jî henin, lê ji ber ku ew li heyatê nin, ne adeta me kurdan e ku em bikin qal û bahsa zindiyan. Pştî ku ew emir bidin haziran, em ê bikin ax û wax û bikin qala mêrxasî û ciwanmêrî û qahremaniya wan. Lê çî feyde!...

Wexta ku me got welatê bav û kalan, hatibû bîra me ev her çardek çarî-nên derketiyê mala Cano, "Newzadî". Lê wexta me dest nade ku em di vê kurtenivîsê de ji we re pêşkêş bikim her çardeh lorînan, em ê bi van pênc qitayan werin ser ku Temoyê stranbêj, ew bi navê Dêrika Çiyayê Mazî meqam kiriye.

Wî li dûrî hesreta dilan, di Hawara mala Bedirxan de, weha dilorand.

*Dêrika Çiyayê Mazî
Wlatê bav û kal e
Lê sed hewar û gazî
Jê dûr ketim çend sal e*

*Ez li wê hatim dinê
Wê dergûşê, hejandim
Hey wax hey mala minê
Dijminan, jê revandim*

*Perçeke ji buhiştê
Besreke zêrîn welat
Îro dest nagihîştê
Ax û keser ji dil hat*

*Xwezî vê carê jî min
Serê Xabê bidîta
Bila ruhistîn canê min
Hingê ji xwe re bistenda*

*Dêrika çayê Mazî
Welatê bav û kalan
Dîtina te dixwazî!
Newzad: Ji te re heyran*

NEWZAD

Ev bi navê Newzad (Qedrfî Can) di kîjan hejmara Herwarê de ye, ez ê paşê ji we re bibêjim, ya hewce nake, hema ez anuha bibêjim ku ew di hejmara 24an de ye. Lê ji xêndî vêya jî nivîsa wî ya ku li ser şîna Êlaso nivî-

sandibû, bi qasî ya seydayê Cegerxwîn û Celadet Alî Bedirxanî, ji dil û bitesîr bû.

Êlaso jî yek ji wan kesan bû ku piştî serhildana Şêx Seîdî, bû qurbanê eşîrên dost û şîrîk. Ji ber wê bû, ew bûbû hêsîrê lingbîlelek, teva dostên mixelet.

Li ser gotina wî bû, ev çend agahdariyên li bin hevdu, gava ku ew gîhaştibûn nêzîkî cihê bifelaket.

Yek ji wan serokeşîran bû ku ji pênسد siwarên xwe re gotibû, "Gava hûn gîhîştin perê şerî; bala xwe bidinê, kî be, yê xwedî qudret, bêyî ku hûn ferqê têxin nava qewim û nijadî, rakin ala yên bihaşmet!" Û gava di lelekê de çûbûn Diyarbekirê, li ser Pîra Deherî ev gotin ji bavê Memduhî re kiribû:

- Ez dizanim ku anuha ahlên cebesên dendikreş, dê sekinîbin li ser qesir û bedenên kevirreş û ew ê li me bikin "yûûûh" û bêjin, hey, bexte reş", wê çaxê hemû gotinên ku me ji bo we gotibû, "Mala Reş, bexte reş in", dê bin qerfên ne xweş.

Xwedê giravî, diviyabû me bikira qala Pozê mancêlê û Êrge Babayî, lê piştî ku em ketin nav meseleyên bi sergêjî, me ji bîr (ne) kir Bilxêr, Qulîka Guran, Şikefta Devnîzmîk û Kanî Hinara di nivê Textê Qîza Qirêl ku milê wê li Giyarê Bamiyê ye. Ji xwe, hûn ê bibînin gelek nav û xweşiyên van giyarên hanê, di çarînen nemirê mala Cano de. Êdî di ser wan re hewce nake ku em bikin bahs û qal û pesnê van giyarên rîq û rût. Ji xwe Êrge Baba ji xêndî şevên Newrozê ku li serê wî agirê ji tekelan fêdiket, ne xwedî tu xusûsiyeteke ku mirov qala wî bike. Lê divê em ji bîra nekin Kelek, Elbelûş, Fitin, Rebet û Heramiyaya ku di pêxîla wî de nin.

Ibrahîm Seydo Aydogan ji bo kovara Gulistanê bi solîstê Koma Wetan û berpirsiyarê wê Kerem Gerdenzerî re peyivî.

Vegera

KOMA WETAN

û çîroka 30 salan

"Xwezî min wê rojê ew gîtar ranehiştaya..."

Me û Kek Kerem Gerdenzerî, li Parîsê li mala hevalê xwe Farûq hevdu nas kir. Ji berê de hayê me ji wî çêbûbû û hingê me ew eziband mala hevalê xwe. Em peyivîn û sohbet her dirêj bû, me bi hev re stira, em bi hev re bédeng man û ponjîn. Gava me ji wî re behs kir bê xortên kurd çi qas ji Koma Wetan hez dikin, hêsir bi çavên wî ket. Dîgot, "min nizanîbû ku stranên min ew qas têne hezkirin."

Ketibû. Weke gelek kurdan wî jî derba xwe ji jîyanê xwaribû, lê nedixwast ku min di vê nivîsê de behsa vê yekê bikiraya. Lê belê, ez dibêjim qey, yek ji karên min jî ew e ku ez vê yekê binivîsînim û bi xelkê bidim zanîn. Gelek hunermendên me di nav bêxwedîtîyê de dijîn û dîsa di nav xizaniyê de dimirin. Gava em li ser vê yekê peyivîn, carekê gava got "xwezî..." hêsir dîsa bi çavên wî ket û ji min xwast ku ez qeydê bidim rawestandî. Got, "ez ê vana ji te re bibêjim lê tu di nivîsa xwe de behsa wan neke." Piştî ku wî peyva xwe qedand, min ew qane kir û min got "ez ê vana jî binivîsînim".

Me got "ka em dikarin ji bo te çi bikin?" Em bi hev re fikirîn. Ji bo kasetaya ku beyî wî hatiye çapkirin, em bi hevalên xwe yên Stembolê re ketin têkîliyê û me biryar da ku em kasetaya wî teva stranên ku jê hatine derxistin ji nû ve çap bikin. Di çapa Tirkiyeyê de du stran, em jî nizanin bê çima weha bûye, jê hatine derxistin û di hin stranên de qeyd hatiye xerakirin. Ez bawer im dawiya wê havînê, em ê bikarin ji nû ve û bi qeyda orjînal î Koma Wetan guhdarî bikin.

Kek Kerem du rojan bû mêvanê me û ji bo kovara Gulistanê me hevpeyvînek pêk anî.

Kerem bikin...

Koma Wetan çawa ava bû?

Ibrahîm Seydo: *Kak Kerem, ji bo xwendevanên kovara Gulistanê, tu dikarî ji kerema xwe re behs bikî bê Koma Wetan kengî û bi çi awayî dest pê kir?*

Kerem Gerdenzerî: Em li bajarê Tilbîsê (Gurcistan) bûn, di sala 1972an de min dest bi avakirina Koma Wetan kir. Wê çaxê em hê xort bûn û me jî mîna xortên wê demê li muzîkên ewropayî wek "caz" û "rock" guhdarî dikir û ji wan hez dikir. Cure cure komên muzîkê hebûn. Hemûyan bi zimanên xwe û muzîka ewropayî, wek rock û caz çêdikir. Me jî dil hebû ku me komeke weha ku di kurdî de muzîka ewropayî pêk bînîyaya ava bikiraya. Min ji xwe re çend stran çêkirin. Wek "Kurdîstana min" û "Nava Hezaran". Bi dû re, bi vê mebestê, em bi ser hev de hatin. Wê demê gelek kesên ku dixwast bi me re bixebitiya hebûn, gelek kes hatin, lê carê em mecbûrî guhertina sazbandên xwe dibûn. Asoxî, piştî guhertina gelek sazbandan, di sala 1975an de me Koma Wetan ya ku ew kasetaya yekem çêkiriye ava kir.

Hûn çend kes bûn? Endamên komê yên din kî bûn?

- Em çar kes bûn. Rafaelê Şamilê Dasînî (batarî-derfana), Levon Şaxbazyan (elektro pîano), Omerê Sebriyê Recevî (solo gîtar û vokal) û ez, Keremê Tahîrê Gerdenzerî (bas gîtar û vokal). Em tev li festîwalan dibûn û wê demê heta ku Ko-

ma Wetan bi temamî stîla xwe zef kir, me gelek konser pêk anîn û em tev li pêşbaziyan muzîkê dibûn. Komên hemû mîletan, yên ermenîyan, yên gurciyan, yên rûsan, heta bi yê almanan jî. Em jî li ser navê kurdan tev li wan pêşbaziyan dibûn û me gelek xelat jî stendin. Em çend caran derketin televîzyona Gurcistanê, Ozbekistanê û Tacikistanê jî.

Te û endamên komê yên din, we ji berê de jî hevdu nas dikir an na? Ji ber ku gava ez li navên wan dinîherim, ez dibêjim qey kesên nekurd jî di nav we de hebûn ne weha?

- Belê, em hemû cîranên hev bûn. Ji bilî Levon Şaxbazyan em hemû kurd bûn. Levon jî ermenî bû. Di flarmoniya Gurcistanê de dixebitî, yên din jî di komên gurciyan de dixebitîn. Gava em bi hev re peyivîn me biryar da ku em bi hev re bixebitin.

Te got ku berî ku Koma Wetan dest bi karê xwe bike, hemû xortan li "caz" û "rock" a ewropayê guhdarî dikir. Lê endamên Koma Wetan wek muzîka ewropayî li kê an jî kîjan komê guhdarî dikir? Bi kurtasî yê ku tesîr li ser muzîka Koma Wetan kir kî bûn?

- Wê demê ne me bi tenê, gelek li muzîkên bi vî rengî guhdarî dikir. Wek mînak, Beatles hebû, Jimi Hendrix hebû, Led Zepplîn hebû, Deep Purple, Carlos Santana

hebû, Pink Ployd û Rollîng Stones hebû. Muzîkên cure cure hebûn, yên mîna me hemûyan ji van muzîkan hez dikir.

Lê we qet tiştek ji muzîka kurdî ya klasîk wernegirt? Hûn bi çi awayî ji wan destkewtî bûn?

- Heke, ew muzîka me ya klasîk nebûya, dengbêjên me, stranên me yên gelêrî nebûna, muzîka modern jî û Koma Wetan jî nedibû. Ji ruhê kurdan yê berê, me muzîkeke nû, stîleke nû ava kir. Stranên min hemû ji ruhê kurdî tên. Bala xwe bidinê, gelo yekî alman dikare rocka kurdî çêbike? Na! Ew bi tenê dikare, muzîka almanî, rocka almanî çêbike. Ji ber ku ruhê wî alman e, bi stranên klasîk yên almanî mezin bûye. Yê me jî ruhê me kurd bû û em bi stranên kurdî mezin bûbûn.

Erê, gotinên we ber bi muzîka klasîk ve diçin, wek, "Heseno lo, şûrê destê de sincirî", wek "Filîto" wek "Di Bayê Payizê" de tu dibêjî "çi digerî, mîna hespê bê gem û zîn, hey lê..." Ev gotin naşibin gotinên muzîka ewropayî. Hemû rasterast ji ruhê kurdî tên. Lê di muzîkê de vê yekê bi çi awayî tesîr li we kir?

- Me dixwest muzîka ewropayî çêbikiraya. Wek mînak, Omerê Sebrîyê Recevî zahf baş li gîtarê dida. Nêyta me hebû ku me hebekî zêdetir solo gîtar bi kar bianiyaya, lê me got kurd dê lê guhdarî nekin. Bi vî awayî muzîka klasîk hebekî ji me re bû asteng jî. Lê niha gava ez lê diniherim, ez ji xwe re dibêjim ku me xeletiyek

kiriye. Diviya me solo gîtar hebekî din jî zêde bi kar bianiyaya.

Stranên Koma Wetan çawa dihatin çêkirin?

We stran çawa çêdikirin? Yanî, kê melodî ava dikirin? We çawa li ser stranên li hevdu dikir?

- Min melodî çêdikirin. Stran hemû yên min in. Min ji xwe re lê dixist. Gava melodî تمام dibû, em li hev dicivîyan û min ji bo hevalên xwe lê dixist. Wê gavê herkesî fikirên xwe digot. Wek mînak, yekî digot em di vê derê de batariyê têxinê, di vira de solo gîtar û hwd. Em ji nû ve li ser dixebitîn û bi vî awayî stran تمام dibû. Yanî, em bi hevdu re dişewirîn û me stran تمام dikirin.

Gotin jî hemû yên te bûn an na?

- Gotin bi piranî yên min bûn, lê min hin gotin jî helbestan jî wergirtin. Min helbestên Ezîzê Îsko û Letîfê Husên wergirtin. Wek "Cahiltî" ya ku digot "xazil ez dîsa zar bûma, li ber dilê dayika xwe bûma..." ew ya Ezîzê Îsko bû. "Bayê Payizê" û "Nava Hezaran" helbestên Mikailê Reşîd in. Ya "Elegez" helbesta Karlanê Çaçan e. Ya "Perîşan" helbesta Ordîxanê Celîl bû.

Lê di kasetê de tu tenê distirê û du stran jî ji aliyê kesekî din hatine gotin. Yên din jî nedistira?

- Di konseran de me bi gelek zîmanan distira. Bi kurdî, bi rusî, bi

gurcî, bi ingilîzî. Rafael nedistira, wî bi tenê dikarî pê re bigotaya. Omerê Sebriyê Recevî strana "Filîto" û "Hewa Sar e" digot. Bisekine ez ji te re behsa bîranînekê jî bikim. Em ketine studyoyê. Min hemû gotinên "Hewa Sar e" dane Omer û min got bistirê. Kurdiya wî ne ew qasî baş bû, ji ber wê, wî jî hema digot "şilî ye şilope ye, hewa sar e, hewa sar e..." û heta dawiyê hey ev peyiv dubare kirin. Gelek gotinên wê stranê hebûn lê wî ji xwe re bi beşekî gotinan girt û hey dubare kir. Ji ber wê ew stran jî weha nîvco hate qeydkirin. Gava "Filîto" digot jî mîna ingilîzan devê xwe xwar dikir û digot. Dixwast ku stranên me jî mîna wan bihatana gotin û heke tu bala xwe bidîyê tu ê bibînî, mirov dibêje qey bi ingilîzî distirê.

Lê we di nav xwe de bi kurdî xeber dida ne weha?

- Belê belê, me bi kurdî xeber dida. Bi tenê ji bo Levon me carinan werdigerand rûsî, lê wî jî bi kurdî fahm dikir.

Le fikira gotina 'bi kurdî ji aliyê kê ve hate pêşniyarkirin? Ji her ku te got ku bi zimanên din gelek kom hebûn û we jî li wan guhdarî dikir. Niha jî hin komên kurdî hene ku nîv-kurdî û nîvtirkî distirên. Lê wê demê we biryar da ku hûn bi kurdî bistirên.

- Niha, ne gelekî baş e ku mirov hema behsa xwe bike.

Na, kerem bike.

- Fikira kurdî ya min bû. Min berê jî çend stran çêkiribûn û min bi wan da guhdarîkirin û min got ku em ê bi kurdî bistirên. Wan jî qebûl kir.

Kîjan stran berî yê din hatin çêkirin?

- "Hewa sar e" "Bayê Payizê" û "Nava Hezaran".

"Nava Hezaran" di kasetê de tunebû, ne weha?

- Belê di serî de hebû, lê min qeyda wê neçiband. Min xweş negotibû. Ritma wê hinekî bi lez çû. Ji ber wê me ew nexist kasetê. Stranê ke din jî heye ku di kasetê de heye, lê di kasetê ku li Tirkiyeyê hatiye çapkirin de ew stran jê hatiye derxistin. Nizanim çima, ji ber ku beyî min hatibû çapkirin.

Endamên Koma Wetan yê din bi ku de wenda bûn?

Belê kek Kerem, te behsa endamên Koma Wetan yê din jî kir; lê ya ku tê miraçkirin jî ev e ji xwe. Gelo hevalên te yê din niha li ku ne? Dev ji muzîkê berdan an na? Hûn kengî û çawa ji hevdu ve qetiyay? Tu dikarî ji kerema xwe re hebeke behsa wan bike?

- Salên ku sovyet belav bû, weke gelek hêlên civakî, polîtîk û hunerî, vê bûyera dîrokî tesîra xwe li muzîkê jî kir. Ji 1990î û bi şûn de koma me nema dikarî bixebitîyaya û bi vî awayî

em jî ji hev ve qetiyên. Rafaelê Dasi-
nî êdî li flarmoniya Gurcistanê xebitî.

*Piştî ku hûn ji hev ve qetiyên ew
derbasî flarmoniyê bû ne weha?*

- Belê belê, piştî ku em ji hev ve
qetiyên. Wê demê civat ji aliyê
aboriyê ve têk çûbû. Me nema dika-
rî konser çêbikirana. Levon Şax-
bazyan jî, derbasî komeke gurcî bû.
Omerê Sebriyê Recevî jî çû Rus-
yayê.

*Wî jî bi hinin din re dewam kir,
an bi temamî dev ji muzîkê berda?*

- Na, wî bi temamî dev jê berda.

Hayê we ji hevdu tune ye niha...

- Ji zû ve ye ku me li hevdu ne-
geriyaye. Ez niha nema dizanim bê
li ku ye jî.

Kaseta Yekem

*Lê kaseta Koma Wetan? Te ji
min re gotibû ku we di 1979an de
qeyd kiribû, lê di 1989an de çap bû-
bû.*

- Me fonograma xwe li Tilbîsê,
li fîrma Melodiya, di 1979an de çê-
kir; lê belê derfetên belavkirinê bi
destên me neketin. Cara yekem, fîr-
maya Melodiyayê kaseta me ji bo
Yekîtiya Kompozîtorên Rusyayê
şande Moskowayê û wan jî çapkiri-
na kasetê qebûl kir. Bi vî awayî ji
aliyê karhana Aprelîwskiyê ve di
sala 1989an de kaseta me hate çap-
kirin.

Piştî ku ev kaset çap bû, we tu

*xebatên din nekir û 1996an de te bi
hin muzîsyenên din re dest bi xebatê
kir. Lê belê, kaseta we di vê navê re
li Tirkiyeyê hate çapkirin û li ser wê
jî hatibû nivîsandin ku endamên
komê ji hevdu belav bûne û kesî ne-
ma şopa wan peyda kiriye. Gelo
hayê we jê çêbû ku kaset beyî we li
Tirkiyeyê hatibû çapkirin? We çi hîs
kir gava ku hayê we jê çêbû?*

- Belê, lê gava ku ez hatim ew-
ropayê hayê min jê çêbû. Ji min ree
hate gotin ku kaseta me li Tirkiyeyê
beyî me hatiye çapkirin. Elbet ev
neheqiyek e. Kaseta me ye, em tê
de xebitîne, me keda xwe dayiyê, lê
beyî ku hayê me jê çêbibe hatiye
çapkirin.

*Te nepirsî an jî tu lê xwedî der-
neket?*

- Çawa? Lê ma min ê ji kê bipir-
siyaya û ez ê çawa biçûma bi pey
wê biketama? Ez gelekî li ber ke-
tim. Hema min dev jê berda û ez bi
pey neketim.

*Erê, lê piştî ku tu di Med TVyê
de derketî, xelkê fahm kir ku hûn ne
kesên wendabûyî ne, lê gelek hezki-
rên we hebûn. Kesî ji we nepirsî bê
heta niha hûn li ku bûn?*

- Belê ez çend çaran derketim
televizyonê, roportajeke min jî di
radyoyeke almanî de û di radyoya
kurdî Dengê Amerîkayê de hate
weşandin. Di wira de jî min behs
dikir bê me çawa kom ava kir û em
kengî û bi çi awayî ji hev ve qetiyên.
Bi vî awayî hayê kesên ku li
muzîka me guhdarî dikir ji min çê-

bû û elbet xelkê dipirsî, lê tişt nema ji destê me dihat.

Lê niha vaye kaseta Koma Wetan dê li Tirkîyeyê ji nû ve bête çapkirin. Li ser vêya tu dikarî çî ji me rê bibe-je?

- Belê, min hemû mafên kaseta xwe daye wî camêrê ku dê kasetê teze çap bike. Her weha, kaseta min ya nû jî heye û stranên ku niha ez li ser wan dixebitim jî hene. Ez ê wan jî bidime wî, hemû dê bêne çapkirin.

Kaseta duyem û vegera muzîkê

Piştî ku hûn ji hevdu ve qetiyar, te dev ji muzîkê berneda, ne wehî?

- Belê, weke gelek kesan min jî demekê dev jê berda. Ez teva malbata xwe ve hatibûm Moskowayê û li wira di sala 1995-96an de min ji nû ve dest pê kir. Hin kesên ku hê li ser muzîkê dixebitîn mabûn. Leonîd Atabekov, Nîkolay Seştov, Aleksandir Varabiyov. Ez li Moskowayê teva wan xebitîm û min di sal û nîvekê de kaseta bi navê "Azadî" çêkir.

Kaseta sêyem û polîtîkbûna hunermendan

*Lê em dizanin ku kaseteke te ya din jî heye. "Hawar". Ew çawa derket? Tu dikarî ji kerema xwe re hebe-
bekî behsa wê jî bike? Ji ber ku hin*

stranên wê kasetê dikin ku mirov te û Koma Wetan, bivê nevê, têxe kategoriyeke polîtîk.

- Belê, gava di sala 1999an de serokê PKKê Abdullah Ocalan hate girtin, weke hemû kurdan, dilê min jî êşiya. Baş an jî xerab, ew min aleqadar nake. Wek hunermendekî min ji xwe re got ku divê ez stranekê li ser wî camêrî çêkim. Ez bi xwe, polîtîk nîn im, ez hozan im, hunermend im. Ez dikarim li ser hemû kesên ku gaveke piçûk jî ji bo kurdan avêtibe stranan çêkim. Min li ser wî jî stranek çêkir û min navê kasetê jî "Hawar" danî. Hawara milletê kurd.

Lê li cem me kurdan adetek heye. Xetên polîtîk gelekî êşkere ne. Yekî ku hema nêzîktêdayineke piçûk be jî nîşanî partiyeke polîtîk dabe, em dibêjin ku ew jî hevalê wê partiyê ye. Te jî stranek li ser serokê partiyekê çêkiriye û gotiye "Hawar e, serokê kurdan dîl e." Her çî qas tu dibêjî ku tu kesekî hunermend î, kesên ku li vê stranê guhdarî bikin dê nebêjin ku tu jî hevalê wê partiyê yî?

- Belê ez wek hunermend polîtîk nîn im, lê em kurd, ji piçûkan heta bi mezinan, em hemû polîtîk in. Ji ber ku welatê me ji me hatiye stendin. Hingê ji bo min nav ne giring in. Ez dikarim li ser Mîr Bedirxan jî, li ser Şêx Seîd jî, li ser Mîstefa Berzanî jî, li ser Seyid Riza jî, li ser Qazî Mihemed jî bistirê. Ev hemû serokên kurdan in. Wek hunermend, ez nikarim xwe nêzîkî aliyekî bikim. Dilê min li ser êşiya û min stranek avêt ser wî. Bi çêkirina stranekê mirov nabe hevalê par-

tiyekê. Ez welatparêz im û huner-mendekî kurd im. Hemû mijarên ku kurdan aleqadar dikin dikarin têkevin nav stranên min.

Demên berê û bîranînên wan

Lê ez dixwazim ku tu hebekî behsa demên berê bike. Gava ku we hê nû kom ava kir û hûn derdiketin konseran, reaksiyona kurdan bi çi rengî bû? Ji ber ku muzîka we naşibe muzîka kurdî ya klasîk û kurd fêrî guhdarkirina dengbêjan bûbûn, lê we guhertineke mezin anî muzîka kurdî.

- Ez ji te re bibêjim. Belê rast e, kurd fêrî muzîka klasîk bûbûn, lê kesên ku dihatin konserên me jî hemû mîna me bûn. Yanî, yên ku dihatin konserên me hemû ciwan bûn û ji berê de hayê wan jê hebû bê ew ê li çi guhdarî bikin. Yê temenmezin jî ji me re digot, lawo gotinên we xweş in, lê em ji muzîka we fahm nakin. Lê kêma kesên weha hebûn, Bi piranî, xelkê ji muzîka me hez dikir.

Bibore, lê mîletê me nikare zû bi zû tiştên nû qebûl bike. Niha gelek peyivên nebaş jî hatine kirin û hûn aciz jî bûne. Divê hin kesan navê dî-nîtiyê jî bi pey we xistibe, ne weha?

- Ez ji te re behsa bîraniyekê bikim. Strana "Filîto" ji aliyê Omer ve hatibû gotin. Qey rojekê yekî şest-heftê salî li wî rast tê û ji wî re weha dibêje: "Kiro, ma ev te çima stra-

na "Filîtê Quto" weha guherandiye û xera kiriye, lo?" Omer jî ji bo ku xwe jê xelas bike dibêje: "Welleh xalo ne min weha kiriye. Kerem weha kiriye. Wî daye min û min jî stiraye. Here ji wî bipirse." Lê bûyerên weha kêma derdiketin pêşberî me. Civata ku em lê dijiyan civateke modern bû. Zêde pirsgirêk derdiket pêşberî me.

Ez bawer im, wê demê awayê we yê lixwekirinê jî ne wek yê derdora we bû ne weha? Ji ber ku niha jî kesên ku li van muzîkan guhdar dikin, an jî van muzîkan çêdikin, bi kincên xwe jî naşibin yên din. Yê we jî ne weha bû?

- Belê, çawa! Porê me dirêj bû, kincên me jî wek yên ewropayî bûn.

Kesî ji we re tiştek nedigot? Ji ber ku civat van cudayetiyan zû bi zû qebûl nake.

- Ne civat, lê polîsên sowyetê tahde li me dikir. Gava çav li yekî pordirêj diket, ew dikişand ber dîwarekî û hema li wê rastê porê wî meqes dikir û digot, de îcar here! Digotin, ev hemû ji tebiêtên emperyalîstan tîn. Ji ber wê yên ku porê xwe dirêj dikir, bi dizî diçûn û dihatin.

Lê kurdan jî tiştek ji we re nedigot?

- Ji xwe me nikarî porê xwe zêde berdaya. Lê dîsa dirêj bû. Mezinên me ji me re digot "kiro ev hûn çima weha dikin, ma hûn heşhîş in, hûn çî nin?" Lê zêde jî bi ser me de nedi-

hatin. Civata me hemû weha bû.

Lê xebatên nû?

Em hebekî behsa xebatên te yên nû bikin Kek Kerem. Do te çend nîmûne, çend stranên nû bi me dan guhdarîkirin.

- Belê, stranên nû hene. Min yek li ser Newrozê çêkiriye. Çend stranên min yên din jî hene ku hazir in û ew jî weke stîla Koma Wetan in. Min hin stranên zarokan jî çêkirine ku neviyên min Zînê û Emîna distirên û navê wê "em jî dixwazin bîjîn", bo ku zarokên me kurdan guhdarî bikin. Elbet bi muzîka modern. Ez ê wê jî wek kaset bidime çapkirin. Piştî ku kaseta Koma Wetan ji nû ve çap bû, ez ê wan jî bişînim. Hemû hazir in.

Muzîka kurdî ya nû: Çay û penêr û nan, an çay û kebab? Zirnevan û rock?

Ji salên hefteyê heta niha Koma Wetan hê jî li ser xeta xwe ye, lê weke ku tu jî dizanî muzîka kurdî jî hêdî hêdî ber bi modernîzebûnê ve diçe. Ilhes jî van deh salên dawîn gelek kes û gelek kom derketin. Heke em fikirên te yên li ser vê muzîka ku ji aliyê van kesên nû tê çêkirin bipirsin, tu dikarî çi bibêjî?

- Belê tiştên baş jî têne çêkirin û tiştên gelekî ecêb jî. Heke enstruman baş û di cihê xwe de bêne bikaranîn, baş e, lê heke li hevdu nekin

muzîkeke ecêb derdikeve holê. Niha em hala xwe bidinê. Ji bo taştêyê çay û nan û penêr bes e; lê heke tu rabe û çay û kebaban deyne ber min, ez ê pirsan ji te bikim, ne weha? Heke tu ji zirnevanekî bixwaze ku ji te re rock û cazê lêxe, ew ê tişteki komîk derkeve holê. Ew camêr dê nikaribe wê muzîkê çêbike. Divê her tişt di dewsa xwe de bê bikaranîn.

Lê ji bo kesên ku dixwazin muzîkeke modern çêbikin û wek Koma Wetan muzîkên nû biceribînin, tu dikarî çi şîretan li wan bike? Pêşniyaran te yên ji bo wan çi ne?

- Divê enstrumanên xwe baş nas bikin û li muzîka dinyayê jî baş guhdarî bikin. Lazim e bizanin bê li dinyayê çi muzîk tê çêkirin, xelk çawa distirên, divê mirov hemûyan bizane. Ne bi tenê ev jî; divê gelekî bi kurdî bixwînin û bidin pey zanîne. Muzîk bi tena serê xwe têra wan nake. Divê dîrokê bixwînin, romanên kurdî bixwînin, helbestên wan bixwînin. Ev yek dê bike ku gotinên baş jî ava bikin. Yanî, divê gelekî bixebitin. Yê ku kultura kurdî, dîroka kurdan, edebiyata kurdî nizanibe, nikare hunereke baş ava bike. Piştî ku stranên xwe çêkirin jî divê biçin nîşanî mezinên xwe bidin û bipirsin bê hela di gotinan de xeletî heye an na.

Kerem Gerdazerî kî ye?

Em hebekî jî behsa jiyana te ya taybetî bikin. Tu dikarî ji kerema

xwe re behsa malbata xwe jî bike?

- Serçavan. Ez kurê Tahirê Heciyê Gerdenzerî me. Navê dêya min Redîfa Necîb Begê ye. Malbata min ji aliyê Wanê ye. Piştî şerê osmaniyan û ezîdiyan, mecbûr mane ku derbasî aliyê Ermenistanê bibin. Em ezîdî ne. Hûn dibêjin Serhed, ji wê derê hatine û li Tilbîsê bi cîh bûne. Ez jî li wira di sala 1952an de bûme. Weke hemû zarokên sowyetê, ez jî çûm mektebê. Di duwanzdehsaliya xwe de min dest bi gîtarê kir. Ez çend salan ji bo gîtarê jî çûm mektebê. Heta niha jî ez bi muzîkê mijûl dibim. Ez zewicî me, pênc zarokên min hene. Sisê keç in, du kur in. Zarokên min, tamam mekteba muzîkê xelas kiriye. Du keçên min heşt salan mekteba pîanoyê xelas kiriye. Ya piçûk jî deh salan pîano xwendiyê û bi dû re jî instituya muzîkê ya Moskowayê qedandiyê. Kurekî min mekteba klasîk gîtarê xelas kiriye. Kurê min yê din jî ya rock-gîtarê xelas kiriye. Em ê bi dû re kaseta kurê min ya klasîk gîtarê jî belav bikin. Kaseta kurê min yê din jî, ya rockê hazir e.

Xuya ye ku hûn wek malbat, hemû muzisyen in. Ev ji te dest pê dike an berî te jî di malbatê de kesekî muzisyen hebû?

- Na berî min kesek tunebû, bavê min mirovekî xwedênas bû, bi şev û roj dua dikir. (Dî kene...) Kesekî muzisyen tunebû.

Xwezî...

Lê niha gava tu li kaseta Koma Wetan guhdarî dike, tu ji xwe re di-

bêjî xwezî me ev der weha biguher-taya û ev der weha bikiraya?

- Belê çawa! Di gelek stranan de divê me gîtar hebekî zêde bikiraya. Di hin stranan de dengê keçikan hebûya dê baş bibûya.

Kîjan stran?

- Wek di ya "Elegez"ê de divê dengê keçikan jî hebûya. Lê xwezî me muzîk hebekî serbest berdaya. Tirsra me ew bû ku kurdan jê fahm nekiraya. Lê ew xeletiyek bû.

Wekî din gava tu niha li dû xwe diniherî çî tê bîra te?

- Niha gava ez diniherim... gelek dengbêjên kurdan yê delal di nav bêxwedîtîyê de mirin, gelekên ji wan pars dikir, di dawetan de ji bo du olçek genim distira, ji birçîna dimirin û hê jî dimirin. Lê ez li xwe diniherim... ez li niha gelekî li ber dikevim. Xwezî min wê rojê ew gîtar ranehiştayê û dest bi muzîkê nekiraya...

Ezbenî, ez dixwazim ku em hebekî jî behsa rewşa kurdan bikin. Wek şexs, gava tu li rewşa kurdan dinihere, tu çî difikirî?

- Rojnamegerekî alman digot, em nizanin bê çawa dibe lê kurd tu carî nakevin, her ku dikevin, piştî demekê dîsa li hev dicivin û dîsa radibin. Rewşa me ev e. Em çî qas bikevin jî em ê rabin. Dewleta me tune. Welatê me hatiye stendin. Em ji hevdu perçe bûne, lê weke her kurdî hêviya min jî heye. Em ê rojekê bibin xwediyê welatê xwe.

Ji Hêviyên Çavên Xwe

Ronahiyekê Bide Min

*Gundên xerabe
Bajarên birçî
U rewşenbîrên nîv-şuştî
Li hev baniyan,
Zengê li badikim
Li bêndera mejûyan.*

*Ziman xistine çarmîxê
Cîgerxwîn dinalin,
Jarê didalêsin
Dilên hêçare.
Di golên hêbinî de
Bêhawar difetisim
Tarî dibare,
Ji hêviyên çavên xwe
Ronahiyekê bide min
Bêstar im.*

*Rojê veşartin,
Ji hezar salan vir de
Zûlum dibarînin
Tîrên kedmijan.*

*Berxikên sêwî
Gurên har kedî dikin,
Jiyan bi dafikan xemilye
Çar alî xapînok
Tarî dibare,
Ji hêviyên çavên xwe
Ronahiyekê bide min
Bêstar im.*



Şahinê Bekirê Soreklî

Hîn hebû

hevî*

Etar ket gund û li şûna bêderan, hev-sar di dest de, kera sandîq li ser piş-tê li dû, bang kir: "Evîn haaa! Evîn haaa! Evîna şîrin heye, mizgîna dilan heye!"

Gundî li dora etêr civiyan, jê pirsîn û qîriyan: "Çi heye bi te re, etaro, çi? Ra-ber ke, ka te îroj çi haniye! Û etêr bersî-va gundiyan da, gotinên berê dubare ki-rin: "Evîna şîrin heye, mizgîna dilan he-ye." Pîran ji aliyekî ve, zarokan ji aliyekî din ve; hinan bi çavan, yên din bi lepan, sandîqên etêr velo kirin, serên xwe leqan-din û gotinên wî bawer nekirin. Dû re gundiyan li çavên hev niherîn, bi dilên sar paş ve kişiyên û etar di şûnê de hîştin, ew û kerê û sandîqên tiji evîn.

"Evîn haaa! Evîn haaa!" etêr dîsa bang kir, lê çi kir, çi nekir, dengê wî ke-sek haydare xwe nekir. Li gel wê jî wî dil sar nekir, destek da kêleka rûyê xwe û car din bang kir: Gundîno! Werin evîne, we-rin! Li şûna şekirê kulorîn, xurme û hêjî-rên hişk, îroj min haniye ji we re evîn. Û ez evîne bi peran nafirosim, ne jî dixwa-zim ceh û gênim. Ez wê bo we diyarî di-kim. Lê bêyî kelk; dîsa kesek li etêr xwedî derneket.

Li ezmên ewrên dagirtî civiyan, hev girtin û ji wan befir bariya, û dirêj nekir qefilî giyanê etêr. Û gundiyan girtî hîştin deriyên xwe, dikirin kusetepist di paş wan de, digotin, "dîn bûye etarê bêçare, dîn! Ma çawa di sandiqan de dê hebe evîn?!"

Etêr gund li dû xwe hîşt û di bin berfê de beri da bajêr. Ber têkeve hindir bajêr, dageriya goristana wê û barê kera xwe li ser xweliya gorekê vala kir. Bi Rojhelata roja din re wî kerê xwe da pê xwe, bir mezatê û arzan firot. Ji wê rojê û şûn ve wî etarî li şûn hîşt û geriya di nav taxên bajêr de. Carine di quncikekî de pişta xwe dida dîwarekî û bi saetan deng jê nedihat der. Di kûraniya dilê xwe de etar dibû penaberekî di nav hebûna xwe de. Ew di xewnên xwe de diçû gundên şên û bedew, evîn difirot keçên çeleng, na nedifirot, diyarî dikir ji bo wan. Û her ku ji xewnên xwe vedigeriya nav bayê sar yê taxên bajêr xemgîn û dilşîn dibû etar, bayê qerimî di bêvilên xwe re dikişand û di devê xwe re germ berdida. Yekcaran jî dimeşiya, bang dikir û diqîriya, gaznic dikirin ji kesên îroj, yên ku xwedî derdiktin li xurmeşiroşan, dikirin xurmeyên wan yên kurmî, lê guh nedidan evînfiroşekî dilbrîn.

Rojekê ji rojên biharê etar çû nav goristana bajêr û li gora ku wî li ser wê barê evînê rijandibû geriya. Û çavên wî ji nişkan ve li kulîlkeke soravîn ketin ku li ser xweliya goreke biçûk li ba diket. Etar pîrr şa bû bi dîlana kulîlkê û wî ew di bin ronahiya va roja nîsanê de nas kir. Erê, evîna ku wî bi ser xweliya gorê de rijandibû berhem dabû. Û etar ber bi gorê bezi-

ya, gihîştê, xwe bi çongan xist erdê, kulîlk kir navbera her du destên xwe û çel û çar çaran maç kir, lê neêşand, ne qurçifand, ne jî jêkir.

Ji wê rojê û şûn ve etar nema êdî geriya, ne jî bi encama hêrsa di dil de qîriya çimkî miriyekî, yan miriyekê, evîna wî kirîbû û ji ber ve kulîlkeke soravîn dabûyê. Û etêr gote xwe, "ez ê bijîm, ez ê bijîm, hîn heye ji bo min hêvî, hîn heye ji bo min hêvî, hîn heye ji bo min hêvî."

Destpêka gulanê bû. Etar çû mêrzel (goristanê) da ku serîkî li kulîlka xwe xe:

*Wey xweristê tu malava!
Wey cîhanê tu ser çavan!
Kulîlk bûye du kulîlkan,
yek piçekî çilmisiye,
ya din ciwan li ser xwe ye.*

Û etêr ya tî, bêyî ku biêşîne, jêkir, îcar sê çaran maç kir û ew di ber pêşîra saqoyê xwe re kir. Û du zaroyan ew li ser riya bajêr dîtin, rojbaşî lê dan û li ber geriyên: "Apo wê gulê bide me, heyran, apo!" Û etêr kulîlk pêşkêşe wan kir, û her sê bi hev re kenîyan, kenîyan û kenîyan, û etêr bi dengê xwe yê zengilîn bang kir û her du zaroyan lê vegerandin û dengên wan bûn yek deng û di kolanên bajêr de xweş hat bihîstin: "Evîn heye, evîn. Evîn radike xeman, şahiyê dixelolan,..."

Û etar bi rê ket. Destmal di destekî de û destek li ser sêrî, bi stiran û dîlan domand riya xwe, û hejmara zarokan zêde bû, li her du aliyên wî dan lotikan. Hîn hebû hêvî, hîn hebû hêvî, hîn hebû hêvî,...

Kewê Ribat û Şahê Dengbêjan:

Gava ku Hesênê Cizîrî li Zaxoyê wefat kir, cendekê wî yê ku sê rojan ji neçarî li mal ma, ji hêla Belediyeya Zaxoyê ve hate hilanîn û veşartin. Eyşe Şan, di nav feqîrî û belengaziyê de, li xûrbetê mir. Bi tevahî deh kes li pey cenazeya wê tunebûn. Nesrîn Şerwan, salên xwe yên dawîn li kûçe û kolanên Bexdayê ligel dermanên xwe derbas kirin. Tevahiya mal û milkê Nesrînê, boxçikeke wê bû ku di nava wê boxçikê de bi tenê çend cil û berg û reçeteyên dermanên wê hebûn. Reso, Şakiro û Mihemed Şexo jî, ligel jiyana trajîk xatirên xwe ji me xwestin. Dengbêjên me jiyana karesat û mirinên bi vî awayî tu carî heq nekiribûn.

Ji bo bîranîna Hesênê Cizîrî, Eyşe Şan, Nesrîn Şerwan, Reso, Şakiro, Mihemed Şexo û bi dehan dengbêj, stranbêj û hunermendên ku bi awayên trajîk û karesatî ji nav me bar kirine.

ŞAKIRO

(1937-1996)



Salihê KEVIRBIRÎ

salihkevirbiri@hotmail.com

Li welatê bav û bapîran, tesîra dengbêj ango goranîbêjan li ser gel pir xurt û giran e. Êdî îro ji hêla bi sedan rewşenbîr û zimanzanan tê saloxdayîn ku çand, edebiyat û zimanê kurdî bi saya dengbêjan li ser piyan maye û ji tunebûn û pişaftinê rizgar bûye. Dengbêj li welatê me kaniya dîrok û çandê ne. Ew, di kilam û gotinêrên xwe de carinan dibin Siyabend li ser Xecê dibêjin; carinan dibin Emê Gozê posteya dewleta Roma Reş dişelînin; carinan dibin Filîtê Quto, diçin pêşiya karwanê Mamê Elê Et-mankî; carinan jî dibin Bişarê Çeto û li dijî Îris şer dikin

Şakiro, yek ji dengbêjên me yên bi nav û deng bû ku bi taybetî li Bakur, bi giştî jî li seranserê welatê me dihate naskirin. Bêyî mûbalexe em dikarin bibêjin ku ev naskirin her diçe berz û bala dibe. Bêguman îro lêkolînek bê kirin, wê bê dîtin ku di her maleke kurdan de kasetên Şakiro hene. Li ser vê yekê dixwazim bîranîneke xwe bînim zimên. Di demsalên bihar û payîza par de, ji bo xebata lêkolînî û rojnamegeriyê ez li Macarîstanê bûm. Ji bilî paytext Bûdapeşteyê gelek caran ligel heval û dostên xwe yên li vî welatî, em derdikestin derveyî bajêr. Baş tê bîra min di rojekê de em li bajarên bi navê Sentedre, Vişegrad û Zîgetvarê geriyabûn. Di vê gera me de, ber bi êvarê beriya ku em vegerin Buda-peşteyê, ji bo ku em zikê xwe têr bikin me xwe avêtibû restorantekê. Li vê xwaringehê ligel xwarineke xweş û çêjdar, tiştê herî xweş ew bû ku ji fonda muzîkê awazeke kurdewar bilind dibû:

Hey zalim zalim zalim zalim hey
zalim
 Hey zalim keçikê digo lawiko wele
tu kal î

Lawik digo keçê wez ne kal im
 Nêzîkî heftê heştê nod sal im
 Bila mala xwediyê kalbûnê ne
 Bi xana xwedê be li min kal kir
 Xortaniyê xwe ji min qelapt
 Qîza dilê xwe ji min sar kir
 Jinebiyên malixirab

Malên xwe ji kêlekê malên me
bar kir
 Hey zalim zalim hey zalim hey zalim
 Koçer im xirabmal im

Akincî me bêpergal im
 Rêvingî me bêheval im
 Nexweş im gelek bêhal im
 Gava berê min û lawikê min
 Dikete welatê xerîb û xûrbetê
 Ezê çiqas ji halê xwe û lawikê mala
 xwe re dinalim
 Hey zalim hey zalim
 Hey zalim hey zalim.

Belê, hûn ne şaş in! Ew deng û awaza şêrîn, deng û awaza Mamê Şakir bû..

Rehmetiyê Şakir, şagirtê dengbêjê mezin Reso bû. Her çiqas jî Qereyaziya Erzeromê tê zanîn jî, ew bi eslê xwe ji Patnosa Agiriyê ye û wekî "Şakirê Mezin" ango "Şakirê Bedîh" jî tê naskirin. (Gelo pêwîst dike ku em bibêjin mamê Ozcan Deniz ê beredahî ye!?) Şakiro, di paşeroj û pêşeroja stran û kilamên me yên klasîk de xwedî kûrahiyeke dewlemend e û di vî warî de yek ji bingehen qedîmî û pîroz e. Yek ji dengbêjên bi nav û deng Kazo di gotûbêja ku me pê re kiribû de li ser Şahê Dengbêjan Şakiro wisa digot: ..Li rûyê cîhanê, Şakiro heger ne di rêza yekem de be jî, miheqeq di rêze duyem de ye. Qirok û xûlxûlandina ku bi Şakir re heye, îro ez ne bawer im ku bi sê-çar dengbêjan re mabe. Nivrojek em bi hev re man. Mirovekî xwîngerm û xweşsohbet bû. Ji ber ku ew 'dîwanbir' bû, dîwan û dîwanxaneyan bi rêve dibir...

Kilamên wekî 'Gulê Dêran', 'Şerê Mala Nasir', 'Eliyê Pûrto, Nêçîrvano', 'Geliyê Zîlan', 'Melazgir', 'Şêx Seîd', 'Dîlber', 'Esmer', 'Kejê' û 'Sebrê' awazên şêrîn in di devê Şa-

kirê dengzêrîn de. Bi taybetî gava di kilama 'Esmer' de rêzîkên wekî:

*Esmera min bilind e
Di ser re çiya di binî de gund e
Esmera min yeka bejn bilind e
Çav belek e
Tu çiqas bêjî hewqas rind e....*


Bi awaza Şakiro re dibin yek, mirov dibe bendewarê evîndarê/a xwe ya zarokatîyê.

".....Şakir, şêrînahiya dinyayê bû. Ronahiya çavê min bû. Mirovê dîwanxane û civatan bû. Sercivat û serbêje bû. Gelek dengbej ji ber ku nikaribûn wekî wî bibêjin, jê dihesidîn. Ji hevalên xwe hez dikir. Rehma Xwedê lê be. Ji me dengbêjan, dengbêjtir û çêtir bû..."

Belê, ev gotinên hanê jî, gotinên Dengbêjê navdar Zahiro ne ku li ser Şakirê Nemir ji me re gotine.

Li Gorî Kurdên Îranê Kewê Ribat

Wekî di destpêkê de jî hatibû diyarkirin, Şakiro ne bi tenê li Bakur, her wisa li çar taqên welatê me 'şêrînê ber dilan' bû. Bi taybetî li nav kurdên rojhilatî Şakiro tê wateya jiyane. Kurdên Rojhilatî bi Şakiro re radibin û bi Şakiro re rûdinên. Yek ji rojnameger û rewşenbîrê rojhilatî Îkram Balekanî ku bi eslê xwe ji Urmiyeyê ye, der heqê vî dengbêjî de wisa dibêje: "Li tevahiya bajar û gundên kurdên me yên Îranê de, kasetên Şakiro hene. Ez bixwe bi Şakiro re mezin bûm. Ew ji bo gelê me yê rojhilat 'Kewê Ribat' bû. Dengê wî



wekî dengê 'Kewê Nêr' bû. Her çiqas dengbêjê bi nav û deng 'Xalê Birê' ango Birahîmê Newrozî li Urmiyeyê dijiya, dîsa jî wekî Şakirê Rehmetî nedihat hezkirin. Bi kurtasî ew ji bo birîna keç û xortên evîndar derman: ji bo kal, pîr û navsereyan jî efsane bû!"

Her çiqas piraniya dengbêjan ji hev hez nakin û gelek caran dikevin nava hewldanên ku hev dihetikînin jî, mirov nikare vê yekê ji bo Şakiro bibêje. Werin em li ser vê yekê dêhn û bala xwe bidin awaxweşe herêma Xerzan, Dengbêj Salihê Qubînî: "Piştî mirina wî kilam û stran sêwî man! Piştî Şakirê rehmetî, min ne ba-

wer e ku çend kesên wekî wî ji nav me rabin. Şakiro kilamên xwe bi du hawînî yan digot. Dengbêjên ku bi vê terz û şewazê kilaman dibêjin, gelek kêr in. Bi rastî jî dengbêjekî gelek şareza û zana bû. Li gorî bawerîya min, du dengbêj didin pey rêç û şopa Evdalê Zeynikê, Ferzê û Reso. Yek ji wan Karapetê Xaço yê ermen e, yê din jî rehmetiyê Şakiro ye. Temenekî direj ji Mamê Karapet re dixwazim û ji bo Şakiro jî dibêjim Rehma Xwedê li te be Kekê Şakir.

Tu caran ji bîra min naçe; Beriya ku ji nav me bar bike û rehma Xwedê xwe lê bipêçe, nexwestibû pirsên rojnameger Rahmî Batur bibersivîne. Her çi qas Rehmî, ji bo ku pê re hevpeyvînekî pêk bîne, piştî serê xwe jî dîtîbû, lê wî daxwaza hevpeyvîne nepejirandibû. Sedema vê yekê jî ji Rehmî re wisa anîbû ziman: "Ez ji kurdan dilşikestî me. Kurd, li dengbêjên xwe xwedî dernakevin. Ka dêhn û bala xwe bide tirkan. Aşiq Weyselekî wan hebû ku te bîdîta, dilê te li hev diket, sê roj te nikaribû xwarin bixara, lê Resoyekî me hebû, hostayê me tevan....Birçî mir..! Ka bibêje ezê çawa bi te re mijûl bibim û dilê xwe ji te re vekim!?"

Belê rast e, gilî û gazincên wî gelek bûn. Dengbêjekî wekî wî ku li seranserê cîhanê li nav kurdan tê nasîn, ne xwedî çend dîmen e ku di televizyonên me de bîna nîşandan. Gelo heta niha nivîsên ku li ser vî camêrî hatine nivîsîn, wekî tiliyên destekî jî hene? Mixabin tunene û min ne bawer e ku ji îro pêve jî bêne nivîsandin.

Mamê Şakir! Çend sal bêyî te derbas bûn. Her çi qas em li xwe mikûr ne-

yên û li ser te çend rêzikan nenivîsin jî (!) lê dê tu bi deng, awaz û kilamên xwe yê mîraniyê, bi kilamên xwe yê dilan, bi kilamên xwe yê mîrxasî û welatperweriyê her bijî û her bistirî.

Kerem bikin ji bo yad û bîranîna wî, em bi hev re guhê xwe bidin beşek ji kilama wî ya bi navê Nêçîrvano ku heta niha ji hêla gelek dengbêjên me ve hatiye gotin:

*Lo nêçîrvano li vî berî lo li wî berî
Lo seydvano ez bi qurbana li vî berî
Ha li wî berî*

*Min dî tu siwarê bozekî çaçanê
Qefesxezalê dilhineyî
Gava te xwe dayî gaz û pêlanê bilind
lawo*

*Ez texmîn dikim tu karî xezalan digerî
Lo lo nêçîrvano te xwe da gaz û
palên bilind*

Tu li nêçîra karî xezalan digerî


*Ez xezal im
Sî û sê gulî li nava milê min bûne
Fena çîtê çepilê min dirêj e
Çav û birûyên min reş û belek in
Mala te mîrato
Heyran wele li ser serê min ketî
Daw û doza bîst û çar serî
Seydvano lo nêçîrvano*

*Nêçîrvan got
Lê lê Xezalê ez Şemo me
Xwedanê heftsed mîhê zozanê
Heft kihêlên serê têtê me
Zalim dûrî min here
Ez ne aşiqê qîz û bûka me
Ez aşiqê rehma Xwedê me*

Awazxweş Mamê Şakir, awazxweş! Deng li dinê be...!

Şerabistan

Şerabî



Nameyeke vekiri ji Şerabî re

Ey mîrê mîran, padîşahê Şerabistan, me bihîst ku we fermanek rakiriye li hember Erebên reşik, Faris û Turan; lakîm em amada ne wek şêran. Tu berê me bi kîjan alî

ve bikî, emê herin wek Rostemî Zal, wek mêran, em hergav amade ne ku xwe gorî bikin li ser Şerabistan, bila tenê fermanê bigihîne me mîrê kelam, padîşahê padîşahan.

Ey mîrê mîran, fermandarê herî mezin, dildarê Şerabistan. Em jî wek te evîndar in li ser Şerabîstan. Em jî pirr hez dikin ji baxê xwe, ji rez, ji bostan. Bes e me evqas kişand ji destê dijminê di postê berxan. Lakîn nadin em Şerabîstanê bi tevahiya cîhan. Ger ku serbest û azad nebe Şerabîstan, ji me re çi xerabûye cîhan. Me divê şahê xwe Şerabî, war û welatê xwe yê azad Şerabîstan. Bila her tiştê me jê re bibe görî û bi qurban.

Em li benda te ne ey mîrê mîran, padîşahê şerabîstan. Gotinek te ji bo me ferman e evîndarê Şerabîstan. Tenê tu emir ke em bi qurban. Bila vê carê hay ji xwe hebin Ereben reşîk, Faris û Turan. Ew sûtal kî ne ku çav dikin Şerabîstan, wê axa pîroz û gulistan. Çi zû ji bîra wan çû ku ew hatibûn wek mêvan. Bi çi heqî doz dikin Şerabîstan. Bêje em dinyayê bişewîtînin ez bi qurban. Bijî her bijî Şerabîstan. Hemû hebûna me jê re bibe bi qurban! Xwelî li serê dîl û bindestan.

Zû li benda bersîva we me, ey
mîrê mîran.
Tenê tu emir bike, ey padîşahê
Şerabîstan

Îmze: Şerabîstanperestek

*Do êvarê dîsa çûm meyxana
Xecî Silo
Mîratê tîje bû, wek dergeha
şêxê Tilo
Tam min xwe gihand şerbîkê
Şerabê*

*Cardin li kîsê peran pîrsî
bêîman Xecî Silo
Ma mirov evqas jî pulperest
dîbe, wilo!*

*Ax li min qîza mele
Wax li min qîza mele
Çavê mele li riya camiyê
Çavê Şerabî li mala mele.*

*Şerabî me li ber derê camiyê
Qîza mele ez kirime vê riyê
Ji min re çi! limêj,*

zekat û camî

Dîn û har im ez li ser wê zeriyê

Ji mele re nebêjin ku

Şerabî evîndar e

Tu car nebêjin ku li

ser keça te dîn û har e

Jêgerin, bila ew bazda camiyê,

Da ku em berê xwe bidin

mala wê zeriyê

Wê lêvşêrîn, wê dêmgulîn,

wê periyê

Ma min çi ye ji riya camiyê.

Şerabî me qibla min

Şerabîstan

Ev gul, ev sosin,

ev rez û bostan

Bila serê min xera nekin

têjikên guran

Ji min re çi Asya Navîn û

Turan

Bijî, her bijî Şerabîstan

Şerabîstan yara min a

herî ezîz û nazenîn e

Meyger cardin dîl nede ber

daxan, nekewîne

Veneke wê birînê, ew li ber
 dilê min pir şîrîn e
 Helbet wê roja wê were,
 destmala xwe bihejîne
 Serê me bilind ke, kul û
 derdan ji ser dil hilîne
 Meyger ez di text û bextê de,
 zû şerbikê şerabê bîne
 Bes e Şerabî ev şîn, li ser
 Şerabistanê melorîne.
 * * *


Şerabistan welatê şêran e
 Şerabistan evîna dilan e
 Şerabîstan axa pîroz û ezîz e
 Heta hûn bixwazin lezîz e.
 * * *

Hin hene pûlperest in
 Hin hene olperest in
 Hin hene ez perest in

Hin hene nan perest in
 Hin hene şerabperest
 Hin Şerabistan perest in.
 * * *

Jiyan bi hirhopî nayê jiyîn
 Şerabî
 Ne bi şer, ne bi pevçûn û ne jî
 bi xerabî
 Herçiqas tu cîranê Tîrk,
 Ereb û Farisan î
 Dîsa divê tu jîr û zana,
 wek camêra bî
 * * *

Bes e Şerabî, xamî, xişimî û
 nezanî
 Malneketo tu bi tu tişfî nizanî!
 Yê te hebe tunebe kûpê şerabê
 Ez nizamin te ev adet ji
 kuderê anî.



A. Sevinç

Eskerê Boyîk

Bazin

Bavê min û apê Fetî qerewilê lodê gîhê yê Kolxoza gundê me bûn. Êvarê hata sibê li ber loda di-sekinîn, ku gîhê nedizin. Wê şevê bavê min ne li mal bû, ez dewîsê apo ra çûme qerewiltîyê. Navê seyê me Bazin bû. Bazin ji da pey me hat.

Şeveke hîveronê xweş bû. Em li ser gîhê rûniştin. Bazin jî binatara me ket.

- Birazyâ çend salî yî? –Apê Fetî ji min pirsî

- Hîvde.

- Hîvde, wextekî xweş e, dema gul û dila, -apo kenya- dilketya te heye?

Min ji şermê serê xwe berjêr kir, caba wî neda.

- Şevê waye xweş, şevê dilketya ne, birê apo, şerm neke. Apo çima gêncatî xwe nedîtîye? Bahar çiqas xweş e, gêncatî ji biharê jî xweştir e. Navê seyê te çi ye?

- Bazin!

- Bazin, Bazin, -ewî navê sê çend cara wekiland- navê seyê te gilîkî xweş anî bîran min. Ezê wê çîrokê birazyê xwe ra gilîkim, bira şev li me kinbe.

Ezî çaxê tera me, bang-banga min e, li zozanê çîyayê Elegezê berxvan in. Wê êvarê min qasekê zû berxê xwe anî guherê. Vegeryame konê me.

Min cilê xweye nû li xwe kir, ser û çavê xwe rind şûşt, gorê posiknexş kire pê, çarixê hasilkiryê nû bi bençarixa rind lingê xwe va girêda. Wê şevê gerekê rastî dilketya xwe bihatama. Dilketya min jî ji oba cînar bû. Herdu obê jî ji pala çîyê bûn. Navbera wan rîya qasekê ye, newalekê biçûk ortê ye, heva têne xanê.

Cara ewlîn gerekê em rastî hev bîn, hezar tiştî difikirim, hezar fikir û mitale li serê min ra derbaz dibin. Him kêfxweş im, him jî tê bêjî sawekê ji min girtiye... Lê dem hela bey, li ber derê kon, ser kulêv rûniştîme, duhêla qamçiyê xwe vedigirim. Dixwezim Zerîfa bûka apê xwe bivînim. Zerîfe ji wê obê ye, ewê navbera min û wê keçê xweş kirye. Destmala min dayê, destmala wê jî ji min ra anye. Ji seva wê êvarê û rasthatina me ew keçikê ra pev ketye. Dixwazim pîrsekê-duda ji Zerîfê bikim, paşê herim. Hê zû ye, lez nekevim...

Nişkeva dengê Amojna min a Huc obe hilda... Amojna min pîrekeke şêrûd e, neheq e... Roj tine, ku cinara ra şer neke. Obe dest da tete-tete...

- Çi bûye?

Gotin, kûpê rûnê wê dizîne.

Pîrekê obê yê cînar tev derketine, lê top bûne, jêra sond duxun, ew jî:

- Hûn gişk herne malê xwe, ez kola xwe zanim... Ez zef rind zanim diza rûnê min kî ye? Min diz anî kîre mala xwe, daye! Îro birayê wê hatibû malê, kûpê rûn dayê, derbaz kir, bir...

Gilî derheqa Zerîfê da bû. Ew sa-

lek bû. Ew muxdarê salakê bû Zerîfe merva jê cêbê bûbûn, ji hev xeyidîbûn, hevra nediaxivîn. Zerîfe sond dixwe, agir davêje devê xwe, lê dengê amojnê, qujîna wê ew der û best hildane, kes guh nade zerîfa feqîr...

Dizek e, çilek e, gerok e, gilîgerîn e. Lê wekî kurê min mêr bûya, wê jîna usa xweyîkîra? Mala mîn talan kirye! Jina mala nîne, nîne!

Êdî xelqê obê tev zanin, şer hazir e, Erfûtê zilamê Zerîfe şivan e, wê qaseke dinê vegere, wey li halê Zerîfê...

- Kûp tije rûn bû, pûtek rûn têda bû... Dizê! Dizê! Dizê! Putek rûn! Pûtek rûn! Rûndiz! Rûndiz! Gundîno, cînarno navê bûka min Rûndiz e, Pûtê ye, Rûndiz e!

Amojin ha dikeve hundu kon, ha bi çer û nifira derdikeve. Derdikeve dibêje, dibêje, çî tê ser ziman Zerîfa belengaz ra dibêje dikeve kon, lê dilê wê rehet nabe, carkê din bi gef û gur derdikeve...

Zerîfê, feqîrê... Bûye lepekê, qidûm tê da nemaye, sipîçolkî bûye. Pîrekê obêyê sere jî, ku dilê wan bûkên wan ra ne xweş bû jî tenî bûkava digotin.

- Bûkê vê dewrê xwe ne bûk in, şipûk in. Serê dîya wan kur be, xwe keç hîn nekirine?.

Gotina wan kela Amojna Huc gurtir dikirin, dengê wê bilindtir dibû. Min lê nehêrî Erfûtê kurap jî hat, êdî gumana xwe ji Zerîfê birî, ketime rê û min berê xwe da oba cînar. Nizanim çima, çî fikira min ra derbaz bû, min gazî Bazinê seyê me jî kir, wekî wî jî rex xwe xim, bivim.

- Bazin, Bazin! –gazî dikim, lê bazin tune, nayê xanê, kuda çûye, nizanîm-, de tune, tune –fikirim-gurê min buxun?

Tarî ketîbû erdê.

Fîte-fîta min bû, ha direqisîm, ha direvyam, ha min distira, ha xwe-xwera mesqeretî dikir û pêşda dilivyam.

Nişkêva li pey min xişîn hat, tiştêkî hişk, parava lingê min ket. Vegeryam tiştêkî reşî gindil-mindil e, ne ser e, ne çav in, qet nizanîm çî ye? Saw kete li ser min. Ziravê min hat biteqe. Hayran ne se ye, ne pişik e, ne ruvî ye, ne gur e, ne hirç e... Min got, gornepişik e...

De bireve! Çawa dibezim, çawa dibezim, her Xwedê zane! Çîrokê pîrka min têne bîra min: Çawa gornepişikê merî xalifandine, xapandine, xwarine. Hevt tevekê bin erdê da batmiş kirine, oynê negotî anîne serê wan. Mîna lêyê ew çîrok tên, zû-zû li serê min ra derbaz dibin, ez jî şiveriya xilaxare gelî ra mîna bayê gullê dibezim. Lê xişîn hema li pey min e.

Min gôt, mala min şewitî, evê min buxwe. De ruh şîrîn e, usa dibezim, bawerkî hespekî cexur min ra nagîhîje. Ne rê ye, ne çal e, ne gelî ye, tiştêkî li ber xwe navînim, dibezim û dibejim...

Rîya xwe diguhezim li pey min e, dikevime çala li pêy min e, kuda diçim pey min e.

Zinarkî mezin kete pêşya min. Mecal li min hate birîn, min jî tê dernexist min çawa banz da ser zinêr. Banzdana min ra qirçîn li zinêr ket. Min çavê xwe hişk girt

û xwe kire qoçik: "Mala min şewitî, zinar teqya, êdî xilaz bûn tine, gornepişik ez kirme hundûr zinêr... De bira keçik hîvya min be, dayka min bigrî, kerê berxa bê berxvan bimîne..."

Pişt min, li ber zinêr kastîna sê hat. Min çavê xwe vekir, vegeryam bi tirs dora xwe nêhêrî, çî wê li ser zinarê binatara oba me, Bazinê seyê me jî ser-çavê xwe dalêse. Perçê kupê çînî jî li ber zinêr ketine û li bin zeraya hîvê da diçûrisin.

Nabêjî dizê kûpê Amojna Huc Bazin e. Serê xwe kirye kûp û êdî serê wî jê derneketye... Heywanî ketye pey min ku ji kûp xilazkim.

Nû bîna min hate ber min, hema li ser zinêr cîyê xwe da rûniştim... Bazin jî li ber zinêr ket...

Şeveke hîveron bû... Qasek şûnda min lê nêhêrî, du qeratû ji obê derketin berbi min hatin. Nêzîk bûn, eva Erfût û Zerîfe ne. Zerîfe digrî, Erfût jî jêra dide çêra, dide ber defa, niqurçka, berbi oba mala bavê wê dibê...

- Hûnê kuda herin?

Erfût, lê: "Evê dibim mala bavê, jîna wa min ne lazim e."

- Çima?

- Lê wa, wa...

- Erfût, hela Bazin û perçê kûpe li ber zinêr binhêre.

Erfût parçêkî kup hilda, rûnê belabûyî, bazin nêhêrî, her tişt fêm kir...

Êdî dereng bû.. Ez jî rasthatinê derengî ketibûm.

Em tev vegeryan obê...

Sala 1983

Destanê Zend

Edîp Polat

Dilê Qralê Îranê Ferîdûn bi mirina her sê kurên xwe gelekî şewutî bû. Lewma di nava êş û elem, derd û keseran de, demek bi şûn de wî jî jiyan ji dest da. Piştî wî, Minûşîrê kurê Manû bû Şahê Îranê.

Minûşîrê Manû li ser cenazê Ferîdûn taca padîşahiyê da serê xwe û kincên wî yên bi xwîn li xwe kir. Gora wî, nivî ji kevirê lacîwerd û nivê din jî ji zêrê sor da çêkirin. Giregir û porspiyên Îranê gava li ser qebra Ferîdûn civiyan, Minûşîr wuha axîfî:

7

Li taca zêrîn ya serê min û li textê bin min yê ji diranên fîl nanihêrin, bona min ne girîng in ev; ez gurzê destê xwe bikartînim û şûrê xwe qet naxim kewdan. Ka bêjin, di vî welatî de yê ku ala Kawayê Hesinkêr hildide kî ye? Ji bilî min kesek heye? Na. Mirovên ku zulm û tadeyiyê li feqîr û fuqaran, li xulam û qewraşan bikin û bi malê dunê fexr û tox bibin, li ber çavê min kafir in û ji Ehrîmen jî xerabtir in. Kesên wuha, bila bizanibin ku hetanî ez li darê dunê bim, ez dê şûrê xwe ji serê wan re tûj bikim!

Guhdaran heq dan Minûşîr: Padîşahê delal başiya me dixwaze. Bav û bapîrên wî ev tac û text, bona ew urf û toreyan bincîh bîne jê re hiştine. Bila hetanî qiya-metê lê helal be!

Serpêhlewane Îranê berî wê gavê Nerîman bû, lê belê şerekî mezin li çiyayê Sîpendê qewumî bû û ew li wur hatibû kuştin. Kurê wî Sam jî li civatê, li cîhê şînê amade bû û rabû piya got:

Ya padîşahê xwey edalet! Hukumdarên berî te, bona ez raçaviya te bikim, şîret û wesyetan li min kirin. Heq û dadî li te, bincîhanîna wan jî li min! Hêviya min ev e, wê Xwedayê şev û rojan temenkî dirêj bide te û her tişt li gor dilê te bike! Bextê te vekirî be! Bila dewran erda bin piyê te û textê firûze jî her dem cîhê te be! Bi wî şûrê xwe yê Hindê rûyê dunê ji xeraban paqij bike, frîqet be, ez bi te re me! Yê ku te ji neyaran biparêze ez im. Ji bav û kalkan ve em pêhlewana in; xelkê heta îroj xwe avêtiye tor û bextê me! Gurşasp û Nerîman jî fermandar û şûrkêş bûn.

Pişti axaftinan, Minûşîr gelek diyariyên giranbuha pêşkêşî Sam kir û ji herêma başûrê rojhilat, hetanî bigere qeraxa çemê Îndûsê (Zabilistanê) xist bin hîmayeta wî.

* * *

Zarokên kurî ji Sam re çenedibûn. Lewma, kul û keder û hesreta dilê wî, çêbûna kurekî bû. Wî nedixwest ji dunê warreş here. Di nava cariyeyên wî de jinek porzêrîn, rû ji pelên gulê hebû ku bêhna misk û emberê hertim jê dihat. Di nav jinên xwe de Sam, pirtirîn ji wê hez dikir û zarokek kurî jê dixwest.

9

Samê Nerîman, gava ji ser mezele Ferîdûn ji civata Minûşîr zîvirî malê, mizgîn dan wî, gotin ew jina

te ya porzêrîn bihemle ye. Roj û hefte, meh û demsal buhurîn, wext derbas bû, hemla wê giran bû, neh meh û deh rojên jînikê xelas bû. Canê wê êşiya, hemlê zor dayê, sekin û tebat nehatê, rabûn gazî hekîm û pisporên welidandinê kirin, pîrik û dadiyan li ser civandin. Di nava hêwurze û qare warê de, di bin bêhna xwînê de lawek jê re çêbû. Lê ne zarok bû, dabetulerd bû; weke sakê gamêşê gir bû. Rûyê wî mîna rojê şewq dida. Kurekî çavşîn û porspî! Tewer birû û bijangên xwe jî çîl spî bûn. Ecêb û sosretek wuha giran kesekî nedîtibû. Pîrek û hekîm jê tirsîyan. Kesekî taqet û cesaret nekir ku here vê yekê ji bavê wî re bêje, mizgîniya çêbûna zarok bidê. Hetanî hefteyekê jê veşartin, jinên Sam bi şev û roj li ber serê wî giriyan, li çokên xwe xistin. Bav lihevhatî û dê jî xweşik bû, lê gelo zarok çima wuha bû? Mîna têjika cenawurekî bû. Gewde mezin, porpembo! Hemî mûyên canê wî mîna hiriya pez bû. Sam jî miraq dikir, dipirsî da wê kengê jînik têkeve nav ciya. Dapîrkek hebû di qesrê de, gelekî mêrane bû, nema xwe girt, çû cem Sam û meselê jê re vekir:

Rojbixêr ya pêhlewane cîhanê! Xwedayê şev û rojan xwesteka dilê te bincîh anî, mizgîniya min li te, zarokek kurî ji te re çêbû, tu êdî bûyî bav! Wê jina te ya rûheyv zarokek pîrûpak ji te re anî dunê. Lawekî bi dest û pê ye, mîna sakê gamêşê gir e, awurên wî tûj in duşube têjika şêr. Canê wî mîna zîv dibiriqe û rûyê wî weke rojê xweşik e. Bedena wî bêqusûr e, lê belê Xwedê nîşa-

nek daye wî: Hemî mûyên canê wî
spî ne! Ya mêrxasê bi nav û deng! Bi
qismet û taliha xwe razî bibe!

*Sam lezand,
Xwe bi alî haremê gihand,
Li kurê xwe yê biçûk meyzand!
Sosretek wuha nedîtibû,
Ecêbek wuha nebihîstibû!
Nihêrî li wî babaegîtî,
Nihêrî li pora wî ya spî!*

Ponijî û kûr fikirî, careke din li
kurê xwe nihêrî; ji xeynî rûyê sor,
her deverên wî di rengê diranê fil de
bû. Li xwe nihêrî, dafên spî ketibûn
porên wî jî. Di dilê xwe de vê bûye-
rê wuha nîrxand: Ez ji riya heq der-
ketime, ji riya eql dûr bûme. Xwedê
jî min ceza kir û lewma ecêbek wu-
ha nîşanî min da!

Çok da erdê, gilî û gazindên xwe
li Xwedê kir:

Xwedayê şev û rojan! Tu tenê ji
qusûr û çewtîyan dûr î. Heke ez ke-
tibim ser riya Ehrîmen, ez efû ji te
dixwazim. Poşmaniya min qebûl bi-
ke! Bi vî zarokê porspî, ruhê min ta-
rî dibe û ez fedî dikim. Xwîna min
dikele, dipijiqe. Gava heval û hogir,
kesên zîrek û rêvebir werin mala
min û vê ecêbiyê bi çavê serê xwe
bibînin, ez dê çawa bersiva wan bi-
dim? Ev ne zarok e, lê dêw e! Ew dê
gel tinazê xwe bi min bike. Heke li
rûyê min nebêjin jî, wê piştî min di
bin simbêlen da bikenin û bêjin
Xwedê zane ku jina wî li kîja mêr-
gê çeriyaye! Ez di bin dewsandina
vê şermê de nikarim bimînim. Tevî
bextê xwe yê reş, divê ez Zabilê jî
û Îranê jî terk bikim. Baweriya min

ev e ku Şeytanên Medyayê bona ru-
meta min di nav gel de bînpê bikin
ev zarok ji min re şandine.

Rûyê wî sor bû û ket heyecanê.
Bêrawestî biryar da: Zarok ji holê
rakin, bibin dûrî bajêr, li çolekê ba-
vêjin. Bila teyr û turûd û rawur wî
bixun da ez jê bifilitim!

Xizmetkar û dergevan rabûn, za-
rok avêtin ser piştê hespê, çiya û da-
ristan, çol û çolistan çûn. Wî birin
newala şêran ku di bin quntara çiya-
yê Elbûrzê de bû. Elbûrz çiyayekî
asê bû, pozê wî digihîşt rojê, dûrî
gund û bajaran bû. Teyra Sîmir li ser
serê wî hêlîn çêkiribû.

Zarokê ku hêja qencî û xerabiyê,
berf û şekir, agir û gizêr ji hev nas
nedikir, bêdê û bêbav wusa sêwî li
çolê mabû. Li wê newalê şêr hatin
dora wî, di nav wan de dêleşêrek jî
hebû ku hêja nûh teliqî bû. Gava şê-
ran êrîş kirin ku pitik bixwun, şêra
mê nehişt, li ber sekinî û xwe jê re
kir talde. Zarok jî ew gav dest avêt
guhane wê, dêleşêr deng nekir û ew
lê mijiya, bi vî awayî gocî bû. Piştî
gocîbûnê, du şêrên din hatin û ziman
bi dora lêvê xistin. Lê belê kurê Sam
her destekî xwe xist gewriya şêrekî
û her duyan jî xeniqand. Dewr û ze-
man derbas bûn; şev hatin bi ser ro-
jê de, dunya guherî, çile gihîşt bu-
harê, buhar dest avêt ser milê havî-
nê, demsal ji hev xeyidîn. Gur û ra-
wur, baz û eylo li rex wî çûn û hatin
lê belê rehm ket dilê wan, xwarin li
xwe û wî parê kirin. Geh birçî ma,
geh tî. Carna li pêçiya xwe mijiya.
Giriya û haş bû, dîsa giriya û giriya
hetanî qirika wî zuwa bû.

Teyra Sîmir ya çiyayê Elbûrzê,

gava çêliyên wê birçî dibûn ji hêlî-
nê pêşî bilind difiriya, paşê ji nav
ewran xwe mîna şûrekî tûj berra
newalan dida, carna bi nukulan û
carna jî bi pencên xwe xwarin ji
wan re hiltanî.

11

Ew roj jî xwe dîsa daqûlî berjêr
kir, lê ji nişka ve nalîn û zarîna zaro-
kekî berşîr bihîst. Warîn û qarînek
wulo jê diçû ku, erd û ezman, çiya û
zozan li ber dengê wî dihejiya. Sîmir
dît ku dergûşa zarokê reben kevir e û
pîrika wî ax e, ji birçîna li axê û ti-
liyên xwe dimije. Ne canê wî kinc
dinase û ne jî lêvên wî şîrê dayîkê.
Erdek gurrî û ezmanekî bêsitûn di-
be mala wî. Roj, bejne an du bejn
bilind bûbû, tîrêjên wê yên sincirî
weke taya genimê havîne sor û zer
bûbûn û êdî seridî bûn. Darekî an
rawurekî jî li ber serê wî tunebû ku
jê re siyê çêbike, ew ji tava tûj bi-
parêze. Teyra Sîmir ku xwe û çêli-
yan bi goşt xwedî dikir, nexwest za-
rok bixwe. Ji nava ewrên belek, mî-
na teyra qaqlîbaz ku êrîşî masiyê
deryayê dike wulo xwe daqûlî erdê
kir, bi pencên xwe yên zexm û tûj
rahişt zarok û cardin firiya jor. Heta-
nî nava ewran bilind bû û ji çav
wunda bû. Ew bir li ser pozê çiyayê
Elbûrzê, li navenda hêlîna xwe danî.
Mêvan bi çêliyên xwe da nasîn. Çê-
liyan jî qarîn û nalîna zarok bihîstin,
jê nedexisîn û mîna birayekî xwe ew
qebûl kirin. Hingiya giriyabû, êdî
xwîn ji çavê zarok dihat; make û tê-
jik li vî halê wî nihêrîn, dilê wan şe-
wutî û jê hez kirin. Di demek kurt de
hezkirina ku di dilê wan de wejiya,
tişteki pir ecêb bû. Hemî bi heyrana

rûyê wî yê zêrîn bûbûn. Zarok di
dewsa şîr de li xwînê dimijiya. Lew-
ra Sîmir, nêçîra xwe ya xurt ji wî re
cihê dikir.

Dem û dewran derbas bûn, Mal-
bata Sam ew kur ji bîr kir. Riya ke-
sekî jî bi çiyayê Elbûrzê neket û bi
hebûna wî nehesiyan. Zarok roj bi
roj mezin bû; bejna wî mîna spînda-
rê hilkişiya, sînga wî fireh bû û we-
rimî. Riya gelek karwanan di wî çî-
yayî re derbas dibû. Xwediyê karwa-
nan xortekî bejndirêj di hêlîna Sî-
mir de dibînin.

Şevêk ji şevên payîzê dirêj û tarî,
gava Sam di nava raman û xeyalên
kûr de xays bû û nivîya, xewnekê
dît: Xortekî çeleng ku ji Hindê ber bi
alî bakur de diçû, li ser piştê hespe-
kî Erebi bû, berê dizgîna xwe zîvi-
rand û li bayê bezê xwe gihand cem
wî. Jê re got mizgîniya min li te, ku-
rê te hêja sax e û li ser pozê çiyayê
Elbûrz di hêlîna Teyra Sîmir de di-
jî.

Samê Nerîman gava ji xew şiyar
bû tirsîya û xwêdan da. Zuxrikê
xwêdanê li ser eniya wî cemidîn.
Lez kir, mûbîd û zîrekan, porspî û
pîrekan li hev civand, xewna xwe ji
wan re got û pirsî: Hewqas sal û ze-
man, dem û dewran derbas bûn, ge-
lo dibe ku zarokek berşîr li çolê ka-
ribe bi tena serê xwe li heyatê bimî-
ne?

Zana û şîretbêjan bersiv dan: Şêr
û pilingên li ser taht û zinaran, masî
û gamasiyên li bin avan, teyr û turû-
dên li ser dar û devîyan, ev hemî çawa
li têjikên xwe dinêrin û xwedî di-
kin? Ne heyfa te! Çawa yekî weke te
pêhlewana be û fermandarê welatekî

be, lê kurê xwe bavêje newala şêran! Ne eyb û ne fedî ye? Sedemî pora wî ya spî, te ew pitikê rebenê belengaz û masûm ji dergah û dîwanên xwe avêt. Rabe, lez bike û derê çolê, bi şev û roj nesekine û lê bigere. Suwaran bişîne, bila ser û binê çiyayê Elbûrzê lihevxiñin.

13

Axaftina wan li Sam tesîr kir. Dotira rojê, tevî leheng u suwaran, mêrxas û xizmetkaran kete rê, berê xwe da çiyayê Elbûrzê. Bi keserkûr û dilsojî, bi êşa wundabûna ewladê xwe, bi hêviyek mezin geriya. Vir de çû, wê de nihêrt. Geh bazda, geh lezand, betilî. Rûnişt, rabû û ponijî. Çiqas geriya ewqas hêza hezkirina dilê wî zêde bû. Tarî daket erdê, lê bû şev, xwe li ser axê dirêj kir û niyiya. Çawa çavê wî çûn ser hev, li ser serê çiyayekî Hindistanê aleke çikandî dît. Bayekî honik û sivik li wê alê dixist û ew pêl dida. Li pêşiya alê zarokekî rûşêrîn hebû û li dû wî jî girseyek leşker rêz bûbûn. Li alî çepê mûbîdek û li alî rastê jî kalemêrekî jîr hebû. Extiyarê alî rastê hat nêzik li Sam kir û bi ser de bariya: Hey bêînsafê kurê bêînsafa! Tu qet ji Xwedê natirî? Piştî ku te kurê xwe hewcedarê teyrekî kir, ka mêraniya te li ku derê ma? Ger tu pora spî jê re dikî sûc û qebebet, ka pêşî li pora xwe ya ku roj bi roj mîna dara biyê spî dibe binêre! Sal bi sal bedena te diguhure, lê tu nabîni! Kurê te parçê canê te bû, te ew jêkir û avêt, lê belê Teyra Sîmir ku wa ye hêlîna wê li ser pozê Elbûrzê ye, lê xwedî derket. Ma qey ji şifqeta bavîtiyê piçek jî para te neketiye? Di xe-

wa şêrîn de, mîna gurê pê di dafikê de qerîn jê çû. Bi dengê xwe re şiyar bû. Çi xewnek kambax! got ji xwe re. Bobelatên mezin di pêşerojê de werin serê min. Tirsiya, bang li hemî zîrekan û remldaran kir. Ket heyecanê, ji qumandaran re got: Şiyar bin! Dû re li hespê xwe suwar bû û çû ew newala ku berê kurê xwe avêtibûyê, cîhê şêran. Gava gihîşt wê derê, nihêrî ku çi bibîne! Pepûk, reben! Serê çiyê bilind e û hey bilind e, digihîje heta nava ewran. Roj û stêrkan dixwaze hilweşîne! Nihêrî ku wa ye hêlînek gelek mezin li ser pozê çiyê ye. Hêlînek wilo ku, darên wê ji kêranên dara ebenûzê û ginûyê hatiye çêkirin. Sam, li wan zinarên biheybet û li wê hêlîna ku mîna cîhê benderêkî fireh nihêrî. Baş bal û dêna xwe da Teyra Sîmir. Ev hêlîn bi destê mirovan nehatiye çêkirin! Ne ji herriyê ye ne jî ji kevir! Çavê wî li jor û sitûkura wî bi piştê wî ve zeliqandî wulo demekî li hêlînê hûr bû. Dît ku xortek li rex hêlînê rûniştiye. Baş lê nihêrî; pora wî ji dûr ve spî dikir.

*Dilê wî kizirî û xwîna wî keliya,
Di cîh de rûnişt û giriya,
Axê bi xwe de kir, pora xwe kişand,
Bi ser ehmeqiya xwe ve kûr naliya*

*Çav sor û ser bixwîn rabû piya,
Li rêçekî an şiverêyekî geriya,
Vir de çû, wê de hat, doş bû
Kir û nekir rê nedayê ew çiya*

*Qet rê nedît ku ew hilkişê jor
Li vî alî, geh li wî alî dor bi dor
Keysa rapeliqandinê hîç nedît*

Rû çilmisî, giriya, kir ore or.

Dîsa rûnişt û çavê xwe girt, berê xwe da Xwedê: Ya Xwedayê ji vê rojê û ji vî ezmanê bêsitûn mezintir! Ez serê xwe li ber te ditewênim; min bibexşîne! Va ye ez li vê çolê! Tu çi ceza didî min tu zanî! Ger ev kur ji haveynê piştî min be, ne ji tuxmê Ehrîmen be, alîkariya min bike da ez hilkişim jor.

Ew gav, Sîmir li jêr nihêrî; di bin gelî de çend zilaman dît, fam kir ku ji bona xortê nav hêlînê hatine. Li mêvanê ku bi salan e di hêlînê de xwedî fikir zîvirî û wuha got:

*Di hêlînê de te ewçend zehmetî kişand,
Ez pîrika te me, min te bi xwînê*

mijand,

*Bav te ceza kir, te ji nav malê avêt,
Lewma bila navê te bibe*

DESTANÊ ZEND.

*Tu dê êdî bifilitî ji çiya, ji vê newalê,
Gava vejeriyayî û ku tu çûyî malê,
Şeref û rûmet li benda te ye êdî,
Bila kes nizanibe bi vê rewş û hewalê.*

Çavê kurê Sam bi van gotinan tijî bû; bû ewrê buharê yê dagirtî. Xwîzî di qirika wî de civiya, dilê wî hilpekiya. Hetanî wê rojê rûyê tukesî nedîtibû, lê belê Sîmir ew hîni ziman kiribû, wuha li Teyr vejerand:

*Hêlîn bo min bû miqamê pederşahiye,
Te min hewand û xelas kir li ser çiyê,
Li jor Xwedê, li jêr tu mezinî ji min re;
Baskên te taca serê min a ronahiye*

15

Sîmir got, gava tu tac û text, zêr

û zîv, şûr û xencera pêhlewanîyê bi-destxîni, min jî û vê hêlînê jî tu dê jibîr bikî. Ez ji te ecz nebûm. Riya pederşahiye wê li te vebe, lewma ez te dişînim. Ger tu li vir bimînî ji min re baş e, ger tu biçî ji te re baş e! Va ye, perriyekî baskê min bi xwe re bibe.

Di jiyana te ya pêserojê de gava tu ketî tengasiyê, perrê baskê min bavêje êgir. Ji bîr meke! Tu dê ew gav hêz û qudreta min bibînî! Ez dê mîna ewrakî reş û tarî dakevim erdê, xwesteka te bincîh bînim. Hezkirina te di dilê min de ye û tu jî min ji dilê xwe dernexe!

Piştî Teyr, Destanê Zend li ser baskê xwe suwar kir û ew hilanî, ber bi nava ewran ve bilind bû, çû û hey çû Hetanî ji çav wunda bû. Sam jî li jêr bû û lê dinihêrî, got Eywax kurê min cardin wunda bû! Qey ew bû melayîket û firiya? Di demek kurt de, Sîmir mîna teyrê ku êrîşî berate bike bi hêz xwe berra xwarê da û Destan anî, li ber Sam danî. Bav li kur nihêrî; pora wî gelekî dirêj bûbû, gijika wî ketibû nav hev. Bejna wî mîna filekî gir bû. Digel pora wî ya qirêjî, rûyê wî pak bû û mîna gula buharê geş. Dîsa qêrîn û orîn bi Sam ket û giriya. Paşê bejna xwe li ber Teyr tewand û wuha got: Xwezaya pîroz ev hêz û sêhr bona tu alîkariya kesên bêçare bikî daye te. Kesên ku xerabiyê bi te bikin bila malwêran bibin!

Teyr firiya û ji ber çav wunda bû. Sam qenc dêna xwe da bejn û bal, şikl û şemal, çav û birûyên kurê xwe. Seranpê hûr hûr lê nihêrî. Dît ku;

*Sînga wî sînga şêran,
Masûlk jî yên pilingan,
Rûyê wî rûyê rojê,
Awur yê cengaweran.*

Dest û lepên wî êdî qevdika şûr digirt. Digel por, birû û bijang spî bûn, lêvên wî mercan bûn. Mûyên wî li ber tîrêjên tavê mîna zêr dibiriqîn. Sam, ewladê xwe yê xweşik bihesret himêz kir, Lawê min yê delal! got, dilê xwe ji min neşkîne, rojên xerab û tarî li paş man, ji bîr bike wê tengasiyê. Ez bavê te me. Êdî ez tucarî xerabiyê bi te nakim. Hemî xwestekên te li ser serê min û li ser çavê min!

Sam ew anî mal, pantorekî reş û ji hevrîşim, îşlikek ku bi zêr nexşkirî bû lê kir, kemberek fireh li piştê girêda, qame da destê wî û got Şabaş ji te re, mêrxasê mala bavê mino hezar car şabaş! Ez navê ZAL li te dikim. Teyr te mezin kir, lewma tu xerabiyê nizanî. Ango dilê te jî mîna kincê te û pora te jî zêr e. Tu Zalê Zêrîn î!

Kêf û coşek bi hêwurze ket nava mala wan. Sam ferman da, defa şahiyê lêxist, leşker û pêhewan li hev civand. Eşqek di dilê wî de şilan dabû; mîna ku Zal hêja nuh hatibe dunê, pîrozbahî li dar xist. Fîlan da pêşiya êlê. Dengê def û elbanan, zengilên zêrîn û sazbandên Hindê li her derî belav bûn. Hêlanên suwariyan di bin toz û dûxana ku ji ber simê hespê wan bilind dibû de, digihîşt erşê ezîm.

Nûçe gihîşt Padîşahê Mezin, Şehîنشahê Îranê Minûşîr. Gotin Samê Nerîman bi pîrozbahiyek şên kurê xwe ji çiyê aniye mal. Du lawê Mi-

nûşîr hebûn; Newzer û Zerhesp. Şah, bang li Newzer kir, got: Zû bike bilezîne, barê karwanekî ji zîv û zêr dagre, digel sêniyên zîvîn kole û qewraşan, zumrût û firûzeyan, mihînen Erebi û tîr û kevanan jî jê re bibe û xwe bigihîne Qela Zabilê. Sam pîroz bike û bêje bila nesekinin, ew û kurê xwe werin. Ez dixwazim kurê wî yê ku di hêlîna Teyr de mezin bûye bibînim. Bila were ji min re qala xwe û Sîmir bike, ka hela çi teqeq dîtine, çi bi sera de hatiye.

17

Gava Newzer xwe gihand ber deriyê Qela Zabilê, Sam bi leq de çû û xêrhatin tê da, ew himêz kir. Saxî û selametiya Şah Sam dilşa kir, daqûlî erdê bû û axê maç kir. Di demek kurt de Zal xwe amade kir, kincên pêlwanan li xwe kir, hespek peyde kir. Ew, bavê xwe û çend pêhewan ketin rê, berê xwe dan Îranê bo serlêdana Minûşîr. Dotira rojê qeflê Zabiliyan gihîşt paytextê. Şah bona hurmet û rûmetê bide wan, artêş amade kir, ala Îranê li pêş çikand û derket. Sam gava çav bi ala bavê Newzer ket, ji hespa xwe daket û peyatî meşiya. Piştî ku hev û din maç kirin, Minûşîr, cardin Sam li hespê suwar kir. Dema gihîştin Qesra Mezin, Şah hilkişiya ser textê pederşahiye û kumê ku ji bav û kalan de mabû, kişand serê xwe. Li ser milê wî yê çepê pêhewanê bi nav û deng Karen hebû, Sam jî çû li alî rastê rûnişt. Zal, bi kumekî zêrîn û qatek cilê hevrîşimî xemilandî bû; wadê Şah ew dît şaş ma û di cîh de şeqizî. Berê xwe li alî rastê zivîrand û ji Sam re got:

Xortekî mîna vî hêja nehatiye

ser rûyê erdê. Bi vê bejn û bala xwe, bi vî rûyê delalî ruhê mirovan muferrîh dike. Şîreta min ev e, tucar wî neêşîne û dilê wî nehêle. Ne ji wî be, ûrt ûcaxê mala bavê te yê Nerîman dê ji holê rabe. Baş lê xwedîtî bike, wî bişîne nêçîrê, ûsil û tevdira şer û cengê jê re bêje, wî hînî bikaranîna hacetên herbê bike. Binêr:

*Lepên wî yên şêran e,
Awur yên mêran e,
Pozê wî yê beran e,
Ew bi fikr û raman e!*

Wî bihewişîne, bila bizanibe di nava civakê de bijî. Rebeno heta niha ji xeynî hêlîna Sîmir, çiya û zinar, dal û devî tişteke nedîtiye. Adet û toreyên civat û caxiyan nizane.

Minûşîr rûyê xwe ber bi alî Zalê Zêrîn ve zîvirand: Ka vêcarê dora axaftinê ya te! Ka bêje xwarzê, te çi dît û çi nedît?

Destan qala çiyayê Elbûrzê û hêlîna Teyra Sîmir kir. Li wê der çî xwaribû û vexwaribû, roj û meh, demsal û sal çawa derbas kiribû ji serî heta binî ji civatê re got. Paşê bavê wî dora xeberdanê girt:

*Gava ez gihîştim çiyayê Elbûrzê
wê newalê
Min dît hêlînek fireh, ji ebenûs
wa li palê
Lawê min yê porspî ku bi salan e
nayê malê
Tê de rûniştiye li ber wê germê li ber
wê tavê.*

*Min zinarek dît serê wî digihîşt ewran
Parçeyek kevir sekinîbû li jor,
li ezman*

*Çiya asê bû, bi tirs û xof û xeteran
Poztûj û xelesemt, rê tune bû li wa deran.*

Lawê min, ronîya çavê min bêtirs di nava hêlînê de rûniştibû. Jixwe ne xema wî bû jî! Bi têtîkên Sîmir re weke xuşk û bira dijiya. Gava mirov li wê dîmenê dinihêrî, bêhna hezkinê diket pozê mirov. Niha jî mûyê canê min radibin. Ez li çar aliyên çiyê geriyam, lê min tu rê nedît bo hilkişim. Bêçare mam, keribîm bi ser halê xwe de û giriyam. Şahê min! Tu jî zanî heta niha kur ji min re çê nebûne, lewma hesreta wî mîna ava deryayê di dilê min de dipijiqî. Ha ku min nedît, ez li ser çok ketim û min hewîş kir:

*Ya Xwedâyê dilovan!
Ew parçeyek ji kezeba min e,
19*

*Duaya min qebûlke
Ew ji min re bişîne,
Wî xêr ji xwe nedît,
Bêexlaq û hezkirin e,
Bi postê heywên mezin bû,
Li xwe nekir hevrîşime.*

*Şîr tam nekir, li pêçiya xwe mijiya,
Mijûl nebû, têr neleyîst û negeriya,
Bi xwîne gocî bû, giriya û hey giriya*

Kêliya min duayên xwe xelas kir, Sîmir ji hêlîne firiya, ez ew gav pir tirsiyam. Gelo kurê min çû jor û bû melayket? Lê belê di demek kurt de Teyr bi şûn de hat, li ser serê min doş bû û ji nişka ve xwe berra erdê da, xortê ku li ser baskên wê bû anî, li ber min danî. Bêhna buharê, misk û emberê ji per û baskên wê dihat. Ç-

vên min jî bi lêvên min re zuwa bû-
bûn; êdî rondik jê çikiyabûn. Devê
min ji tîna miçiqî bûbû. Teyra Sîmir
hiş û eql ji serê min biribû. Gava wê
kurê min anî û li rex min danî, min
got qey ew melaykete û ez jê re hey-
ran mam û min sucde kir. Paşê tavi-
lê firiya û mîna pîrebokan ji ber çav
wunda bû.

Piştî Sam gotina xwe xelas kir,
Minûşîr bang li remildar û falbêjên
stêrkan kir, got werin! Zû bicivin û
li pêşeroja vî xortî, vî egîtî binêrin!

Remildar û falbêjan yeko yeko li
remla Zal nihêrin. Dîtinên xwe pêş-
niyazî Şah kirin û nixxandin:

*Ya xwediyê tac û textê zêr!
Me qenc nihêrî li fala Zalê Zêr,
Gava mezin bibe ew bi xêr;
Wê bibe pêhlewaneke bikêr!*

Ji Minûşîr re mizgîn bû ev.
Lewra pêdiviya wî hebû bi şervane-
kî baş. Hespêkî Erebi ku zînê wî ji
zêr bû ji Zal re anî. Paşê şûrekî Hin-
dê ji gencîneyê derxistin, kalanê wî
ji zêr bû. Malên gazê yên hevrişimî
û xalîçe, aqût û zîv, cariyeyên Rûmî
ku di nava kincên bi zêr nexşkirî de
xemilandî bûn jê re diyarî kir. Dor
hat ser hacetên herbê; tîr û kevan,
zerx û gurz, mertal û rîman li ber wî
danîn. Textekî fîrûze, tac û kembera
zêrîn, mohreke ji aqût deranîn, li ser
barê devê bincîh kirin. Dû re, Minû-
şîr bona biryara herî nixxîn û girîng
eşkere kir:

Ez ji îroj pê de, bajarê Kabîlê û
Denberê, welatê Hindê û hetanî big-
re Derya Sindê, ji Derya Çînê ha-
tenî Zabilistanê û bajarê Bûstê di-

xim bin hîmaye û rêveberiya Samê
Nerîman.

Dema vegeerê hat, hespê Sam
anîn. Bavê Zal berî ku suwar be û bi
rê keve, bo Minûşîr çend gotin anî
zimên:

Ya padîşahê birêz û adil! Di nava
kesên xwey tac û text de, mirovên
mîna te hene gelo? Hemî gencîneyên
ser rûyê erdê li pêş çavê te ne tiştek
in! Tu merd î û camêr î! Hêviya min
ji Xwedê heye ku ev tac û text bi ser-
medî bimîne! Piştî ku Sam text jî
maç kir, gurmîna dengê defên şahiyê
bilind bû. Êla Zabilîyan derket rê, be-
rê xwe dan welatê xwe.

21

Nêzikî bajarê Zabilê gundî û ba-
jarî, pîr û ciwan, qîz û xort leq wan
de hatin. Lîlandin hey lîlandin, pêh-
lewanê cîhanê di gul û sosinan de
xemilandin. Sîstan, mîna bihuştê di
misk û emberê de kemilandin. Li her
cîhî zêr û zîv reşandin. Gotin: Şabaş
ji Xwedayê şev û rojan re! Tuxmê
Nerîman ji holê ranebû, malbata
pêhlewana dîsa zîl da! Sam warreş
neçû, hemd ji Xwedê re çira Keya-
nîyan wê êdî vêketî bimîne li dunê!
Zaro û zêç, jin û mêr, pîr û pîrek di
nav şênîyeke boş de reqîsîn, Sîstanê
seranser kirin mala dawetê.

Şox û şeng qediya, herkes vege-
riya mala xwe. Hefteyek bi şûn de,
Sam meclisa jîrik û rêvebiran li hev
civand, gazî zana û porspiyan kir û ji
wan re axift:

Dema min Zal bir cem Minûşîr,
wî bi dizî ferman da bona ez artêşê
bicivînim û amade bikim. We hay

jê heye? Li welatê Medya, şeytanên hukumdarê Mazenderanê yên ku serê wan dişube serê sîsarikan û dêw û pêhlewanên Gurksaranê welat şewutandin, bajar û gundan wêran kirin, erz û eyalên xelkê li ber dest û piyan birin. Ez dê herim welatê Medya. Hun li Zal miqat bin. Ew parçeyek ji canê min e û ji xwîna min e! Emanetî Xwedê, emanetî we ye. Ew dê perwerde ji we bibîne. Hûn dê pêşiya wî ronî bikin. Şîretan lê bikin û bila riya meznahiyê bielime. Dû re destekî xwe danî ser milê Destan; Kurê min! Ez welat teslîmî te dikim. Comerd be û qet miraqa min neke, bila dilê te rihet be. Tucar ji bir meke ku êdî Zabilistan di bin femandariya te de ye. Mal û xana te ji ya herkesî xweştirin e. Bila heval û hogirên te jî bi bextewariya te şa bibin. Ev e, hemî miftên gencîneyan li ber te! Di cengê de jêhatî be, di şahiyê de dilevîn! Remildar dibêjin tu dê bibî xwey tac û text. Em mecbûr in ji çerxa felekê re sitûyê xwe bitewînin. Suwarî û şervanan, jîrik û mûbîdan li dor xwe bicivîne. Guhê xwe bide wan.

*Tu leheng î, mêr î,
Ji maleke têr î,
Mîna şêrê nêr î,
Ji axa zêr î.*

Lawo! Merd be, diyariyan bide kesên dora xwe. Dubendiyê nexer nava qewmê xwe. Bizanibe ku,


neyarekî zîrek, ji dostekî ehmeq çêtir e.

Zalê Zêrîn bersiva bavê xwe da:

Lo lo bavo! Ez im ku di hêlîna Teyra Sîmir de mezin bûme, dê çawa bêyî te karibim bijîm? Gelo ji bilî min kesek heye ku ji diya xwe sûcdar çêbûye? Ez çiqas feryad û fîxan bikim, dîsa qîm nake. Te çawa di zarotiyê de min tenê hişt, niha jî dîsa tu min tenê dihêlî û diçî. Wextakî ez bi teyr û turûdan re mam ji te dîr. Niha jî fermana Şahê Îranê te ji min cihê dike. Ez çawa bikim? Li eniya min wuha nivîsiye; ji gulê tenê sitirî para min dikeve!

Gava gilî û gazind, şîret û nesîhet xelas bûn, def û zengilan dîsa lêdan; gumîñ û şingîn li erd û ezman belav bûn. Rûyê axê guherî rengê hesin, ewr jî bûn rengê ebe-nûzê. Ji dehlîz û bircên Qela Zabilê dengê zengilan û defdefkên Hindê hat. Sam û artêşa xwe, di bin van dangan de berî ku derkevin rê, bav û kur hev û din helal kirin. Çavê Zal tijî hêstirên xwîni bû. Di nava fikar û xeteran de hat malê. Mîna ku bavê wî gotibû; bi dilekî aram çû li ser text rûnişt. Textê ji diranên fil xweş lê hat û taca biriqokî li sera rûnişt. Bazin, gerdenî û kembera zêrîn li xwe ediland. Rahîşt gurzê di şiklê serê ga de, çend car teqîland. Dû re bang li jîrik û porspiyan kir, bi wan re axifî, derheqa pirsgrêkên welêt de agahî ji wan girt.

Gulistana Zarfîkan



Şengilo û Bengilo

Gava ku dibe payîz, piraniya heywanên Serhedê ber bi germayê koç dikin, hinek ji wan jî wetanî ne. Herêma ku heywan lêne, sal dozde meh li wir dijîn, di nav van nîfşê pezkovî û xezalan da hinek nîfşê ku koçber dibin jî henin.

Payîzekî, keriyê bizinên kovî di bilindaya çîyan da ber bi beriya şingalê koç kirin. Di nav keriyê bizinên kovî da êşa tebakê li lingê bizinekî dikeve. Ji ber vê newxeşiyê kulek dibê û weke hevalên xwe nikare biçêre û bimeşe; ji ber vê newxeşiyê tim li du keriyê bizinan dimîne.

Amedekar: İsa Eskîn

Zeman ser re çû, keriyê bizinan ji bizina kulek dûrketin û bizina kulek bi tena serê xwe ma.

Bizin rojekî li ser kaniyekî av vaxar û mexel hat, temaşe kir ji dûr va hirçek ber bi wê tê. Hirç hat li ber bizinê sekinî, navrojxêr lê da û got,

- Li te xêr e vê dema salê bi tena serê xwe li ser vê kaniyê çima mexel hatiyî?

Bizinê got,

- Mamê hirç, ezê çi ji te veşêrim, newxeşiya tebakê li lingê min xistiye, ez mînanî bizinên hevalên xwe nikarim di rê da bimeşim. Ji ber vê yekê li ser vî kaniyê tenê mame.

Hirçê got,

- Bizina delal, dixwuye ku tu bi vê nexeşiyê nikarî bigihîjî keriyê bizinên hevalên xwe. Tu bi ya min bikî were vî zivistanê bibe cîranê me.

Bizin dibêje,

- Baş e. Çawa baweriya min bi we bê.

Hirçê got,

- Tu were ez im, rovî ye û gur e, emê bicivin soz û bext bidin te, da ku em tu xirabiye bi te nekin.

Bizinê got,

- Baş e.

Bizin rabû, hirç kete bermilê wê ber bi newala jêrîn çûn. Çûn cem gur û rovî. Hirçê got,

- Hevalno, ev bizinek kovî ye. Êşê lingê wê xistiye ji hevalên xwe şûnda maye. Mîn jî soz û bext dayê, ku em tu xusarê nedin bizinê. Li ser soza min bizinê jî biryar da ku vê zivistanê bibe cîranê me. Divê ku em li ser vê biryarê qedr û qîmeta bizinê bigrin.

Gur û rovî gotin,

- Mamê hirç, tu kefilê me yî jî. Ne

eyb e û ne şerm e ku bizinek bi tena serê xwe di vî çolbirê maye û xwe li me girtiye. Çi ji destê me bê emê ji bizinê ra bikin.

Bi gotina gur û rovî bizin kêfxweş û serbilind bû. Her cara bi alîkarî nêzîkê şikeftên xwe gomeke piçûk ji bizinê ra avakirin. Bizin bi vê gomê pir kêfxweş bû û jiyana xwe têda derbaz kir.

Zivistana reş û dirêj hat derbaz bû, bihar hat, dinya germ bû, çêre hêşîn bû, daran jî pel veda. Bizinê za, du heb karîkê delal anî. Gazî mamê hirç kir, mame hirç her yek navek li wan kir. Navê yekî kir Şengilo, navê yekî jî danî Bengilo. Şengilo û Bengilo du karê pir şîrîn û delal bûn. Helî bûn, rojekî diya wan gazî Şengilo û Bengilo kir û ji wan ra got,

- Şengilo, Bengilo ji îro paşda ezê ji gomê parî dûr biçêrim. Ji bo vê hunê gomê da tenê bimînin. Ezê ji we ra niha çîrokekê bibêjim,

- Dayê çûye zozanan, çêriyê mêrg û çîmenan, şîr berdaye guhanan, Şengilo, Bengilo werin dana. Gava min ev çîrok got hûn bizanin ku ez im.

Şengilo û Bengilo jî gotin,

- Baş e dayê.

Heraj bizin diçû diçêrî û dihat li ber derê gomê digot,

- Dayê çûye zozanan çêriyê mêrg û çîmenan, şîr berdaye guhanan, Şengilo, Bengilo verin dana.

Rojekî gurê pişt hêşîn, Şengilo Bengilo dît av ji devê wî rez bû. Gur xwe bi xwe ra got,

- Bihar hat, her yek ji me wê derekîda biçe. Êdî em hev nabînin, ji ber vê qasê sozê ku me dabû bizinê hetanî biharê bû. Waye bihar hat, ew sozê

ku me dabû hev ji betal bû.

Gur dît ku êvarê bizin ber bi dana hat. Gur jî çû li ber gomê xwe veşart. Gava ku bizin hat ber gomê dest bi çî-roka xwe kir û got,

- Dayê çûye zozanan, çêriye mêrg û çîmenan, şîr berdaye guhanan, Şengilo, Bengilo werîn dana.

Bizin gava ev çîrok got, Şengilo û Bengilo derî vekirin û ber bi diya xwe bazdan.

Sibetira din gurê pişt hêşîn bizin çavnêr kir, dema bizin ji gomê derket ber bi çiya çû ku biçêre, ew jî ber bi gomê hat. Li ber deriyê gomê sekinî û texlîtê bizinê kir û got;

- Dayê çûye zozanan, çêriye mêrg û çîmenan, şîr berdaye guhanan, Şen-

gilo, Bengilo werîn dana.

Şengilo dibêje Bengilo,


- Diya me tu caran vî demê rojê nedihat. Ewê li ber derî ne diya me ye. Ev yekî xerîb e.

Bengilo dibêje,

- Dibe ku karekî diya me li me heye û ji bona wê şûnda vegeyriya, em derî vekin.

Şengilo jî bawer bi vê yekî anî û derî vekirin. Gurê piştêşîn êrîşê ser wan dike û Şengilo, Bengilo dixwe. Piştî ku wan dixwe berê xwe dide şikefta xwe û diçe. Dibe êvar, bizin ji çêrê tê li ber deriyê gomê disekine û dibêje,

- Dayê çûye zozanan, çêriye mêrg û çîmenan, şîr berdaye guhanan, Şen-



gilo, Bengilo werin dana.

Kesî derî venekir. Dîsa got û dîsa kesî derî venekir. Bizinê boçek li derî xist kete hundir, temaşe kir ku ne Şengilo û ne jî Bengilo di cihê xwe nînin. Hêrs bû giriya û got,

- Hebe tunebe zewala van herdu karê min ê delal Şengilo û Bengilo ji destê cîranên min e.

Berê xwe da mala hirç, li ser banê şikefta wî xwe hilavît. Hirç hêrs bû û got,

- Ew kî ye, li ser banê min dim dim dike, xwelî li serê heftê û heft babê xwe dike? Jina min hevîr dike, bûka min nexşa dike, ez bi xwe çalim dikim.

Bizinê got,

Ez im, ez bizin, situriyê min dara hezê, te xwariye Şenga min, te xwariye Benga min, were şer û cenga min.

Hirç pir xemgîn bû û got,

- Min nexwariye Şenga te, min nexwariye Benga te, nayê şer û cenga te.

Bizin dibêje,

- Ev şixulê kî ye?

Bizin û hirç bi hev ra ber bi şikefta roví diçin. Bizin derket serê şikeftê xwe helavît, roví got,

- Ew kî ye, li ser banê min dim dim dike xwelî li serê heftê û heft babê xwe dike? Jina min hevîr dike, bûka min nexşa dike, ez bi xwe qelûn dikêşim.

Bizinê got,

- Ez im, ez bizin, situriyê min dara hezê, te xwariye Şenga min, te xwariye Benga min, were şer û cenga min.

Rovî got,

- Min nexwariye Şenga te, min nexwariye Benga te, nayê şer û cen-

ga te.

Gotin,

- Ev şixulê bi fêl şixulê gur e.

Her siya hev ra berê xwe da şikefta gur. Bizin derket ser banê şikeftê, xwe helavit û gur got,

- Ew kî ye, li ser banê min dim dim dike, xwelî li serê heftê û heft babê xwe dike? Jina min hevîr dike, bûka min nexşa dike, ez bi xwe qelûn dikêşim.

Bizinê got,

- Ez im, ez bizin, situriyê min dara hezê, te xwariye Şenga min, te xwariye Benga min, were şer û cenga min.

Gur got,

- Belê min xwariye Şenga te, min xwariye Benga te, ezê werim şer û cenga te.

Bizinê got,

- Tu here li ser dirançêker, tûjbike diranê xwe, ez jî biçim li ser hedat tûj bikim situriyê xwe.

Her du ya di meydanê da berhevdan û çûn. Gur dev avît sutiyê bizinê lê devê wî jê negirt. Bizinê got,

- Ma ne dora min e.

Gur got,


- Belê.

Bizin rabû li ser herdu lingê xwe yê paşiyê, boçek li zikê gur xist, herdu situriyê wê weke xencereke tûj zikê gur qelaşt û gur dirêjî erdê bû. Şengilo û Bengilo ji nav zikê gur derketin. Bizinê got,

- Şengilo û Bengilo diya we qurbanî we be. Min çiqasi bêriya we kiri bû.

Şengilo, Bengilo gihîştin diya xwe û berê xwe dan zozanan. Çîroka me çû nava deviya, rehmet li dê û bavê me hemûya.

Homerosê sedsalê: Karapetê Xaço



Berken Bereh

bbereh@nefel.com

Di pirtûka Salihê Kevirbirî ya bi navê "Bir Çılgîn Yüzyılı: Karapetê Xaço" (Qêrîna Sedsalekî: Karapetê Xaço) de ligel çîroka jiyana Karapetê Xaço ya trajîk, beşin ji dîroka stranbêjîya kurdan jî hatiye vegotin. Ev jiyana di heman demê de dîroka kurdan a fermalûbûn û bi êş jî radixe ber çavan.

Kapîtalîzma nevnateweyî di sedsala me de dirûv û teşeya xwe guhertiye û gihîştîye asta xwe ya herî bilind û hov. Ev hovîti gihaye radeyeke wisa ku dike mirov ji xwe û ji mirovahiyê dûr bikeve û bibe dijminê mirovahiyê. Ji bo ku mirov bikaribe xwe li hember vê hovîtiya kapîtalîzmê biparêze, divê mirov xwe bispêre dengbêjan. Xwe bi kilam û stranên wan ku bi haveyna mirovahî û evîne hatine afirandin bipêçe.

Heger hûn bixwazin bê ka ev kilam û stran li ser jiyana civak, netewe û şexsiyetê bandoreke çawa erênî pêk tînin hûn bibin, divê hûn berê xwe bidine erdnîgariya Mezopotamya yê ku ji sedsalan û virde ye bûye qada êş, jan, kul, berxwedêrî û evînên bêhempa. Em dibînin ku gotin li ser vê erdnîgariyê bûye hingiv, şekir û hêza herî bibandor û rê li ber her cure hovîtî û pişavtinê girtiye. Dîsa em dibînin ku her peyveke kilam û stranekê bûye tovê mirovahî, şaristanî û serkeftinê. Her peyv; karesat, têkçûn û serkeftinên li vê erdnîgariyê qewimîne wisa xweşik aniye zimên ku mirov dibêje roj û jiyan kakkil û şewqa xwe jê girtiye û bûye çavkaniya ronîdariyê. Beramberî vê jî yek car bi tenê hespê gelên berxwedêr ne kuliye, tim bi çargavî meşiyaye. Sedema vê jî aramî, hostatî û afirîneriya dengbêjan e. Lewre dengbêj ne tenê êş, kul, karesat û janên gelekî; di heman demê de dîrokekî jî dinivîsin. Lewre ew bi her peyveke xwe, bi aramiya pêxemberekî diramin, difikirin û diafirînin. Nemaze ew zimanê ku pê stranan diafirînin hatibe qedexekirin, wê gavê werin rol û giringiya vê yekê jî hûn bifikirin. Pirtûka nû ya Rojnameger û Nivîskar Salihê Kevirbirî ya bi navê "Bir Çiğlığın Yüzyılı: Karapetê Xaço" ku çendek berê ji nav "Weşanên Sî" ronkahiye dît, ji bo van gotinên me mînaka herî berbiçav e.

Helbet ev dengbêjên hêja ne tenê di şevbihêrkan de ji civat û çaqiyan re demên xweş dane afirandin; di heman demê de ev camêrên hanê bi

kilam û stranên xwe xwestine civat û mirovahiyê li hember zilm û zordariyê hişyar bikin, rakin ser piyan û hest û dilînen bi nirx bi laş û gewde bikin. Bi saya serê wan dengbêjan zimanek ji mirinê rizgar bûye û dabûnêrî û kelepore neteweyekê ji qirqirinê parastine. Dengbêjan ev yek bi şarezayî û hostatî bi cih anine.

Bêguman Karapetê Xaço yek ji van dengbêjên pîroz, berxwedêr, afirîner û xwedî dengê taybet e. Di 102 saliya xwe de jî bi rik û coş, hê jî berdevkê neteweya me ye. Apê Karapet di heman demê de bûyê dengê hemî gelên rojhilata navîn û bûye sembola sedsala 20-21'an a gelên bindest jî. Wî, qirqirin, şer, karesat û evînen erdnîgarekê li ser bendera aştiyê bi hêviyeke bêhempa meyandiye û gihandiye îro. Mîna xaka xwe ya bi êş û jan, jiyaneke xizan û bikul jiyaye. Ji ber wê ye di stran û kilamên wî de mîrxasî û hogirî neqşa herî berbiçav e.

Hozanê kurd Ciwan Haco ji bo wî wiha dibêje: "Karapêt, flemenko tîne bîra min. Lê tiştêk kêma e. Ritm û gîtar tune ye. Karapêt hema bêje bê enstrûman dibêje. Ew tam dengbêjek e. Ji bo min ew îdol e...."

Romanûsê kurd Mehmed Uzun jî ji bo wî wisa dibêje: "Ev mirovê ku dewlemendiya wî bi tenê peyv in, xwezî bizanibûya ku zimanek, çandek û erdnîgarek çiqas deyndarê wî ye! Xwezî Bizanibe ku em çiqas dayndarê wî û dengê wî ne! Bila bizanibe ku ew Homerosê dinyayê ye ku niha dijî bixwe ye..."

Ji pirtûka Salihê Kevirbirî em pê dihesin û hûn dibin ku dengbêjî sazi-



Karapêtê Xaço

yek e û xwediyê taybetiyên xweser in. Dengbêj dema dest bi kilam û stranan dîkin destê xwe dibin ber guhên xwe. Em hîn dibin ku destên wan ji wan re peywira monîtorê pêk tînin. Dîsa em hîn dibin ku yek ji taybetiyên dengbêjan jî taybetiya "Sewta Serî" ye. Kesên ku bi vê sewtê distrên hem dengê xwe yê xweş diparêzin, hem jî kilam û stranên xwe jibîr nakin. Di kurdî de "xulxulandin" gi-

rîng e. Karapêtê Xaço xwediyê van taybetmendiyên e. Ji ber wê ye Karapêtê Xaço di 102 saliya xwe de jî wekî dema pêncî saliya xwe stran û kilamên xwe bi dengeke bi bandor û nazenînî dibêje. Dîsa em ji pirtûkê hîn dibin ku her kesê ku dengê wî xweş be nikare bibe dengbêj. Dengbêj dibin du bir. Yek; kesên mîna Evdalê Zeynikê, Karapêtê Xaço ku bûne ekol; yên din jî ew in ku bi dengê xwe yê xweş didin pey şopa wan û şagirtî ji wan re dîkin.

Di pirtûkê de ligel çîroka jiyana Karapêtê Xaço ya trajîk, beşin ji dîroka stranbêjîya kurdan jî hatiye vegotin. Ev jiyana di heman demê de dîroka kurdan a fermalûbûn û bi êş jî radixe ber çavan. Bi vê berhema hêja ya Kevirbirî em hîn dibin ku Karapêtê Xaço yê ermen, çand û kelepûra me ya ber mirinê bi dilgermî û dilsozî parastiye û gihandiye neviyên Evdalê Zeynikê û Feqiyê Teyran. Ew toven ku îro tovê neteweyê hemdem di-

çînin!

Pênûs xweş Salihê Kevirbirî, destê te ter bin...!

Tu her bijî Mamê Karapêt!...
Deng li dinê be!...

Bir Çiğlîğın Yüzyılı:

Karapêtê Xaço


Salihê Kevirbirî

Weşanên Sî

144 rûpel

Hetani kengi

Bona bîranîna bavê min - şehîdê Şerê Weteniyê Dewrêşê Serdar.



Emerîkê Serdar

Her car, wexta ez cîkîda diçim, Zera mina biçûk timî dipirse:

Bavo, tê kengî bêyî?

Ev pîrsa wê serhatineke derbazbûyî melûl tîne bîra min. Û çiqas cara min ew pîrs bihîstiyê, ewqasî ew serhatî hatiye ber çavê min û min tirê ew ne ku zef zûda qewimiye, lê duh bûye.

...Sala 1941-ê bû. (Hilbet, ez paşê ve yekê hesiyam.) Havîn bû, germê diqijilandin. Heyeta komîsariyata nehiyeyê eskeriyê da tijî merî bûn. Xênjî mêra, usa jî gelek jin û zaro hebûn. Kom-kom bûbûn û xeber didan. Ez wî çaxî heft salî bûm û min hela pakî tê dernedixist, wekî çi qewimiye, çira diya min û pîrka min digirîn, lê bavê min melûl-melûl dûr dinihêre. Em ser hêşnaya heyata komîsariyata eskeriyê rûniştibûn. Bavê min ez danîbûm ser çoka xwe, serê min dabû ber sîngê xwe û destê xwe nava porê serê min digerland. Ber tavê ez aciz bûbûm û çavê min zorê ji hev vedibûn.

- Çi we qewimiye, şîna tevî dinê şayiye, - dengê bavê min li min tesele bû.

Min serê xwe hilbirî bavê xwe nihêrî.

Bavê min mirûzkirî bû, diya min dini-hêrî. Min texmîn kir, wekî ewî ew xerber diya min ra gotin. Ez vegeyame aliyê diya xwe. Ewê serê xwe berjêr kiribû û pê pêşa şelka xwe hêsirê çavê xwe temiz dikirin.

- Şer e, dinya- alem diçe, xwe ez tenê nînim, - bavê min bi hêrs digote diya min.

- De belkî mala şerûda kavla kulêbe, - pîrka min digot û destmala xwe dikire ber pišta xwe.

- Çend berxa bibe bazarê, bifroşe, gîhê pêz bikire, -bavê min digote diya min- Te hew nihêrî şer dirêj kişand, ez wededa nehatim. Karê zivistanê rind bibîne.

Wekî usane bavê min dibe hetanî berf bikeve jî neyê. Wê ewqas wext çi bike, çira ewqasî derengî keve? Berê, wexta diçû şêher (hertim payîza diçû), hetanî rojîya vedigeriya dihat. Dibe bavê min gelekî dûr diçe, lema jî wê dereng bê?

Nizanim çi qas zeman wî cûreyî derbaz bûbû, ber tavê westiyayî, acizbûyî ez xew ra çûbûm. Wextekê min çavê xwe vekir, bala xwe dayê ez dîsa ser çoka bavê xweme û min bi herdu desta stûyê wî girtiye. Qalme - qalmeke usa bû, her xwedê bizan be. Nava wê hewar-gaziyê da hertim dengêkî qalim dihate bihîstinê, ewî nav û femîlê meriya dixwendin.

- Ahmedê Ûsib...

- Ezê zû-zû nema binivîsim, derheqa min da nefikirin, - bavê min pey xwendina her femîlekê ra digote pîrka min û diya min.

- Husoyê Qado...

- Miqatî hev bin, - bavê min digote diya min û pîrka min, - nehêlin gedê dûr here. Hila çika xwedê çi dike.

"Gede" jî ez bûm. Buhara û havîna sibê hetanî êvarê çolê bûm, nedihatime mal- avaya. Gelek cara jî diya min, yanê pîrka min pey min dihatine çoyê, milê min digirtin û zorê danîne malê.

- Ezîzê Koro...

- Lao, - bavê min vedigeriya ser min, - tu jî îdî şikir mezinî, gora pîrka xwe, diya xwe bikî, alî wan bike. Apê te jî birine eskeriyê. Mêrê malê îdî tu mayî..

Min serê xwe kire ber xwe, pişika xwe da hevekî werimîm. Cara ewlin bû, ku bavê min ez dewsa meriyê mezin dadanîm.

- Keleşê Qadê...

- Bîr nekî, - bavê min digote diya min, - wan perê me ji cem Qasim hildî. Pê wan pera ar bikire dayne. Bira nanê we kêm nebe, kî zane...

Nanê me wê çira kêm be, ez difikirîm. Çend çewal arê me koxda danîne ser hev, ez ber disekinim, destê min nagihîje serê wan. Ka me ew ar xwariye, wekî arê teze jî bikin. Na, tê kivşê bavê min naxwaze zû bê, lema temiyê usa diya min dike.

- Evdoyê Kakê...

- Çawa nameya Hemîd hat, adrêsa wî pêra-pêra min ra bişînin, - bavê min digot û hey wî aliyê deng dinihêrî.

Hemîd apê min bû, du roja pêşda biribûn. Wî çaxî bavê min, diya min û pîrka min ew verêkirin, nehiştin ez jî wan ra herim. Roja apê min birin, bavê min nava xênî diçû, dihat û ofe-ofa wî bû. Hêsir ji çavê pîrka min kêm nedibûn, lê diya min karê apê min dikir.

- Dewrêşê Serdar...

- Ez vêderême, - bavê min got, ez

serpêşa xwe peyakirim, hêdî ji ciyê xwe rabû. Diya min û pîrka min berî wî ji cî quloz bûn. Bavê min xwe avî-te pêşîra pîrka min. Lê pîrka min destê xwe stûyê wî ra bir, serê wî berjêrkir û çend cara çû rûya. Epêce wext stûyê wî bernedida. Paşê gavekê paşda çû, stûyê xwe xwar kir, kûr nihêrî:

- De here, lao xwedê oxra te ra be, sax herî silamet bêy, - ewê digot û digiriya.

Bavê min kûz bû, ez hilbirîm, dame ber sîngê xwe herdu sûrtê min paç kirin, zûr bû min nihêrî. Çavê wî şelû bûbûn, gulpekê çavê wî zû-zû dihatine girtinê û vekirinê. Xêlekê usa zûr bû min nihêrî paşê ez qayîm sîngê xweva guvaştim, vegeriya ser diya min:

- Dema xatirê te, miqatî diya min û gede be, - gotê û ezî usa ber sîng, torbê wî piştê berbi ewî merivî çû, ku nav û femîla meriya dixwendin. Min jî bi herdu desta stûyê bavê xwe qayîm girt. Em çûn nêzîkî wî merivî bûn. Diya min û pîrka min jî pey me dihatin. Ewî mêrikî ez ji ber sîngê bavê min peya kirim, destê min girt. Bavê min pêşda çû, sekinî, vegeriya me nenihêrî. Min îdî xwe zevtnekir û bi dengekî girî kire gazî:

- Bavo, tê zû bêyî?

Ewî mêrikî destê min diha qayîm guvaşt, vegeriya min nihêrî. Diya min û pîrka min digiriyan. Bavê min hêla ciyê xwe da sekinîbû, zûr bûbû me dinihêrî. Destê xwe bilind kir.

Hetanî... Bû hewareke mezin. Min xeberê bavê xweyê mayîn îdî nebîhîstin. Ewî tişteke digot, lê nava wê qalme-qalmê da dengê wî îdî nedigihîşte min. Vegeriya piştî xwe da me, bi gavê lez çû û nava cerga mêra da

sekinî. Mêrik destê min berda, wêda çû. Ez çûm kêleka diya xwe sekinîm, pêşa wê girt. Bavê min dûrva destê xwe me ra dihejand. Hetanî cêrge çû nepeniyê da qulibî, ewî usa destê xwe me ra dihejand

* * *

Havîn derbaz dibû, name dihatin... Sê niçik bûn û tê bêjî her niçikekî da şabûnek hebû: yek bona pîrka min, yek bona diya min û yek jî bona min... Xebera bavê min "hetanî"... bîra min da bû. Lê min nizanîbû, hetanî kengî. Min zanibû, wekî ezê wê salê herme mektebê.

Rojekê jî başewal, tena kras nava şewa fêza mala da min û hevalê xwe tevayî heriyêra dilist. Em lîstikê da ketibûn, me texmîn nekiribû, çawa diya min hatiye nêzîkî me bûye. Ewê navê min hilda. Min serê xwe bilind kir, dît, diya min ser min ra sekinî ye. Destê min girt, birme jorê, ser-çavê min, lingê minê herî şuştin, pê şelka xwe temiz kirin, şalê minî teze, ku wê salê buharê bavê min ji şêher min ra anîbû, li min kir, solê mine sore teze (ew jî bavê min anîbûn) kirne lingê min, destê min girt û em berjêr çûn. Min ji diya xwe pirsî:

- Dayê, em kuda diçin?

- Em diçine mektebê, -ewê bi şabûn gote min - Îro da îdî tu mektebvana yî.

Şabûneke mezin kete dilê min. Qe nizanîm çawa bêhemdî xwe min gote diya xwe:

- Wekî usane, bavê minê bê, ne? - min got û destê min destê wê da zîvirîme pêşiyê. Diya min nişkêva sekinî, zûr bû min nihêrî lez pirsî:

- Tu çawa zanî wê bê?

Min nizanîbû çi caba diya xwe bi-

dim: derheqa qirara xwe da minê çi jê ra bigota.

- Lê ez herme mektebê bavê min neyê? - bê hemdî xwe min gote diya xwe.

Destê diya min sist bû. Destê min ji destê xwe derket. Ew kela ku çend deqîqa pêşda çavê wê da hebû, vemîrî. Sekinî, serê xwe berjêr kir, berxwe-da nihêrî. Dengê xwe nekir. Min fêhm kir, wekî min xemeke mezin kire dilê dayika xwe. Ez jî ciyê xwe da sar bûm, şabûna ku xêlekê pêşda hebû, ji min dûrket.

- Dive bavê min neyê?, -min bi sûca karî ji diya xwe pirsî- Diya min nişkêva serê xwe hilbirî. Ser bengzê wê hêrs, înkarkirineke erhede hebû. Lê pêra jî çavê wê da agirekî gur hebû. Her tenê nuha fêhm dikim, ew agirê bawerbûnê bû. Him bona wê bi xwe bû, him jî bona min bû. Pêra-pêra destê min girt, lez-lez berbi mektebê çû.

- Na, lao, bavê te yê êsa bê, - rêva ewê bi bawerî gote min. Hevekî xwe kerkir, paşê bi dengê hêdî serda zêde kir. - Divê hevekî derengîkeve, lê wê êsa bê...

Ez çûme mektebê, lê bavê min nehat. Mehek derbaz bû, dîsa çavê me li rê ma. Payîzê extîyariyêd xwe teslîmî zivistanê kirin. Malxuyê malda tunebû, diya min nikaribû çawa lazime debrê bide ser hev û zivistanê, çawa dibêjin, qir kete nava pezê me. Her tenê çar miyê kelax derketne buharê. Arê me jî ser hevda hat, diya min pêra negîhand (diha rast destnexist) arê teze bikire. Pez jî qir bû, ar jî kuta bû, lê bavê min nehat. Dewê hey carna name dihatin. Û wexta name derengî diketin, qudûmê pîrka min dişkest.

Ruhê wê dihate serê poz. Çavê wê he-ma usa li rê bû...

Diya min êvarê dereng ji xebatê vedigeriya. Û wexta namê bavê min hebûna, pîrka min hêviya wê nedisekinî, didane xwendinê. Êvarê, wexta diya min dihat, pîrka min serecema wana jê ra şirove dikir. Lê qîma diya min ji vê yekê nedihat û ewê name hildanî, dibire mala cînarê me û dîsa dida xwendinê.

Min îdî çavê pîrka xweda, ser bengzê dayika xwe texmîn kiribû, wekî şer çiyê. Min zanibû, wekî ew ne mînanî şerê qebîlêd gundê me ye, lê zulmeke giran e, tişteki ewqasî nepakî neqence, wekî nahêle bavê min bê, wekî îdî malê me qir nebe, arê me kuta nebe, çavê pîrka min rê neqerime û diya min axîne ewqasî kûr nekişîne. Min bere-bere zulma şer texmîn dikir.

Salek derbaz bû, ez derbazî koma duda bûm, lê bavê min nehat. Niha min jî îdî karibû bin wan namada çend xebera binivîsim, ku mala me ya biçûk bavê min ra dişandin.. Min hertim dinivîsî: "Bavo tê kengî bê?" Ewî dinivîsî, wekî wê zûtirekê bê. Lê kengî? Caba vê pirsîye konkret tunebû. Lê min ew yek dixwest û dilê xwe da usa hesab dikir, wekî hetanî mekteb vebe bavê minê bê. Ez bi wê gumanê jî dimam û ditirsiyam, meriyê mayîn wê gumana xwe bidime hesandinê. Ew tenê gumana min bû.

* * *

Çiqas çû serecema nama ewqasî kurt bû. "Wedê min tune, emê îşev hicûm bikin... Emê ese altkin û zûtirekê hevdu bibînin.. Min çiqasî bîra we kiriyê.."

Dîsa yekê sentyabirê hat. Lê bavê min nehat. Gumana min xeyirî. Me sî

manatekî sor ji bavê min stend. Çendekî şûnda nama wî jî hat. "Ezî saxî-silametim. Tenê derheqa we da difikirim. Emê îşev hicûm bikin. Tişt nake, gele çûye, hindik maye. Ber xwe bîdin, ezê zûtirekê xwe we ra bigihînim. Çendekî pêşda min sî manat şand. Pê wan pera defter û kitêbê ge-de bistînin, belkî rind hîn dibe. De pak gazî min dikin. Şeva we bimîne xweş".

Name pê qelemê ser kaxezekî qalim nivîsî bû. Çilke av (yanê hêsir) ketibû ser navê wî, kaxezê ew çilk hilçinandibû xwe, nivîsara qelema kîmiyayê mezin kiribû û aqareke biçûk reş kiribû. Navê bavê min pak nedihat xwendine. Pîrka min namê bavê min cem xwe xwey dikirin. Dikire qutiya xweye darîn, nava kincê xweye tezeda vedişart. Ew kinc bavê min, apê min jê ra kirî bûn û hela pêra negîhandibû xweke, gava herdu kur verêkirine şer û sond xwar hetanî vene-gerin milê xwe wan kincara neke. Wexta namê bavê min derengî diketin pîrka min derê qutiye vedikir, yekyek wan nama dinihêrî. Xwexwe nexwendî bû, lê zanibû, wekî her yekêda çi nivîsiye û kengê şandiye.

Min jî ji perê wan deftera, ku pê perê bavê mine şandî kirîbûn, jê ra namê biçûk dinivîsîn û dişandin. Lê namê bavê min bûbûn qatî. Diya min hela xebatêda diket, tê bêjî hevekî derd-kulê xwe bîr dikirin, lê sibê hetanî êvarê ax, kesera pîrka min namê bavê min bûn. (Namê apê min hertim dihatin, ew nebiribûne ber şer, piştêda qulix dikir) Meh dihatin, derbaz dibûn, halê mala me diha çetin dibû. Alîkîda namê bavê min nedihatîn, aliyê mayînda jî diya min ancax ebû-

ra me dikir. Min dilê xwe da hertim wedê hatina bavê xwe dirêj dikir, dil-dîmî dida ber dilê xwe, wekî wê zûtirekê bê. Ez rind hîn dibûm û difikirîm, wekî wexta bavê min bê, bira zanibe, ku perê wî yê şandî bona min badilhewa xerc nekirine. Raste, defterê me ne tu tişt bûn (te perkê bi hubrê dida ser belga govekeke mezin hildiçinî xwe û reş dibû), lê min dice-dand her tiştî pak bikim, wekî qîmetê xirab nestînim. Raste, qe nizamim çawa diya min pê wan pera çend defter kiribûn, lê şixulê hubrê gelekî çetin bû. Me danî çira neftê dikire peltikê û hetanî sibê vêxistî dihişt. Dûyê wê banê peltikêva digirt. Me sibê derdaneke biçûk dida binî û pê kêrê ew dûyê banê peltikêvagirtî vedrût, dikire derdanê. Paşê hevek av dikire navê û lihevdişist. Dibû mînanî hubra reş. Me ew dikire huburdanga xwe û pê dinivîsî. Te hew niherî mûkî serê perikva girt û temamiya herfê reş kir. Bona vê yekê dersdara dengê xwe me ra nedikirin, zanibûn, em hubrê çawa çêdikin, A bi hubra usa û kaxezê wan defterê kirî min ji bavê xwe ra îdî namê biçûk dinivîsî. Lê cab tunebûn û tunebûn. Namebir îdî aliyê mala me da nedihat. Pîrka min nivê rojêyî pirê derba, ser selê ber derî derbaz dikir, çelc wê li riya namêd bavê min bûn, lê ew bûbûn kevirê binê bîrê.

Salek jî derbaz bû, lê namê bavê min nedihatîn. Ez derbazî koma sisiya bûm. Gumanêke biçûk dilê min da hebû, wekî dibe îsal bavê min bê. (Hişê zarane: name nedihatîn, lê ez çavniheriya bavê xwe bûm) Îlahî, wexta qîzeke gundê meye kezî dabûne razandine û ewê ber xewa gotibû, wekî îsal ku mabe bavê minê bê. (Wî

çaxî gundê me da danîn qîzeke kezî roj didîne razandinê. Tasa av dadanî ber serî, eynek didane ber. Şikl, hûr-mûrê meriyê eskeriyêda dadanîn cem. Gava şiklê yekî, yanê hûr-mûrê yekî didan ser sîngê qîza razayî, ewê destpê dikir derheqa wî da xeber dida. Wexta kuta dikir, şiklê yekî mayîn dadanîn ser sîngê wê. Û aha hetanî kuta-siyê) Gotina wê min ra bûbû guman û ez hêviya hatina bavê xwe bûm.

Ew sal jî kuta bû, sala pey wê ra jî hat, derbaz bû, lê ne bavê min bû, ne jî namêd wî bûn.

- Dive dil ketiye, lema namê wî nayên -hertim kulfetê navsere ber dilê pîrka min da dihatin- Bîna xwe fireke, xwedê rehme, te hew nihêrî, tera cîkî-da delîlek vebû.

Lê xuşûşiya dilê pîrka min da bela nedibû. Sibê hetanî êvarê çavê wê li rê bû û hêsir ji çavê wê xalî nedibûn.

Her êvara, gava diya min ji xebatê vedigeriya, pîrsa wê ya pêşin ha bû:

- Name heye, yanê na?

Û wexta pê dihesiya, wekî tune, tê bêjî, teze tê derdixist, wekî westiyayî, kesiriyê, ancax pêra digihand rûdinişt, bi herdu desta serê xwe digirt û berjêr dinihêrî. Û, bawer bikî her ro eva yek-a vî teherî dihatê weklandinê.

* * *

Buhar bû, berf hilatibû, qalçîçek derketibûn. Birçibûn, xelayî bû. Em hewcê parî nanê cehî tisî bûn. Me zanibû buhar vebû, mirina me tune, çimkî emê qe na pê pincarê ebûra xwe bikin. Û çawa buhar dihat me radihişte çolê, pincar diçinî, dixwar.

Wê rojê ez û gedê hevalê min çûbûne piçoka. Lingê me nava ava qarxûna da sor bûbûn. Em hatin malê, me piçokê xwe danîn û ancax xwe tendû-

ra me ra gîhand. Me pêra-pêra lingê xwe kire tendûrê. Çend deqa şûnda lingê me şewitî û me herdu jî lingê xwe ji tendûrê derxistin. Diya min ser xebatê bû, lê pîrka min nizanîm kuda çûbû. Gedê hevalê min hilda gote min:

- Mala me da hevek kartol hene, ez herim çend heba bînim, em tûzîkin, tendûrêxin, bipijînin, bixun.

Nîvro bû, tendûr teze vêsandibûn û keviyê wê hela gelekî germ bûn. Hevalê min çû mala wan, çend kartol anîn, me tûzî kir, xuyê ser reşand û keviya tendûrê xist. Bû çizîniya kartola pêva girtin. Wî çaxî cînarekî me ku şerda seqet bûbû, vegeriya bû, bi demekî şa hate mala me.

- Ka diya te, pîrka te? -ewî ji min pîrsî- Min gotê, wekî diya min hela ser xebatêye, lê pîrka min nizanîm kuda çûye.

- Mizgîniya min we ra, gelî zara, şikir şer kuta bûye, - ewî bi demekî şa gote me. Sifte em herdu jî ji cî nelipitîn, me nizanibû çi bikira.

Gedê hevalê min nişkêva ji cî banzda, berbi derî çû, lê ciyê xweda sekinî.

- Ez herim mizgîniyê bidime mala me. Lê kartola nexwî, ezê va bêm, -got û dêrîva çilqas kir. Ez hela ciyê xwe da sekinî bûm û min nizanibû çi bikira.

Qe nizanîm çawa, bê hemdî xwe, min ji wî cînarê me pîrsî:

- Wekî usana, bavê minê zûtirekê bê, ne? Ewî serê xwe kire ber xwe, nexwest çavê min binihêre, berxweda got:

- Lê çawa, wê bê.

Tê bêjî şikberî nava gotina wî da hebû. Nesekinî, lez dêrîva derket, çû.

Min jî xwest derêm, herim pîrka xwe bibînîm, çavronayê bidimê. Lê curê gotina wî xuşûşike mezin kiribû dilê min. "Wexta şer kuta bûye, bavê minê jî bê, difikirim.- Ewî îdî çira usa bê dilê xwe digot? Lê hesab yeke şer kuta bûye, bavê minê bê". Nişkêva bû terpîn; kartola tûzîkirî ji keviya tendûrê ket nava koziyê. Hevalê min usa jî nehat. Min îdî tûziyê kartolê ji tendûrê dernexist. Ez derketime derva. Gundî tamam bêdera orta gund da berev bûbûn, şa dibûn, dikeniyân. Min çavê xwe nav wan gerand, lê ne pîrka min, ne jî diya min newêderê bûn. Şabûna tomerî bû, her yek bi cûrê xwe şa dibû. Xelekê şûnda diya min û pîrka min jî hatne wêderê. Ser bengzê wan jî ken û şabûn hate kivşê. Hetanî êvara dereng kesek neçû mala xwe, gişk hev top bûbûn, şa dibûn, lê hêy carna guhê hevda dikirine piste-pist û aliyê malê wan meriya dinihêrîn, ku wexteke dirêj bû namê wan nedihatîn, yanê, çawa wî çaxî digotin, "kaxezê wane reş" hatibû. Carekê-duda aliyê mala me da jî nihêrîn.

Xulese, şer kuta bû, ew altindarî, ku ewqasî hêviyê bûn, hat. Ew gundiyê me, ku kom-kom çûbûne ber şer, niha tek-tek vedigeriyan. Hetanî payîza dereng jî tek-tek dihatîn. Lê hatî ber çûya ewqasî kêmbûn... Dewsa nehatiya "kaxezê reş" dihat. Xebera "reş" îdî bi xwe gele tişt digot. Te hew dinhêrî wê rojê malekê da dibû şayî, meriyê wan ji ber şer vedigeriya, lê gund da çend mala da dibû şîn, "kaxezê reş" derê wan mala dihingavt. Niha îdî usa bûbû, wekî merî ji nama ditirsiyan; te hew dît xwedê nekirî "kaxezê reşbe". Rastiyê gotî, ez jî îdî ji nama ditirsyam. Lê gumanek dilê

min da hebû: min ji giliyê bavê xwe bawer dikir, wekî wê ese bê.

Rojekê "kaxezekî usayî reş" derê me jî kuta. Nizanim çira jêra digotin "kaxezê reş", gava wê namê da her tenê kaxezekî sipî hebû. Mala me da şîneke giran bû... Diya min, pîrka min ser çavê xwe diqelaştin, porê xwe vedirûtin. Der-cînar tijî mala me bûbûn, jin digiriyan, lê mêra serê xwe kiribûne ber xwe û ker sekinî bûn. Min jî dixwest, wekî bigirîm, lê dikir, nedikir giriyê min nedihat. Min nedixwest ji wî "kaxezê reş" bawer bikim. Min dixwest ji giliyê bavê xwe bawer bikim...

Û meh dihatin derbaz dibûn, min ji wê xebera bavê xwe bawer dikir. Lê ew nehat. Sal dihatin derbaz dibûn, min ji xebera bavê xwe bawer dikir û çavê min riya wî bû, lê ew nedihat. Min mekteb kuta kir bawerbûna berbi giliyê bavê min bal min kêmbû, lê ew nedihat. Înstîtûtî jî kuta kir, dîsa bawerbûn dilê min da ma. Zewicîm bi xwe jî bûme bav, lê gotina bavê min ji serê min derneket û hetanî niha jî dermayê. Gelo ezê ta kengî ji wê xebera bavê xweye "hetanî..." bawer bikim? Tê kivşê hetanî rojekê li dinê bim. Bawerbûn tiştêkî rinde; derew yanê rastî yeke. Min bawer kiriye, bawer dikim û ezê heta-hetayê bawer bikim.

Her cara, wexta ez cîkîda diçim, Zera mina biçûk timî dipirse:

- Bavo, tê kengî bêyî?

Û hertim rastiyê jê ra dibêjim û wê naxapînim, çawa bavê min bêy xwestina xwe wî çaxîda hetanî niha min "dixapîne."

Muptelayê Hibrê

Rênas Jiyan

Edebiyata kurdan û bi giştî jî hunera kurdan, ev çend sedsal in beyar maye. Ji tovên hatin reşandin; hinek beravêti çêbûn, hinek neseridîn, hinek şewibîn û hinek jî di erdê de riziyan; ji ber ku hewcedariyên wan tovan nehatin bicihanîn di erda avis de. Dema edebiyatvan û hunermend ango erbabê vî karî, vî erdê beyar bi tuxumên fantazyayî (hêmayî) biçînin û hemû hewcedariyên wî bi cih bînin hatiye. Mîlenyûm, divê bibe wek "sala deqnanozê" ji wêjeya nûjen a Kurdî re.

Kêşe, ji ev erdê beyarmayî yê bi bereket naqewime; ji cotkarên wî/wê diqewime. Ev erd û ax bi qasî xwînê û hêsi-ran hibr bimêta wê jê gelek qelem şîn bihatana, welew di lîteraturê de xwîn, hibr e.

Mirov beyarmayîna edebiyatê wek beyarmayina mejî û giyên jî dikare formule bike. Bi qasî beyarmayîna axa wêje û hunera civaka kurdan; hiş, ruh û dilê civaka kurdan jî beyar ma, ji bêhibrî tî ma.

Cotkar û paleyên hibrê kêman bûn me got, belam yekhebên ku çend xet cot xwestin biajon jî, ji hurmeta dîrokê û ji qedrê civakê mahrûm man. Çandiniyên van cotkarên dilovan, di bin nigên talan û tofanên dirinde de ku ev tofan û talan kirinên însanan bûn-pelçiqîn û mixabin hîna jî tîn pelçiqandin... Berpirsiyar û sûcdarên vê pelçiqandinê, bi qasî "yên pelçiqandin" bên xuyakirin jî, "yên dan pelçiqandin" jî şîrîkê vê qetla çandî û hunerî ne. Di vê sûc û berpirsiyariyê de bi qasî cînavka "ew", cînavka "em" jî roleke aktîf lîst û hîna jî dilîze.

Hibr, ava azadiyê ye. Her civak bi qasî pîvana rijandina hibra xwe azad e. Sînorên mejiyê her civak û kulturê bi qasî herkandina hibra wan fireh û bi fesal e. Movikên kesayetiya wan bi rengê hibra wan karakterîze dibe û dicebire. Rû û ruhên wan bi qasî estetîk xêzkirina pênuşa wan xweşik an jî ne xweşik e.

Civakên bûne pûtperestên pênuşê gihaştine qonaxên çê.

Lê qelem û hibr di civaka kurdan de; her û her du diyardeyên zingargirtî man, her û her du diyardeyên biniqrîsk û kefen lixwekirî man.

Çi bû di encama zingargirtina van herdu diyardeyan de?

Ev bû; em, di xelesa demê de teng man; navê qelbê me li ser tu

tablet û dokumentên cîhanî nehat nivîsandin; di platforma civakên cîhanê de siluwetê dengê me di rewşeke sêkratî de wek gêjan çû û hat; serbestî ji me re bû wek kabûsekê; bîra ramana me encax bihostekê bi kûr de çû, yanî me ji bîra "bîr" a xwe têr av venexwar. Bi kinayî yeka me nebû dudu û sûretê nav û nasnava me hat çirandin û hîn jî em li ew perçeyên nasnava xwe ya çiriyayî digerin bi çavên xwe yên ava reş pêdehatî.

Kurd, ji xeynî hibrê, bûn muptelayên gelek tiştan. Wek mînak; ol, îxanet, birakujî, bindestî, hesûdî, bexîltî, nezanî... Dîroka kurdan, bi van mestereyan mişt e. Tabloya heyî ya civaka îro, jixwe vana gişan dipeyitîne. Divê ev têgehên nebaş û netendurust, ji destê mutelayê hibrê, bi hibrê yek bi yek bên şuştin.

Pênûs, çi qasî tûj bin; ji bo birînen civakê û ji bo dujminên civakê wê ew qas bi tûn û tesîr bin.

Yanî birîndarên nivîsê encax birînen civakê rehet bikin. Lê belê, ji "yên din" re azadî; fantazyayeke feodalî ye, qezenceke kapîtalî ye, rûmeteke emperyalî ye, ne tiştêkî din...

Hibra Kurmancî, do wek navgîneke vegotina teolojîk bû û îro jî wek navgîneke vegotina îdeolojîk e. Ne lêrasthatinek bû ku edebiyatvanên do mele, seyda, şêx û feqe bûn û yên îro jî di bin konê dîmena bizavên polîtîk de dihevin. Jixwe teolojî jî di tabloyeke fireh de dibe îdeolojî, ne ku tu kes van elementan înkardike û rewşeke depolîtîze diparêze di vê konjonkturê de. Lê karaktera edebiyatekê û edebiyatva-

nên wê, ne ew qas nizm, teng kin û sivik e ku bi tenê ji du têgehên primîtîf biafire. Têgeha edebiyatê; têgeheke weha ye ku, têgehên jiyane gişan di bin baskên xwe yê albatrosî de disitirîne.

Em ê sûretê xwe di gola hibrê de bibînin; aliyên xwe yê çê û yê xerab, ên nexweş û yê xweş em ê di gola hibrê de bibînin û em ê laş û ruhê xwe li gor vê dîtinê ji niv de bixulîqînin.

Wê portreya me ji gola hibrê biberiqe. Bi vî awayî em ê xwe nas û destnîşan bikin û bi vî awayî em ê xwe ji udrên xwe xalî bikin. Têkiliya me ewil wê bi me re çêbibe, em ê bi destên xwe, beden û ruhê xwe bipelînin, bi zimanê xwe, ji hundirê xwe tahm bikin. Berî herkesî em ê diyalogê bi xwe re dînin, berî herkesî em ê bibin dergîsiyê xwe. Em xwe nas nekin, em ê tu kes, tu çik û tu tiştan jî nas nekin, berî naskirina tiştên din wek "tişt" hewce ye em xwe nas bikin, naxwe em ê nebin tu "tişt". Heta em bi siya xwe re nepeyivin û em bi xwe re têkiliyê danînin, em ê heta mirinê ji xezîneyên hêja yê hundirê xwe ne haydar bin û em ê li pey hêjayiyên hundirê kesên din bin. Yanî em ê ne "xwe" bin, em ê "yekî/a din" bin.

Her bireser encax piştî têkilîdanîna mirov a bi wê re nirxdar dibe. Wek mînak "genim", heta mirov genim nenase, mirov xusûsiyet wî; fêde, başî, bedewî û qelstiyên wî fahm neke, ji mirov re bêmahne ye,

ji mirov re tune ye; çawa mirov xwe nenase ji xwe re bêmahne û tune be, ew jî welê, çawa însan genim nenase wê jê mahrûm û birçî bimîne; xwe nas neke wê ji xwe jî mahrûm û birçî bimîne. Însan divê ji tenûra dilê xwe nanê xwe bixwe; yan na divê bi xwarina kurtêlên nanê ceh ên kesên din qîma xwe bîne.

Genim (hêjayiyên xas) ku mirov nizanibe di axê de şîn tê, hewcedariyên wî ji avê, ji tavê, ji bê û hwd heye, hay ji usula çinîna wî, ji hêrana wî, ji hevîrtirşê wî, ji lêxistina wî tunebe, mirov nikare jê îstifadeyê bibîne; û hay ji faktorên asteg ên ji bo şînhatina wî tunebe wê nikaribe wî biparêze jî. Ango însan, genim (berhem-edebiyat-çand) nas neke nikare jê fêdeyê bibîne, herwiha tahma wî nizanibe nikare jê hez jî bike û nikare wî biparêze jî. Heke ferdek fenomenekê nenase, ew fenomen ji bo wî tune ye. Wexta ku mirov jî, xwe wek genim bihesibîne, ku xwe nas nekiribe, wê tune be. Di çarçeweya vê sondajê de, "hebûn" di "xwebûn"ê de ye.

Belê, rewş, derfet û merc ne ew qasî lihevhatî ne ji bo muptelayê hibrê, lê genim-ku me ew weke muptelayê hibrê da sembolîzekirinli ser sergoyan baştir şîn tê, anga ji bo berhemên baş û berhemdarên baş platform ne girîng in.

Heta mirov ji genimê zadê ruhê xwe têr nan nexwe dê ruhê mirov hertim birçî be.

Pêvajoya nivîsandinê bi normalî

jixwe bi kaos e. Belam ev kar di civaka kurdan de; kaosa kaosê ye. Civak ji ber di her alî û her warî de, bê deng û bê reng maye; herimî ye, gemarî ye. Hemû têgeh (hêvî, evîn, serbestî, xeyal, hevaltî û hwd) edem bûne û ji dînamîkên xwe yên orîjîn bi dûr ketine. Arthur Rimbaud digot, "Em ê heyatê biguherînin bi helbestê", hewcedariya heyata Kurd jî ji guherîneke xas heye. Û ev guherîna xas jî encax bi hibrê were pê. Hemû têgehên gemarî divê yek bi yek bi hibrê bîn şuştin û ji ser û nivde heyat bi van têgehên bê lêkirin. Dibe ku civak bahreke herimî be, lê gerek e muptelayê hibrê, paleyê bergehên ciwan be. Wek ev gotina Rilke: "Ez dilopek bim, ez ê tev li bahrê nebim, bila bahr tev li dilopa min bibe" hewce ye ku muptelayê hibrê tev li civaka dejenere nebe, civaka dejenere tev li dilopa xwe ya orîjînal bike û vê behra gemarî di nav dilopa xwe de paqij bişo.

Felaket û êş girêdana di navbera ferdên miletekî de gelekî xurt dîkin. Ango neteweyek bi êşên xwe yên hevpar dibe netewe. Kurd xwedî êş û felaketên mezin in, divê Kurd bi qasî vê mezinbûnê miletekî mezin bûna, ji bo mezinbûn û serbestiyê ev jan divê xweş û baş bîn nirxandin. Tiştên mirov diêşîne, ku ev êş (enerjî) belasebeb heba dibin. Êş, ji ber bi kêrnehatina xwe diêşe! Ji enerjîya trajedyayên kurdan civakeke gelekî rewnaq diafire.

Ji kêmbûna pîvana hibra kurdan, xêva (hafize) wan qels maye û mixabin bîlançoya trajedyayên xwe nizanin.

Serbestî, di tahlîlkirina êşan de ye, yanî jan jiyan e û jiyan jî mazûbanê têgehên gişan e.

Kesayet û civak ji janên xwe difirin, zaniyar û mamosteyê herî pisporekî jan e û ev pisporî di her quncikê heyata kurdan de heye. Kurd êşên xwe baş rafîne bikin, wê gelek tiştên bedew bi dest bixin, ew tiştên ku heyatê dîkin heyat... Naxwe wê wek a niha Kurd dîsa bêhimdî xwe bijîn û wê bêhimdî xwe bimirin!

Erezyona Zimanê Kurmancî ku bi vê xezab û jakawiyê bidome, sibêro em ê bibin kurdandayên peyvên Kurmancî û ji xeynî neynik û fotografên berê, kesekî/e em ê karibin pê re diyologê dînin dê nemînin! Ji lewre muptelayê hibrê divê weke gerîlayê peyvê bixebite û cehdê bike. Jixwe helbestkar gerîlayê peyvê ye û cebîlxana wî jî îmajên wî ne.

Helbest, faktoreke karîger e, ji bo afirandina jiyana civakeke estetik û sofîstîk. Ji ber ku, helbest: li lûtkeya çiyayê Olympos qîrîniya êş, evîn û serbestiyê ye.

Piştî edebiyateke, hunereke mişt xeyal û bergeh, diyardeyên (fenomen) ferd û civakê bi tevn û bi movik dibin; derzikeke piştê û kompozîsyoneke lihevhatî û serwest ji wê civakê derdikeve.

Serketin û serbestiya şêir û edebiyata Kurdî -ji ber xezîneya krîzî û

kaosî ya heyata Kurd-wê rê li ber helbesta xetimî ya Ewropayê jî ve-ke û herweha wê edebiyata cîhanê jî bi reng, deng û tahma xwe dewlemend bike. Helbestkar û wêjekarên Kurd bi vê potansiyela kaosî-jiyani xemilî û mişt in.

Jiyan û xwezaya civakan li gorî hêmayên (îmaj) wan didirûvin. Civakên xwedîhêmayên kûr, xweşik, xas û serbest; xwedîheyatên kûr, xweşik, xas û serbest in. Civakên xwedîhêmayên nizm, kirêt, sixte û bindest; xwedîheyatên nizm, kirêt, sixte û bindest in. Ji lewre, di helbestê de hêmayên-xeyalên baş, delîlên mejiyên bilind û heyatên mezin in.

Bajarvanî û kultur di peyvan de tîn kodkirin û nîş bi nîş tîn dewrkin. Her peyvek di hundi-rê xwe de, bi qasî însanên bi wê peyvê peyivîne, însanan dihewîne; tunekirin û pelçiqandina wê peyvê, tî wateya qetla hemû însanên bi wê peyvê peyivîne.

Heke peyvên heyî di navbera du bergên ferhengan de asê bimînin, ji wan peyvan re pêvajoya sêkratî dest pê dike, ango berhevkirina sîstematîk û pîrbûna bendera peyvan a di ferhengan de, ji zimanekî re heta cihekî sûdewar e. Heke peyv heta wextekî dirêj di ferhengan de asê bimînin ew peyv wê bifetisin. Mesel e ew e ku, her peyva ji qulîk û ji quncik û ji ser serguyan hatiye berhevkin, tev li he-

yatê bibe, di heyata însên de rolên aktîf bilêzin, bijîn bi her awayî û her şiklî. Her peyv divê di destên edebiyatvên de wek zîvekî be û edebiyatvan bi nazenîniya zîvkerekî û ronkaya çavan li ser wan bixebite û wan ji toza wan a dîrokî, ji gemara wan a feodalî ewil dezenfekte bike û dû re şikênandin û tahrîbatên wan restore bike.

Adorno gotiye “civaka feqîr an jî kesê feqîr piştî wextekî ji birçîbûna zimanê xwe dicû û dixwe” Civaka kurdan jî ji feqîrî û bêçaretî peyvên xwe wek şîv û firavîn xwar, an jî bi me dan xwarin. Lê em baş pê dizanin ku civak an jî ferd bi qasî gewîtiya çahla peyvên xwe xwedî bergê û persifektîfên rengîn û mezin e.

Îro çî bigirin şênber-razber her peyva Kurmancî herimî ye. Bi tenê siluwetên peyvan xuya dibin. Bi hêza hibrê û muptelayê/a hibrê ev peyvên herimî û nexweş wê bîn rehetkirin û kewandin. Helbestkar, kêmxwînbûn û kêmrûhbûna van peyvan wê bi ruh û xwîna xwe temam bike û wê wan li ser struktura wan a esil û esil bilûsîne, ji lewre divê xwîn û ruhê edebiyatvên pîr be.

Muptelayê/ya hibrê kî ye?

Dilketiyê/ya xelanên xas e.

Û muptelayê/ya hibrê; yê/ya ji hibrê afiriye û hibr afirandiye ye.

Ewledê cimetê

Meha zivistanêye ortê bû. Wê rojê gundî qet ji mala Çeto kêm nedibûn, çimkî ew mehekê pêşda nexweş ketibû, lê îro halê wî zef xirab bibû. Ew îdî, çawa dibêjin, bethal bû. Gundî ser cînarê xweda diçûn, meriv tirê, ewana xatirê xwe ji wî dixwestin.

Îro ji gişka zeftir bira-pizmamêd Çeto û kulfetê mala wî melûl bûn. Kulfeta Çeto-Gozê kêleka helalê xwe rûniştî bû, nedihîşt, wekî ew lihêfê ser xwe bavêje, xûdana wî pê pêjgîrê temiz dikir û zû-zû stegana avê ser zarê wîda dikir, sêv, hurmê tûzî-tûzî dikir bi zorê didayê. Ew derdê dilê xwera digot û dilûband, xweda dişewitî, çimkî mêrê wêyî cahil nava tunebûnê û zelûliyêda dimre, lê xêncî mirina mêrê xwe ew usa jî ketibû tefekûriya wê yekê, wekî halê zarêd wê, wê çawa be? Çimkî hela destê mêrê wê serê wana bû, îdara zara usa jî nedibû, lê wextê ew îdî ortê here, halê wana gelo wê çawabe?

Ew hertim dixebitî, wekî melûliya xwe ber Çeto dihar neke, ewê car-cara mêrê xwe tenê dihişt, diçû diket tewlê, yanê kox têr digiriya, paşê dihat kêleka mêrê xwe rûdinişt, dilminî didane ber dilê wî.

Gundî hev diçûn-dihatîn, ewana ji bengzê nexweş tê derxistin, wekî ew sibê nakeve.

Paşî xêleke şevê gundî hêdî-hêdî belayî malê xwe dibûn, lê bira û pizmamêd wî, cînarêd wî yê nêzîk dûrî nexweş nediketîn, ewana bi sirê diçûn qasekê serê xwe data-nîn, dîsa dihatîn dora nexweş.

Ji nîvê şevê şûnda nexweş çiqas diçû, diha berteref dibû, ewî xwexwe jî tê derdixist, wekî ew îdî yê mirinêye, bona wê yekê jî bi desta eşaretî da kulfeta xwe, wekî ew bê kêleka wî, û çawa dihatê kivşê, ewî dixwest temiyê xwe bida kulfeta xwe, bira û pizmama. Wextê kulfeta wî hat ser ciya rûnişt, ewî got, wekî kurê wî Karapêt jî bînin kêleka wî.

Wextê gişk hatin kêlekê rûniştin, ewî kurê xwe nihêrî û kesereke kûr rahîşt.

Meriv tirê ew dibêje: "Lao, gunê te tîfalî çiyê, wekî nakada şûşa dilê te dişkê, toqê malêy giran dikeve stukura te. Gelo tu zanî... Gelo tu haj pê heyî... Gelo tu tê derdixî çi çetinî, çi belengazî pêşiya te sekiniye?"

Belengazî çûka jî zû pîr dike. Wexta kur hate kêleka bavê sekinî, ew zûrbû bavê xwe nihêrî û nolî mezina kesereke kûr hatê. Bavê wî bi nerm gote koma dora xwe:

- Ez bimrim, tenê du kul dilê

minda diçine gorê: Ez tu cara ber mirina xwe nakevim, ez ber wê yekê dikevim, wekî ez tunebûnêda dimirim û kulfetê xwe jî tunebûnêda dihêlim. Kula dinê ewe, wekî min haqas Karapêtê xwe hiz dikir, lê ew mezin nekir û negîhande mirazê wî. Ewî paşî wê yekê dixwest temiya tîfalê xwe bida wan, lê giliyê wî nîvcî ma, serê wî ser milê jinêda xarbû, mir..

Roje ewrayî bû, mij û dûman, te digot, qey tebiyet jî ketiye tefekûriya hêsîrê Çeto. Bayê sar dihat, berf dibarî, neyîse dikire bager. Ji hişkiyê hela dûrva çirke-çirka lingê meriya dihat û xeberdana wana meriv tesele dibû. Gundiya ji hev dipirsîn:

"Gelo tu nizanî qet Çetoî çawanê?" Çend deqê dinê şûnda temamiya gund pê hesiya, wekî Çeto miriye.

Hema wê rojê gundiya tivdarek kir, tirba wî kolan û ew heq kirin. Gundî hersê rojê pêşin çiqas êvar bû, diçûne mala Çeto, serxweşî didane kulfeta wî, ber dilê wan didan û şîret wana dikirin.

Gozê paşî mirina mêrê xwe reş wergirt û kîderê bêjî nexebitî, mala kîjan dewletîra zibaretî nekir, dew nekila, kinc neşuşt, nan lênexist û tevn-teşî nekir, wekî bikaribe parî nan tîfalê xwera destxe.

Karapêt wextê bû 12-13 salî, şivanê gund ew kire dūajoyê xwe û salê heqê wî 3-4 berx didayê. Gozê kurê xwera firnax dibû û digot: "Şikir, kurê minê çend salê dinê şûnda îdî bixebite, emê ji vî emirê nemirnejî xilaz bin."

Lê hela çawa dibêjin, Karapêti bin bêjing bû, ku bext wîra çep zîvirî û îjar jî diya wî nava tunebûnê û belengaziyêda mir û stûyê wî xarkir.

Mirina dê gelekî hukumî ser tîfal kir, niha ew etîm bû hin aliyê bavêda, hin jî aliyê dêda.

Herge wextê bavê wî mir, ew biçûk bû û hela her tişt rind fem nedikir, alîkîda jî destê diya wî ser serî bû, bona wê yekê jî ewî ewqasî tê dervedixist, wekî ew etîme, lê niha ew îdî fem dike şîrnaya dê û bava, çetinaya halê xweyî giran.

Paşî mirina diya wî, cehebî li tîfal dikir jina kurapê wî Qutê.

Qutê jî mînanî dayika wiya helal ew xweyî dikir, şîret dikir, wekî ew paşî mirina dê-bavê xwe rabe û dûyê ocaxa kal-bava berde.

Tav epeceyî bilind bibû. Çengê nolî ewrekî qerqaş xwe dabû pala çiyê. Karapêt, serî berda, hêdîka nava gundda derbaz dibû û îza lingê xweyî biçûk ser berfê dihişt. Dihate xanêkirinê, wekî halê wî gelekî çetine, ew gelekî ber xwe dikeve. Lê şuxul usa zîvirî, wekî deremeke şabûna xêrê kete dilê wî û guman da wî. Çawa dibêjin, dinê bêy meriyê qenc nabe, deriyê dayî namîne.

Gundda merîkî xwendî hebû, navê wî Qanat bû. Ewî çend zarê gund hînî xwendinê dikir. Vê demê nava gundda ew rastî Karapêt tê, dilê wî ser dişewite, ew dixwaze bi teherekî alî wî kurkî bike.

Qanat, ku merîkî aqil bû, dest xweda tê derxist, wekî Karapêt kurêkî merifete, wekî yek hebe

xweyiyê lê bike û wî bide ber xwendinê, eseyî merîkî eyan wê jî wî derê, çawa dibêjin: "Bexê çê hela berkozê çêye..."

Bona wê yekê jî çawa ewî, usa jî gundiyê mayîn komek dane Karapêt û ew şandine gundê Qundexsazê xwendinê.

Karapêt wextê çû mektebê ew îdî 13-14 salî bû û çawa dibêjin reş û sipî hev vedibijart, hêdî-hêdî qencî û xirabiya dinê jî fem dikir. Paşî xwendina çend sala, Karapêt tê derxist, wekî tenê mekteba gund têra wî nake, wekî gelek pirs hene, ku wîva neyanin, ku ew wan pirsan bizanibe, jêra lazime xwendin. Paşî mektebê ewî xwera kitêb dest dixistin û dixwend, zanînê xwe zêde dikir.

Halê jinapa wî -Qutê bere-bere xirab dibû. Raste, ewê gelekî dixwest, wekî kurê tiyê wê bixwenda, lê paşwextiyê bona xwendinê pere dixwestin, zarê wê hûrbûn û qeweta wê nedigihîştê, wan pera bide.

Karapêt xwendina xwe dihêle û tê gundda hodaxiyê dike, lê paşê jî diçe gundê Kûçakê li nehiya Aparanê xulamtiyê dike.

Sala 1919...

Ew sal dihatine hesabkirinê salê roja reş. Hukumeta Daşnaka sîtar li cimê nehiştibû. Şîn û girî, girtin û kuştin welat hingavtibû. Molet li cimê hatibû birînê. Lê wan rojê serda cimê gumana xwe nedibirî, hêviya tişteki bûn. Ewana zanibûn, wekî bi serkariya Lenînê mezin pale û gundiyêd xebatkar Ûrisêtêda dewlet hildabû destê xwe, Ûrisêtêda tava azayê

derketibû û ew hêviyê bûn, wekî pencê wê tavê şemala xwe bide wana jî. Hetanî kal û pîra jî, yêd ku nikaribûn ji mal derketana, ewana jî deng û besa dihesiyan, digotin, wekî dîwana Daşnaka gelekî nakişîne, wekî cimet bin giraniya wê nemamtiyêda nikare temûl bide, û heger van nêzikaya guhastin nekeve nava halê cimetê, bizanibe dilê wê cimetê bûye kevir û tu tiştî nahise. Lê çawa cimeta ermeniya, usa jî cimeta kurdaye xebatkar zanibû, wekî cimeta ûrisaye mezin tu cara wana bîr nake û wê bê hewariya wana.

* * *

Sala 1920.

Payîza derengî bû. Bextê gundiyara wê salê zivistan jî zû hati-bû, alîkîva debra heywanê wan tunebû, alîkîva jî zimêrê wan xilas bûbû. Tunebû malek, wekî nexweşek, yanê dudu nava çiyada nîbûna, wê salê hal notla elkeke decalgund bi gund digeriya û derê her malekê dukuta. Meriv tirê tebîet jî cimetêra bibû dêmarî û berê xwe ji wê guhastibû.

Çiqas roje her gundekîda him ji xelayê, him jî ji hal 7-8 meriv dimirin...

Çiqas roje gundiyêd ku ji bajarê Tilbîsê û bajarê mayîn dihatin, dîsa û dîsa mizgîniyê teze danîn derheqa Revolyûsiya Oktyabrêda û dewleta pala û gundiyaye tezedâ. Ewana dibihîst, wekî eskerê ûris bi serkariya Bolşevîka berbi Kavkazê tê, wê zûtirekê bigihîje Ermenistanê jî.

Karapêtê cahil jî van mizgînara

şa dibû, ewî jî aliyê xweda gundi-yê mayînra derheqa qewimandinê Ûrisêtêda digot...

Sibe bû, ji ser gund mija sibê teze hilatibû, ro ber ewrara car-car derdiket û pencê xweyê sist davîte ser çiya û deşta Elegezê. Hema wî çaxî ji aliyê çiyayê Cengêda dengê top û tivinga dihat û ew çiqas diçû, diha û diha nêzik dihatê bihîstinê.

Gundiyê belengaz dîsa ketibûne hev, digotin, wekî dîsa şere, halê wan wê diha xirabbe, çimkî cimeta belengaz nava 2-3 salada çend şer dîtîn, ewana çendik-çend cara aliyê Roma reşda hatine talan-tajankirinê, çiqas û çiqas meriyê am û tam hatine kuştinê, çiqas bûkê rûbixêlî mane bî, çiqas mal hatine mîratê, çiqas zar mane etîm...

Bona wê yekê jî ewana tiştekan zanibû, wekî kar ji şera nayê, îlahî ew çiqas ziyandare bona cimeta xebatçî. Temamiya şevê dengê gulla kêmbû, ew çiqas diçû, haqas nêzikî gund dibû. Dûrva gullê topa notla pilte agirê sor nava hewêda dihatine xanêkirinê. Qurf ketibû dilê gundiya û ewana wê şevê qet neketine nava cînivîna.

Sibetirê wexta çenga sibê-mija sipî hêdî-hêdî ji ser pala Elegezê hildihat, û rê ji ber çiyara bilind dibû, eskerê Daşnaka, çawa ew nav dikirin eskerê rûta, direviya, ewana usa xwe unda kiribûn, wekî yekî yê dinê nas nedikir, yê tivinga xwe davît, yê hûrmûrê, ku ji gundiya talan kiribû davît, ewana dicedand, wekî hema serê xwe xilazkin, lê sereskerê wana hela evarda

revî bûn.

Gundiya ji wana dipirsî: "Çi qewimiye, hûn çima direvin?" Ewana ancax pêra digîhand, digot: "Ûris tê, ûris."

Eva mizgîna notla birûskê nava gundda bela bû, te tirê germek ke- te dilê cimetê, ew ji xewa xeder veciniqî û hêsa bîna xwe kişand.

Cimeta gund bi jin û zarava topî bêderê binya gund bibû.. Ew hêviya mêvanêd xweye ezîzbûn.

Çend deqe şûnda destê siyara, koçêd firgûna û peya hatine xanê- kirinê. Ewana berbi gund dihatin, lê cimeta gund jî pêşiya wanda di- çû.

Wextê esker nêzîkî cimetê bû, Karapêt, ku navê Lenînê mezin hela zûva bihîstibû, dest xweda ki- re gazî, "Bira bijî Lenînê mezin, bav û birê cimetê! Bira bijî Revol- yûsiya Oktyabrê!"

Ehiliyêd gund wê demê ecêb- mayî man, wekî Karapêt haqas gi- lî-gotin, zimanê ûrisî kîderê hîn bûye.

Meriyêd extiyar bi edetê kal û bava nan û xwê birine pêşiya wa- na. Qumandara derbêra nan ji des- tê wan girtin, ew ramûsan û xarin.

Paşî wê yekê ewana destê xwe kirine destê cimetê, bi zarara şa dibûn, hineka şekir, totik ji torbê xwe derxistin û didane zara.

Cimet û esker haqas zû nêzîkî hev bûn, wekî meriv tirê ewana nasê çendik-çend salanin.

Karapêt û gelek gundiye mayîn ûrisî rind zanibûn, ewana ji qu- mandara derheqa Lenîn û dewleta pale û gundiya pirs-pirsiyar di-

kirin.

Hema wê demê qumandarekî telyanî tûnsizî çûrî-çeşel, çavne sût lê, kumekî tûjîkî li sêriyada, stêrkeke pîneye sore mezin li ser kumê wî, ya ku te digot qeyî stêr- ka azayê geşe, li merivê feqîr û belengaz dîhar bûne, pêşda hat.

Ewî yaşirmê patrona çepo-ras- to avîtîbû stûyê xwe, çeltekî qayî- şî biçûk kêlekêda bû. Ewî destê xwe avîte qayîşa çelteye zirav, bi beşereke xweş, bi zimanê ermenî cimeta dora xwera awa qisekir:

"Lenînê mezin we silav dike û çavronkayê dide we, wekî hûn ji qetlê azabûn.

"Pale û gundiye Ûrisêdê bi pê- şikariya Partiya Bolşevîka, bi ser- kariya Lenînê mezin dewleta çar- rîzmêye qetlê welgerandin û dew- leta xwe çêkirin. Ewê dewletê qi- rar derxistiye, wekî şer ji ortê bide hildanê, xweliyê ji destê milkeda- ra bigre bide gundiya, lê zavoda bide pala, gerekê xulam û axa jî tunebin, zarê hemû pala û gundiya bê heq bixûnin.

"Hemû millet dibine birêd hev. Sûd û gilaviyê bertîlxur jî ji ortê têne hildanê, vir hada cimeta gun- dê we jî wê vî emirê teze derbaz- ke, gerekê hûn xwera serkarê gun- dê xwe bibjêrin, şerkariyê pêşberî dijminê dewletê bikin, komekê bi- dine dewleta xweye teze, gundda teşkîleta komsomola û partiyayê bidne teşkîlkinê. Lenîn temî da- ye, wekî miqatî hukumeta xwebin, wê nolî ronaya çavê xwe xweykin. Lê hûn bibaxşînin, wekî em ji gundê we zû diçin, hûn zanin hela

gelek cî mane, wekî neazakirine, gerekê em wana jî azakin.”

Qumandar usa jî çend temiyê mayîn da gundiya û destûra xwe ji wana xwest.

Paşê ewana beyraqê sor dîsa bilind kirin û bi kilam ji cimetê dûrketin.

Ew qasek bû, wekî cimet ji ciyê xwe nedihejîya û ewana bi hevra qise dikirin derheqa wan giliyêd tezeda, ku şabûn kiribûne dilê her xebatçîkî. Hema wê rojêda qurf kete dilê Selîm û pîr Delo.

Ewana wê şevê mala Selîmê dewlemendda top bibûn û ro dikirin, dipîvan, gundiya zanibû, wekî tevgirêdana wana Daşnakara hebû. Gele cara, wexta gundîkî miqabilî Daşnaka gilîk bigota, yanê jî çêrî wana bikira, Selîm û Delo elametî didane Daşnaka, çendekî şûnda ew gundî digirtin.

Niha wexta dîwan ketibû destê gundiya, ewana ditirsiyan û her tişt dikirin, wekî dîwanê hildine destê xwe.

Lema jî ji roja hukumeta sovyêtiyêye pêşinda ewana tiştêd xirab, şer û şiltax derheqa dewleta sovyêtiyêda bela dikirin.

Lê cimetê tu cara ji şer û şiltaxê wana bawer nedikir, çimkî ewana roj bi roj lezeta dewleta sovyêtiyê didîtin, çawa bona hemû cimeta, usa jî bona kurda emirê teze dihate çêkirinê.

Hukumetê cahil dişandine Moskwayê û Lênîngradê bona xwendinê, bi gilîkî kurdê koçere berê dibûne xweyê kûltûrayê, bere-bere xweliyêva dihatine girêda-

nê û emirê kûltûrî derbaz dikin.

Emir usa jî Karapêtê cahilra ke-niya. Rasthatina Eskerê sor tu cara bîra wî nedîçû.

Giliyê qumandarê eskerê ûris mîna mîxekî serê wîda rûniştibû, yê ku gotibû, wekî komekê bidne dewleta xweye teşkîlbûyî, çimkî hûnin xweyê vê dewletê, emirê teze çêkin, şerkariyê bikin pêşberî dijminê sinifa pala û gundiya. Karapêt zanibû, wekî bona qewînkirina wê dewletê lazime têkeve nava partiya Lenîn, ya ku bona xweşbextiya cimetê şerkariyê dike. Hema pey testîqbûna qeydê sovyêtiyê Ermenîstanêda Karapêt sala 1921-ê dikeve nava cêrgê Partiya Bolşevîka û xwe temam pêşkêşî şuxulê çêkirina sosyalîstiyê dike. Sala 1922-a hukumet û cimet dibîne, wekî Karapêt bi dil û can bi helalî bona wan dixebite, bona wê yekê ewî dibjêre çawa sedirê rêvkomê.

Ew dibîne, wekî bi merîkî yanê jî çend meriya gundda çetine, ku emirê teze çêkin, qaweta gundiya belakiriye.

Lenînê mezin temî dabû, wekî qaweta xwe topkin. Tenê wî teherî ew dikarin emirê teze çêkin. Sala 1923-a ew gundda cahilêd egin top dike û teşkîleta komsomola saz dike. Teşkîleta komsomola Karapêtra tevayî gundda xebateke mezin dike pêşberî kedxura, pêşberî edetê kevn, miqabilî qelen û paşmayî-nêd mayîn, yêd ku ziyaneke mezin didane pêşdaçûyina kûltûra kurdaye teze.

Ewî ber çavê xwe dîtibû halê cimeta xebatkare belengaz, bona

wê yekê jî ew dikete tefekûriya wê, ew gundiyê, ku xweliya wî tunebû, xwelî didayê, yê toximê wî tunebû toxim didayê, dikire ser dewletiya, wekî ew bi kotanê xwe ekin-tîknê kal-pîra bikin.

Sala 1924-a serwêrtiya nehiyê dibîne xebata Karapêta baş, ya ku ewî gundda dikir, wî pêşda dikişî-nine ser xebata dinyêye cabdar. Ew ji sala 1924-a heta sala 1930-î nehiya Hecîxelîliyêda dixebite çawa serwêrê komîteya komekdayînê, dewsgirtiyê sedirê komîteya şuxul kirinêye nehiyê.

Karapêt vira jî çend cara tê bi-jartinê çawa uzvê buroya komîteya partiyayê û uzvê komşuxulkira nehiyê.

Vê xebatêda jî Karapêt komeka hertimî dida gundiyê xebatkar. Xebata propagandîstiyê nava cimeta kurda û ermeniyada dikir, ewî berk şerkarî dikir pêşiya paşdamayînê berê, pêşiya kedxura û kûlaka.

Karapêt bi serkariya teşkîletêd partiyayê gundêd kurdada mekteba dide vekirinê, klûb û kitêbxana dide teşkîlkirinê, gelek xortê kurda dişîne Moskvayê, Lênîngradê û bajarêd rêspûblîkayêye mayîn xwendinê.

Niha her gundîkî Kervansarêyî sere rind bîr tîne emekê xebata Karapêt di çêkirina xan-manêd zavoda şîrê du qatêda, bona çêkirina aşê egir.

Bona xebata Karapête efatiyêye baş xebatkarê nehiya Hecîxelîlê sala 1926-a ew bijartin çawa uzvê Komîteya Pişkavkazêye şuxulkirinêye merkeziyê, vê derecêda jî Ka-

rapêt da eyankirinê helaliya xwe berbi cimetê û partiyayê. Ew hertim diçû nava cimetê wanara xeber dida, guh dida ser pêşdanîn û xwestinê wan û temiyê cimetê hertim digîhandine partiyayê û dewletê.

Sala 1929-1930-î partiyayê pirs pêşda kişandibû, wekî kolxoz teşkîlkin û kûlaka çawa sinif bidine hildanê. Karapêt bi serkariya nehiyêra tevayî şerkariya berk teşkîlkir pêşberî kûlaka û elêmêntêd eksî-partiyayê, yêd ku provakasiya teşkîl dikirin pêşberî qeydê sovyêtiyê û derheqa qeydê kolxoziyêda şer û şiltax bela dikirin.

Ew diçû gundê kurda û derheqa kara kolxozê gundiya daklad dixwend û dida kivşê, wekî gundî ji kesîbiyê û tunebûnê dikarin bi temamî derkevin, wekî ewana ji tunebûnê derên tenê rêk heye, ew rîya kolxoziyêye.

Sala 1930-î yekê gulanê bû, xebatkarê gundê nehiyê bi siyarî, firgûna û peya berbi merkeza nehiya Hecîxelîlê dicedandin. Îro gişka xwe xemilandibû, ken û eşq ser lêvê gişkabûn. Ewana diçûn merkeza nehiyê, wekî tevî mîfînga xebatkaraye yekê gulanê bin.

Hema wê rojê mîfînga xebatkaraye 1-ê gulanêda derheqa siyasetiya partiyayê gundda Karapêt bi daklad pêşda hat.

Wira jî ew nava vê daklada xweda hûrgilî sekinî ser siyasetiya partiyayê li gundda, derheqa sazkirina qeydê kolxoziyêda.

Karapêt bi kel xeberdida, ewî meselê usa danîn, wekî şiklê kol-

xozê ber çavê hazira dihate xanêkirinê, ewana didît, wekî xebata te-vayî kareke mezin wê bide gundiya. Lê gundî ji wî kûpê reş-traktorê ku anîbûne deştê zendegirtî ma-bûn. Kotaneke dugîsnî avîtibûne pey, girme-girm bû, nava zeviyada diçû-dihat û xweliya reş weldigerand, Karapêt destê xwe dirêjî wê traktorê kir û got:

Binhêrin avaye, vêra dibêjin traktor. Ewê dewsa ga wê wera şova bike, nanê we bikute, çandiniya we wê nava wedekî kinda kutake, ekinê we dêris nabe. Lê ew gundi-yê gayê wan tune, traktor wanara dibe gumaneke mezin. Diha hûn stûkûra xwe ber tu kesî xar nakin. Bese wekî lingê gundi-yê xebatkar ber derê kûlakabe.

Dihate xwenêkirinê, wekî kêlma wî hukumekî mezin ser tevgelê wê mîtingê hişt. Wê mîtingêda bûn usa jî wekîlêd kûlaka. Her gilîkî Karapêt nolî niza dilê wanara diçû xwar. Emir nîşanda, wekî hukumeta sovyêtiyê tenê dikeve tefekûriya cimetê, û ew çî ku aliyê wê hukumetêda tê kirinê ew bona xweşbextiya cimetêye. Çî ku hukumet dide pêşiya xwe, eseyî wê biqedîne, tu qawet hukumeta sovyêtiyê nikare bide sekinandinê. Kûlak ew merîne, yêd ku gayê xwe didine gundi-yê belengaz, wekî ew pê çandiniyê bikin, lê dewsa wê nivê ekinê gundiya jê distînin, ewana ew merîne, yêd ku emirê xweda destê xwe navîtine maça cot, neçerçirîne, lê ji hemûya çêtir derbazkirine. Ewana

ew merîne, yêd ku tirsê li gundiya difirînin, zorê li gundiya dikin, giliyêd netê derheqa hukumeta pale û gundiya bela dikin.

Kutasiya daklada xweda Karapêt got:

- Em gişk berbi kolxozê! Bira undabe sinifa kûlaka!

Evê dakladê hukumekî mezin ser xebatkara hişt. Keskî diha guh nenida kûlaka û xeberdana wana. Çend gundî ber wanara derbaz dibûn û digotine wana: "Meriyêd xûnxure durû gerekê diha neyêne nava me."

Wekîlê kûlaka diha tê derxistin, wekî ewana wê rojê lap hatine belûkirine û ewana qîrar kir, wekî çî cûreyî hebe Karapêt ji ortê bidine hildanê.

* * *

Êvar bû, bîna bayê biharêyî sar dihat, nava wê hewa temizda xulexula avêd belekiya li meriv tesele dibû. Hema wî çaxî Karapêt bi kêf û eşq şuxulê xweyî komunîstiyêra firnaxbûyî ji merkeza nehiyê vedigeriya gund.

Hema wê şevê dijminê sinifê rêva bi xayîntî Karapêt digirin, destê wî piş piştêva girêdidin, dibîne eylêd nehiya Axûryanê û dukujin. Wextê Karapêt dikeve destê dijmin, dijminê nemam wî gelekî didine çerçerê, lê ew mîrkîmî pêşiya wana disekine û tu cara navê komunîstiyê nizm nake.

*Werger ji tîpên kîrîlî:
Serdar Dicle*

Kawa Nemir

Amadekarî

Balindeyê baz li serê zinarekî bilind danî.

Per û baskên xwe dawêşand ji qiraviyê, ji xunavê.

Dûrbînê diavêjin bajarê li ber devê newala kûr,

ku lîlav û zinav dikişin di ber qundaxên tivingên wan re.

Li vir, li vê pala ku asmîn vedikin,

gonî zêde dibin di nava şûnpiyên daristana gumre de.

Nîn e hêviya me ji viyanan, li vê hêwrê, li vî zozanî.

*Ne pûtekî ku em li ber bigerin, ne derfeta daçikandina peykerê
helbestkarekî.*

Difişirim ez, lo baz!

*Fermo, biçe seriyekî du seriyan li ser serê alayê
bifire.*

Gerî gerî berjêr bûn bi hatina sêlûbêla êvarê re.

Têderxistinok

- 1- Serî dar e binî qul e
- 2- Ez çiya, tu çiya, golik ma bê giya.
- 3- Tiştê min tişt e, ser avê diçe bê ling e.
- 4- Tiştekek heye bê penî, xwexwe diçe ser banî.
- 5- Ez çûm serê milekê, berê xwe da çalekê, tijî bûkê salakê.
- 6- Çiqas buhar tê ew pêşiyê der tê.
- 7- Erdê radike, diçe û dû dike.
- 8- Xanîkî şuştî-muştî, bûk tê da rûniştî.
- 9- Meriya bilindtir, dîka nizimtir.
- 10- Sîtil dar e, agir av e, ya dikele xav e.
- 11- Her-her dîwar, mermer dîwar, xatûn yeke, carî hezar.
- 12- Tiştekekî min heye tiştanî, ber kevirê xîştanî, ne pê ye, ne penî.
- 13- Dîkim dîke du pê me, ser xaniya diçim - tême, kes nizane kurê kê me.
- 14- Vî alî kaş, wî alî kaş di navda topek qumaş.
- 15- Gayê gulo heft cilo.

Berhevkar: Temûrê Xelîl

- 1- Qelun
- 2- Se
- 3- Deng
- 4- Mer
- 5- Matrîstang
- 6- Qalgîçek
- 7- Traktor
- 8- Zîman
- 9- Kum
- 10- Aş
- 11- Hiv û stêrk
- 12- Mer
- 13- Kew
- 14- Zîman
- 15- Pîvaz

Gotinên Pêşîyan

Amadekar: Apê Emer

- * Lingê te bişemite tu xwe bigrî, zimanê te bişihite tu xwe nagrî.
- * Zimanê neheqa timîn kin e.
- * Kula dila timîn di dil da.
- * Ku diz ji malê be ga wê di kulekê da jî derkeve.
- * Ku dêlik bi ba be wê se ji Bexdayê jî li lêlimê rabe.
- * Bi xelqê bişewire bi aqilê xwe bike.
- * Bira, neçe ji pišta gura.
- * Dêlika ku jê ye ne tu dêlik e.
- * Hê negihîştine ber avê xwe şelihandin e.
- * Sal bi sal xwazî bi par.
- * Çawa saq e gore liyaq e.
- * Li te rik li min rik nanê binê agir bû qirik.
- * Eysîkê li xwe bişîkê.
- * Golîkê malê bi gayê malê dikare.
- * Golîkê me serê xwe li dîwara dixin dibêjin em jî ga ne.
- * Qiloçê kerê hê derneketi bû, gotin hêj deşîk e.
- * Masî di golê de nayê bazarkirin.
- * Diya damarî bav zalimê kavari.
- * Mêrê pepûkê jinê, mişkê terazinê, bexê ber bizinê,

serfiraz nabe li dinê.

Kurdistan

Evdile Koçer

evdilekocer@yahoo.com

Gundê me, ji her alî ve gundekî pir zengîn bû... Ji fêkiyên rez û bostanên wê bigire, heta hêkên kew û elokan, ji masiyên çem bigire heta goştê pezxezalan, ji şîrê mih û bizinan bigire heta şîrê şêran, hema bêje te çî biviya tê de hebû...

Lê digel vê dayîna Xwedê jî, hema bêje debara me li ser folklorê me ya zengîn bû. Yanî, nan û xwêya me, av û şîva me li ser çîrok, çîrçîrok, pêkenok, destan, heyranok, pahîzok, gotinên pêşîyan, biwêj, lawik, dîlok, dengbêjî û mitirbiyê bû...

Folklor û çanda gundê me ewçend zengîn û xurt bû ku, gundiyên cîran, xwarin û diyariyên xwe didan piştê xwe, li derdora gundê me kon vedidan û bi hefteyan xwe li ber çanda me didan

tavê... Dema ku vedigeriya mala xwe jî, îmana wan kamiltir û mad û mirûzê wan jî xweştir dibû.

Kesên ku gohên xwe didan çîrokên me, te digot qey wekî Evdalê Zeynikê ji nişka ve dibûn çîrokbêj. Destanên me jî, hin kesan dikir qelem û defter û meriv digot

qey mîna Ho-

meros li

s e r

ç e r m ê

b e d e n a

xwe roma-

nên mezin

dinivîsan-

din. Mirovên

ku dengê elok

û mirîşkan ji

wan dihat, de-

ma ku dengê

stranbêjên me

seh dikirin, li welatên xwe dibûn dengbêj.

Ji ber pêkenok û henekên me, çend kes li nexweşiya zikopiştoyê ketine û dû re serê xwe danîne ser axa sar, bi Xwedê ez jî baş nizanîm... Tîqetîqên ku ji wan diçû, mirriyan jî radikir ser piyan. Henek û pêkenokên me rih dida wan mêvanên bejî... Qerf û tinazên me li ser ruyê hin kesan zûka şîn nedibû, lê piştî çend rojan, tovê xwe digirt û ji ber kenê wan, em jî carna aciz dibûn...

Gundiyên me vî karî hem ji kêf û eşqê re dikirin, hem jî qût û perûyên ku pê ve dihat, di ser guhê xwe de diavêtin... Çîrok, li ser zimanê

kal û pîrên me dibû şîr û diherikî. Kal û pîrên ku di şevbuhêrkan de bi têra dilê xwe çîrok û çîrçîrok vedi-gotin, rengê wan geştir û emrê wan dirêjtir dibû...

Lê kesên

*Ez mame di hîkmeta Xwudê da
Kurmanç di dewleta dinê da
Aya bi çi wechê mane mehrûm
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm*

ku wekî

Şehrezad jî, hezar û

yek çîrok baş nizanibûn, zû bi

zû porê wan spî dibû, diranê wan

diket û hêdî hêdî berê xwe didan

wê dinyayê...

Lê divê hûn li ber wan nekevin û dilê xwe jî neşewitînin... Ji ber ku, di nav dia, dûrik, lorîn, stran û tilîliyan de dihatin veşartin. Melayê gundê me li ser kêlên wan çarînên welê dinivîsî ku, mirov jî her dixwesta ku bimira... Ez dikarim bi dilekî rehet bibêjim ku, her çarîneke wî melayî, meriv dibir ber deriyê cinetê.

Xêr û bereketa folklorê gundê me, ne tenê ji bo cinetê miftetek bû, her wiha ji bo bereketa hêkan jî bûbû nîmeteke Xwedê... Mirîşkên gundê me, wekî xweliya Xwedê hêk dikirin û hêkê wan jî girtir bûn. Lê dema ku ew mirîşk bihatana fi-

rotin, li gundên din li êşa zerekê diketan û êdî çîrt jî nedikiran...

Nav û dengê gundê me, çiqas roj diçû, her belavtir dibû... Keçikên gundên cîran ên ku dimalde diman, dema ku ji kezîzerên me baqek heyranok werdigirtin, wekî bayê bezê digihîştin heyran û mirazên xwe... Dîsa xortên wan, piştî ku di mehên pahîzan de çend hefteyan cotkariya gundiyên me dikirin û fêrî çend pahîzokan dibûn, berê xwe didan gundê xwe û hê nedibû zivistan xêlê xwe dikirin...

Lê rojek hat ku, êdî ji derên dûr, mirovên xerîb û ecêb jî dihatin û bi hefteyan dibûn mêvanê şevbuhêrkên gundê me... Yek ji van camêran jî Robarê Berco bû. Ya rastî, navê wî Regor Lescot bû, lê me dikir û nedikir navê wî di hişê me de nedima; hema me jî jê re digot, Robarê Berco. Zilamekî xwînsêrîn û navsere bû. Kêfa me gelekî jê re dihat, lê dîsa jî 40 rojan rezê kalikê min kesixand, heta ku Destana Memê Alan ji devê kalikê min wergirt...

Robarê Berco, yanî Roger Lescot piştî ku ji gundê me çû, navê gundê me jî zêdetir belav bû û li seranserê dinyayê ket...

Her roj hin kes dihatin û diçûn, lê ez ti carî Xalê Saro ji bîr nakim. Dema ku çarîn û nivîsên li ser kêlê tirban ên goristana me dîtibû, feqîro gelekî şaş mabû. Hema bêje zimanê xwe yî biçûk daqurtandibû.

Rebeno, navê xwe jî baş nedigot, lê dîsa jî çarîna li ser tîrba Ehemedê Xanî ji ber kiribû û wekî qe-

sîdeyekî her digot:

*Ez mame di hîkmeta Xwudê da
Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechê mane mehrûm
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm*

Xalo Saro, bi rojan di nav goristanê de hat çû û bi sedan tişt mişt ji melayê me pirsî. Heftetek sax, piştî ta xwe da dîwarê goristana me û tişt mişt dinivîsand. Lê kesî tişteke jê fêm nedikir.

Ma min ê hingê, çawa bizaniya ew Xalê Saro, Sartreyê Fransîz, yanî Jean Paul Sartre bû...? Çawa ku min seh kirî, wî ew çîroka xwê ya bi navê Dîwar jî, li ber dîwarê goristana gundê me nivîsandibû...

Lê bi serê we kim, meseleya Sadiqo hê ji vê jî xweştir bû... Sadiqo (bi awayekî kubarî, xwe bi navê Sadik Hîdayet dida nas kirin, lê me dîsa jî jê re digot, Sadiqo...) piştî ku di şevbuhêrkekê de çîroka Siyabend û Xecê seh kir, êdî goştê kewan jî nexwar. Hema bêhna goşt jî bihatayê, dilê wî dixeliqî û paşê vedireşiya... Xwedê kirî, carna wekî heywanan hin giya miya dixwar, nexwe wê ji nêza bimira gidîî.

Hema bêje bi zikê birçî jî gund veqetiya. Lê min jî fêm nekir; ma çi di wê çîrokê de hebû heyran!?!.. Bi Xwedê Yaşarê me jî (Paşê, bû Yaşar Kemal...) sed caran gohê xwe dabû wê çîrokê û eyb e mirov bibêje, sed caran goştê pezkuyîyan jî bi noşîcan xwaribû, lê qet nebe

madê xwe jî xera nekiribû. Ez dibêjim qey, ji ber wî goştê ku dixwar bû, paşê gelek kitêbên qalind nivîsandin...

Kî dihat gundê me, wekî orf û edetekî; bi roj kar û barê me gundiyan dikir, bi şev jî hem gohê xwe bel dikir û di şevbuhêrkan de wekî sîxuran li me gohdarî dikir, hem jî çaya me dadigirt û ji me re gûz û behîv dişkênd...

Lê Smaîlê Dînik îman ji serê me biribû. Smaîlo (Dû re, ji me re kitêbek şand û li ser wê kitêbê navê xwe wisa nivîsandibû: Samaul Beckett) jî dema ku navê gundê me seh kiribû, bê qutik û şekal berê xwe dabû gund. Lê xwedênehiştîyoo, kar û barê me gundiyan nedikir. Vêca ev ne bes bû, di ser de jî siwalên bêmane û binfilitî ji me dikir û îman ji serê me dibir. Ji me bêtir jî bi dînen gund re mijûl dibû.

Smaîlê Dînik rojekî bangî me gundiyan kir û got ku, divê her kes sibê were ber riya gund da ku ez çend tiştan bibêjim. Lê kes ji me neçû, qet nebe dînekî gund jî neçû. Lê ewî jî ewda xwe li me vekir û ruyê me li dinyayê reş kir.

Rast-derew ez jî nizanim, lê li gorî hin gotinên mêvan û rêwiyan; li ber riya gund, bi navê Li Benda Godot tişt mişt nivîsand li âlema cîhanê belav kir û navê me li dinyayê kir pênc pere. Çawa ku dibêjin, ew Godotê ku behs dikir, sergindorê wekî me bûn...

Axir zeman welhasil kelam, meh û salên me çax û wextên me her ser hev de diqulipîn û ji kîsê bavê me diçû, lê kêf û şahiyên me her wek xwe bûn û tu tişt jê kêm nedibû. Rengînê û xweşikahiya roj û şevên me her eynî bûn, lê mêvanên şevbuhêrkên me carna dibûn hezar... Perû û diyariyên wan di kewar û embarên me de diketan ser hev û gelek caran diriziyên jî. Yanî bi kurtasî tenê mirina Xwedê ji serê me kêm bû...

Lê rojek hat ku, dilsariyek ket nava gund. Êdî em li mirina Xwedê jî digeriyan. Xeberên nexweş her ser hev de dihatin; mizgîniyên nexêr tu carî ji şevbuhêrkên me kêm nedibûn. Li gor hin gotinan, hin mêvanên ku di şevbuhêrkan de gohê xwe didan destan û çîrokên me, dema ku vedigeriyan welatê xwe wan destan û çîrokan vajî dikirin; kirasê xwe yê pînekirî li wan dikirin û dikiran malê welatê xwe.

Ji bo vê rûreşîya wan, melayê gundê me gelek nivîştîyên keskesorûzerî jî çêkirin lê dîsa jî pere nekir. Hin mêvanan jî, klam û stranên me li welatên xwe çirtovirto dikirin, bi devê xwe yê xwar distran û qet nebe êdî navê gundê me jî hilledidan...

Haaaaa, min jî ji bîr kir ku navê gundê me ji we re bibêjim...

Navê gundê me: KURDISTAN e...

Welat û Gelvanî

*Gelvanê gelêm
Herdem şiyar in*

*Li vê gerdûnê
Herdem dizar in*

*Jibona welat
Zahf evîndar in*

*Zana xilas bûn
Qey em bê par in*

*Ber zulma dorê
Bi xwe nikar in*

*Nevî bi derdan
Wer ustî xwar in*

*Gelêk dibînin
Dijî zordar in*

*Omrê wan bîst e
Wek heftê sal in*

*Ew ku ve herin
Bi ax û zar in*

*Xetê bapîran
Guran me xwar in*

*Gel ku nezan be
Dê wer bizar in*

*Şaşiye bêjin
Heta hûn karin*

*Çar alî cîran
Tevî neyar in*

*Gelê qelse mêr
Birçî û jar in*

*Bi zarê xweş tîn
Wek tîremar in*

*Nevîyê Şêro
Şerme bê zar in*

*Bi fen û dekan
Goştê me xwar in*

*Gelê mêrxas in
Bi cî û war in*

*Tev aştî koj in
Wek seyê har in*

*Her serbilind in
Tevî maldar in*

*Ser canê gelêm
Tev xwedî par in*

*Çerxa bîst û yek
Hê em di zar in*

*Em bi wan derdan
Her birîndar in*

*Beşê gelê me
Kîmya û jahr in*

*Gelê sersar in
Bê cî û war in*

*Dunya medenî
Derddî dolar in*

Karakter û rewşa gelê kurd di romana "Fîlozof" de

Huseîn Muhammed

Berî demekê romana nû ya nivîskar birêz Lokman Polat wek diyarî giha destê min. Navê romanê "Fîlozof" e û serrol jî di destê edîb, zana û ronakbîrê kurd, kاتبê Şêx Seîdê Pîranî, welatparêz Fehmiyê Bîlalê Licî de ye. Roman li ser serpêhatiyên wî yên berî û piştî mirinê ye.

Li destpêka pirtûkê ev peyvên navdar ên Zerdûş Spîtama (Zerdeşt) hatine danîn: "Berî her tiştî di ramanê de du cewher afirîne ku cewî ne. Yek rindî ye, ya din jî xirabî, hem di raman hem di axaftinê de kesê zane rindiyê heldibijêre di kar, raman û gotinê de."

Roman qapnêr e, ji 163 rûpelan pêk hatiye û li ser 22 babetan hatiye beşandin. 8 babetên pêşîn ji wan serpêhatiyên, ên ku hê di dema jîndariya Fehmiyê Bîlal de qewimîbûn, pêk tên. Roman bi pêşbirkek siwariyan li Licê dest pê dike û bi xwîn-

dariya eşîrtî ya di navbera du malan de didome. Piştî van herdu bûyeran di demek kurt de bi çend babetan dabax ji serhildana Şêx Seîd Efendî dike. Hê di destpêka romanê de hin karakterên gelê kurd diyar dibin - bi gelek rewîştên din re xwîndariya di nav eşîr û binemalan de, xaîntiya serokeşîr û serekên olî û herwiha jî bê-tifaqiya gel û kêznanî û naîvîtiya serokên kurd. Di herika romanê hemû karakterên din jî yên girîng ên kurdan, bi taybetî yên ku bûne sedema rewşa me ya îroyîn, li ber çav tînin rastin.

Gelek caran kes bi gotinên qenc ên Fehmîyê Bîlal nake û loma ew bi ser nakevin. Tevî ku Şêx Seîd hurmetek mezin dida wî jî, dîsan carinan bi gotina Bîlal nekîr û serhildan tîk çû. Piştî serhildanê serlîstikvanango Bîlal diçe nav Xoybûnê, Serhildana Agirî û Başûrê Kurdistanê jî. Li wir, di nav wan de gelek rexneyên lîrê dike û kêmasî û nakokiyên heyî tîne rûyê wan. Dawiyê Xoybûn jî tîk diçe, Fehmîyê Bîlal bêkeys dibe û dîsan tê li Amedê rûdine. Ew di 80-saliya xwe de - sala 1967an - li Amedê wefat dike û li Licê tê binaxkirin. Bi vî awayî 8 babetên pêşîn bi dawî tînin û bûyerên her 14 babetên din piştî jiyana wî rû didin. Piştî mirina xwe serlîstikvan diçe pêşberî Yezdan û gazinên xwe dike. Yezdan bersiva wî dide ku Ew jî naxwaze ku kurd di vî rewşê de ne lê çî tê serê kurdan, kurd bi xwe sûcdar in. Nivîskar li vir gotinek gelek wategirana pêşiyana dixwe devê Yezdan: "Eger kurme darê ne ji darê be, dar narize." Yezdan ji Fehmî re diyar dike ku îra-

deya kurdan di destê kurdan de ye. Nivîskar bi vî yekê baş eşkere dike ku divê em kesekî ji ber şaşiyên me bi xwe tawanbar nekin û di bêhêvîtiya xwe de gunehên xwe nexin stuyê kesek din. Bi baweriya min, ev raman bi her awayî lojîk û mantiqî ye. Eger Yezdan an jî Felekê ji berî bûna me biryar dabûya ku em ê di jiyana xwe de di filan deqeyê de bêvan tiştî bikin an jî ew tişt dê bê serê me, Yezdanê dadperwer dê çawa hin kes ji me gunehkar û kafir hin jî bêguneh û bawermend bisinifadina madem em bi xwe bi destê xwe nikaribin biryarê bidin ka em çî bikin û çî jî nekin.

Fehmî dibe biheştî û her xweşî, zewq û lezetên Biheştê ji wî re jî tînin dan lê dîsan jî ew ne razî ye: rewşa gelê wî tê de dilê wî dişewitîne, kezêba wî disojîne. Horiyên Biheştê li wî tînin diyarîkirin, ew wan naxwaze: li ser dinyayê zilm û zorî li jinan tînin kirin û li vir jî her heftê jin di şikilê horiyana de xizmeta yek mîrî dikin! Fehmî Yezdan îqna dike ku Ew rê bide Fehmî daku vebigere welatê xwe, bikeve serê serok û ronakbîrên kurd û bibe giyanê wan ê duyem ji bo ku wan ji şaşiyana biparêze û rêya qenc nîşanî wan bide. Yezdan vî pêşniyazê dipejirîne û Fehmî carinan li esmanê Kurdistanê digere û rewşa welat dişopîne û carinan jî di serê hin kesatiyên kurd de wan şîret dike.

Bi vî awayî hemû dîroka van sêçar dehsalên dawîn a Kurdistanê bi giştî û ya Bakurê Kurdistanê bi taybetî di şikilê serpêhatiyên Fehmî yên piştîjiyanî tînin ravekirin. Di nav van

bûyer û rûdanan de Fehmî gelekî diqehire û dilê wî hem bi rewşa welat dişewite û hem jî ji ber neguhdarî û rêşaşiya kurdan diêşe. Fehmî gelek serokên kurd û partiyên wan rexne dike. Bi delîlên eşkere nivîskar diyar dike ku mixabin kurd ji dîroka xwe, ya ku her ji wan re dubare jî dibe, tiştêkî fêr nebûne. Piştî dîtina bi sedan bûyerên kambax û dilperitîn, giyanê Fehmî vedigere Biheştê û êdî naxwaze Kurdistanê bibîne!

Ew li Biheştê dîsan digere û gelek kesên navdar ên kurd dibîne, bi wan re dişewire, ji wan re basa welat dike. Yezdan serayek ji hemû serayên Biheştê xweşiktir çêkiriye û dê ji rizgarkera/ê Kurdistanê re bide diyarî çimkî kurd zorlêkirîtirîn gelê cîhanê bûye. Gelek biheştî salane tên û lê dinerin ka kesek li wê serayê heye ango kesekî Kurdistan rizgar kiriye lê ta niha her sal bi dilên şkestî ve vedigerin. Roja vekirîbûna serayê Fehmî jî li ber deriyê serayê radiweste û bi wan kesên kurd an jî girêdayî kurdan, ên ku tên serayê, re diaxive, kêmasiyên wan tîne rûyê wan û gazinan lê dike. Di nav van kesan de gelek pêşengên kurdan hene lê Hz. Mihemed jî li pêşiya hatiyane û dixwaze ku kurd ji bindestiyê xelas bibin. Fehmî wî bi tûjî rexne dike çimkî belavkerên ola wî li Kurdistanê gelek xwîn rêtine.

Berevajî ku mirov dê texmîn bikira, di Biheştê de jî pevçûn hene û her kes negihaye mirada xwe. Selahedîne Eyûbî ji xaçperestên biheştî tê parastin. Ji ber xweliya laşê Bekoyê Ewan, Zîn û Mem li Biheştê jî nagihin hev. Bi min beşa herî dilte-

zîn û melankolik çîroka du kevokane. Yek ji wan ji ber revîna bi evîndarê xwe û yek jî ji ber ku hatibû tecawizkirin, ji aliyê malbata xwe de hatibûn kuştin, û evîndarê ya pêştir li Biheştê êdî nexwestibû pê re be. Tevî ku çîrokên bi vî awayî herdem di civaka kurd de tîne gotin lê van rojan ev pirsgirêk ji her demê rojîn û aktueltir e. Wer dixwiye ku li Kurdistanê kuştina keç û jinan "ji ber şerefê" gelekî zêde ye û bi taybetî jî li Başûrê Kurdistanê hê jî mişetir dibe. Di nav demek kurt de ajansa nûçeyan a înternetî Kurdish Media gelek kuştinên bi vî awayî radigihîne. Berî du mehan konferansek li ser vê mijarê ji aliyê "Tevgera Jinên Kurd a li Dij Kuştina ji ber Şerefê" de li Londonê hat lidarxistin û mijar bi dirêjî hat gotûbêjkirin.

Di navberê re Fehmî diçe û li Dojehê jî rewşa cehenemiyên kurd dişopîne. Li wir hem ronakbîr û hem jî siyasetmedar pîrr in. Tevî ku bi tenê navê kêman tê beyankirin jî, hemû karakterên kirêt ên van kurdan tîne diyarkirin. Wan li dinyayê maf tîne bû ku bi azadî nerînên xwe bin ziman, lê li vir Yezdan mirada wan hasil kiriye. Siyasetmedar di nav gengeşeyê ne de û li wir jî her yek xwe rast û durist dizane û - heram be - rêyê nade kesek din ku peyvekê jî bîne ziman. Li aliyê din, nivîskar gelekî bi hostane çavnebarî, zikreşî û famkoriya "ronakbîran" jî anîne ziman. Yek ne razî ye çimkî "nivîsa wî hatiye guherandin", helwesta yê din hatiye sansorkirin û hwd. û hezarcarî hwd. Herwiha nivîskar li Dojehê cî ji hin kesên hê

sax û jîndar re jî vediqetîne. Pirraniya wan siyasetmedar in. Tevî ku navê wan hatibe guherandin jî, xwendevan dikare wan ji ber sedemê hatina wir binase.

Fîlozof Fehmiyê Bîlal vedigere Biheştê û taxa pêxemberan û lê bi Îbrahîm Xelîl, Zerdeşt, Mûsa û gelek ên din re dipeyive. Her yekî ji wan mesajek girîng heye. Îbrahîm: min serî li hember Nemrûdê stemkar netewand lê we mîna min nekir; Zerdeşt: we dev ji ola min berda û hûn bûn misilman lê zilma herî mezin ji aliyê misilmanan de li we hat kirin; Mûsa: gelê min ê biçûk di nav bi dehan dewletên ereb de bi tifaq û xwebaweriyê dewleta xwe damezîrand, divê kurd ji umeta min mînan bigirin...

Di babeta dawîn a ku ji 30 rûpelan pêk tê de Fehmiyê Bîlal bi seydayê gewre, bavê neteweperweriya kurd, Ehmedê Xanî re suhbetek dirêj dike. Ew hem li ser wêjeyê û hem jî li ser neteweperweriyê gotûbêjên balkêş dikan. Ji xwe dikare bê gotin ku roman li ser helbesta bi navê "Derdê me" ya di Mem û Zînê de hatiye hûnandin. Gazinê Xanî berî sê sedsalan dikirin, îro jî hemû li meydana ne: bêxwedîtî, bêtifaqî, xaîntî... Pêşî Fehmî li Xanî guhdarî dike û piştê jî jê re basa bûyerên dawîn ên Kurdistanê dike. Dawiyê Xanî diyar dike ku neynika gerdûnê li cem wî heye û ew bi hev re li kurdên li Swêdê temaşe dikan. Mîna ku dikare bê texmînkirin, suhbeta wan dikeve ser weşan û pêşdebirina zimanê kurdî. Nivîskar diyar dike ku gelek pêşdeçûn û gulvedan çêbûne lê dîsan

gelek rexneyên guncav jî dike: kurd hevdu/xwe biçûk dibînin, berhemên hevdu naxwînin, alîkariyê nadin hevdu, ewqas zikreş û dexes in ku çavbariyê nakin xebatên hevdu yên hêja biyecimînin û binirxînin. Nirxandin û rexne tine ye. Eger kesekî rexne kir jî, mebest ne rênîşandan lê rûreşkirin e! Lê pirranî caran berhem - ên hêja û delal jî - derdikevin lê ti kesek di derbareyê wan de tişte-kî nabêje. Gelek kes bi kurdî dinivîsin lê bi kurdî qet naxwînin!!! Ji bo avakirina dewletê jî sê kêmasiyên bingehîn hene. Li gor Fehmiyê Bîlal ew ev in: kêmasiya hîs û şîûra neteweyî, tinebûna zanistîya demokrasîyê û bêpariya ji mejiyê dewletbûnê.

Bi rastî min nedixwest ku ev qas bi dirêjî basa bûyerên romanê bikim lê roman gelekî pirralî ye û hemû rewşa gelê kurd, hemû sedemên vê rewşê û hemû karaktera gelê kurd, ku bûye hoyê rewşê di romanê de tîn holê. Dibe ku parîkî negatîv be lê eger ev roman li zimanên biyanî bê wergerandin û kesên tucaran tişte-kî jî kurdan nebihîstibe jî, dikare hemû tiştên girîng ên girêdayî kurdan bi rêya vê romanê fêr bibe. Helbesta Xanî "Derdê me" piştî sêsed salan jî her derdê me ye. Ez hêvî dikim ku eger kurdek piştî sed salan şûnde vê romana birêz Lokman Polat bixwîne, axînan nekişîne û nebêje: "ax, wele vî camêrî hemû derdên me anîne ziman!". Lê mixabin ez ditirsim ku hingê jî kurd xwe dîsan wiha bibînin loma ev roman dikare ji bo xwiyakirina karaktera gelê kurd bibe klasîk!

Di nav 160 rûpelan de destnîşan-

kirina ew qas tiştan nikare bi asanî bê kirin û hostetiyek bêpayan dixwaze. Lê dîsan em nikarin bibêjin ku roman békêmasî ye. Hin şaşiyên rêzimanî û çapê û hin kêmasiyên teknîkî jî di gelek çiyên romanê de xwe nîşan didin. Ji kêmasiyên rêzimanî herî berbiçav şaşiyên bikaranîna ergatîvê(1) bi taybetî û paşqertafên lêkerî bi giştî ye. Nivîskar di bireserê (casus obliquus) de hertim cînavan ditewîne, mînak: "Wî çû pere da Mela û wî hanî" ku divê bê gotin: "Ew çû, pere da mele û ew anî." Ji cînava kesa yekem a pîrrhejmar re gelek çar paşqertafa lêkerî "î" hatiye bikaranîn (2). Wek din jî gelek kêmasiyên din jî yên paşgirtikên rêzimanî hene. Ji kêmasiyên çapê û rêzimanê carinan wisan dixwiye ku nivîskar bi xwe jî destnivîsa romanê ji berî çapkirinê nexwendiyê! Kêmasiyên teknîkî pêtir di beşa pêşîn ango di dema jiyana li ser dinyayê ya Fehmiyê Bilal derdikevin pêş. Nivîskar gelekî li ser xeta giştî diçe û xwendevan dipirse ka gelo ev roman e yan jî pirtûkek dîrokê ye. Bêguman bi vî awayî xwendevan ji gelek bûyerên dîrokî tê haydarkirin lê bi baweriya min eger ji tiştên bînîqaş ên dîrokî zêdetir ji xwendevan re behsa tiştên kitekit û/yan hestên kesekî bihata kirin, dê balkêştir bûya.

Li şûna gelek peyvên kurdî jî yên biyanî hatine bikaranîn: çayir (mêrg), cennet (biheşt), cehennem (dojeh), elçi (şandî), qedîm (kevn, kevnar), ters/zid (dijber), melayket (firîşte), qawanoz (dewlik/merkane) û hwd.

Lê nabe ku ev kêmasiyên biçûk

bibin sedema wê yekê ku kesek xwe ji xwendina vê romana serketî û delal bide paş. Ev roman a ku ji aliyê bûyerên xwe de dişibe berhema navdar a Dante "Şanoya Xwedayî" - an jî mîna ku hin kes jê re dibêjin "Komedîya Îlahî" -, ji aliyê kesekî de hatiye nivîsîn ku ev hemû rewşa ew dabaş jê dike bi rastî jî dilê wî dipertîne û loma jî nivîskar jî romana xwe ji dil û can nivîsiye. Herwiha ew bûye dengê bi milyonan kesan ên ku dixwazin dengê xwe bilind bikin lê ji ber hin sedemên heyî dengê ji bo derxandina awazan e di qirrika gewriya wan de dixetî û nayê bihîstin.

Dema ku mirov vê romanê bixwîne, divê gelekî bînfirêh û ji dogmatîzmê dûr be çimkî ji bo başkirina rewşa me, nivîskar kêmasî û şaşiyên me hemûyan - siyasetmedaran, ronakbîran, nivîskaran, eşîriyan, şervanan, belengazan û hwd. - tîne ziman. Dibe ku ji ber vê yekê be ku min hê jî di rojname û kovarek kurdî de ne nirxandinek û ne jî nasandinek di derheqê vê romanê de nedît. Ev roman bi rastî jî dengê bû ku min dixwest bibihîzim lê ev deng ji min bi xwe jî nedihat. Birêz Lokman Polat hat û ev asteng jî ji ber sîngê me rakir.

Hêvî dikim ku giranî û girîngiya vê romanê îro bê famkirin; sibê êdî dikare dereng be!

Navnîşana xwestinê:

Helwest Förlag
Tensta Alle 43. 2tr.
16364 Spånga / Sweden


Du Kavil

Osman Mehmet

di berfê de tu têleke sentûrê yî
 tûya tu li bin bêriya siya xwe
 dike
 berf dibare ser te
 muzîk dest pê dike li keviyeke
 jiyane
 Zeman dijene
 kavil û zarok guhê xwe didin te
 -dilekî xwe
 ji ser xwarina jîjoyan radibin
 nêçîrvanên qesrî
 ji nav perengên zemanekî
 radibin tên
 ji bîr nakin tîr-kevan û xencerên
 xwe
 zarok zarokên vî zemanî ne di
 dawa kavilan de
 çiya çiyayekî sikurxwar weke
 hejîreke maran
 nerm in singikên berfê yên ku li
 te dikevin
 tûya li navbera du kavilan û di
 ser wan re
 berê ne kavil bû yek
 yê din jî berê berê -zemanekî ku
 tu bîr nabî
 tûya li navbera du kavilan û di
 ser wan re
 difikire çima ew nabe kavil
 difikire ma dar dibin kavil
 difikire çima bîranîn dibin
 kavil
 nafikire ku mirov dibin kavil

di berfê de gava dilê te têleke
 sentûrê ye
 jiyana te (tê bîra te) tiliya ku
 digirî li ser têla stûr a kemanê
 tiliya ku digirî
 tiliya li nav her du kavilan
 dijîkire li ber baranê yek hat
 kuştin fecrekê
 difikire ne baranê ew kuşt
 difikire ne ji bo ku fecrek ji
 fecrên zemên bû ew hat kuştin
 difikire tiliyên wî yekî meşiyabûn
 hatibûn cem
 nafikire ku ew bi xwe bi kîjan
 destî ve bû
 dibin şembelîlk newayên te bi
 destê kêliyên jibîrkirinê
 bi çiqên wê dara tûyê ya tenê û
 tazî ve
 winda dibin nêçîrvan di bahoza
 berfê de
 zarok dibin pepûk raserî çiya û
 kavilan
 tu vediguherî siya tûyê li
 beharekê -di ser te re hetaveke
 cinoyî
 kavilek badide rûyê xwe ji
 zemên
 kavilê din bi lêvîne ziwa
 radimûse eynî zemanî

Kumreş



Mûsa Vazgalî

Sofi Heydo sinciriye. Serê xwe şelûpelan dixê. Kasikên çavan lê sor bûne. Mîna canegakî erdê pîkol dîke, çî têkeve ber di ser serê xwe re war dîke. Sturî lê sor bûne wê bi van qîloçan zîkê hinekan bi-qelêşe, hûr û pîzûrê wan li navberê têxe exme. Hêrs û zîkêşa Sofî ya îşev jî pêlekê vir de heya vê xêlê hêrs û zîkûşa bizirxanê giş-tî ye. Sofî li ser navê vî gundê bêyom ev mêrxasî hildaye ser milê xwe. Tu kesî ev yek pêşkêşî wî nekiriye, tenê ev bênamûsiya han a di gund de ev tirêtek e diqewime, firşikê gundiyan pê teng bûye, qebûl nekiriye, xwîna wî ev yek hilnedaye û bi şandilxwazî wî ev hildaye ser milê xwe. Divê ev qîleya ku bi netika gund ve girtiye bê şûştin, divê ev bênamûsiya hatiye ser pêsa gundiyan bê qewirandin. Navê naxirê bi çêlekeke rêxazî neyê xerakirin.

Ev mesele divê îşev bê saffîkirin û divê vî karê hanê jî şîrhelalek vepelike navberê, sîngê xwe bide pêş, bêyî ku kesek jê re bibêje, tê de biçîke, poz lê bişewite û xwîna ku tu carî nabe av jî xwe berde û gelek tiştên mêrxasiyê û gelek hindirên xîretê li xwe mikur bike û kumê xwe bide tel.

Ev barê han, Sofî Heydo bêyî tu kes jê re bibêje hilgirtiye û tu haya kesî jî jê tune. Ew ê îşev navekî li ser xwe bilind bike ku heya zuriyeta vî gundî li ser rûyê dinyayê hebe bi pesn salixan bidin.

-Meriv sîr û pîvazan nexwe bêhn ser meriv nakeve. Qey vî gundê wêrtas tiliya xwe bêhn kiriye ku ew dêla jî dêlan destê

xwe digerîne. Bi sê telaqên bêfita ez îşev poçirka wê forqê bi şêmîga stûqalindê bavê wê ve mix nekim, qey tu kur ji bavan neketine. Bi şefeqê re qey ez wê forqê sax bihêlim, bila êdî bi vî navî gazî min nekin. De wa ye ez çûm.

Wextê Sofî û jina xwe li ber şêmîga hewşê bi devjeniyên dihatine hev, hevûdin kaşberkaş dikirin ev giliyên xezebê ji nava diranên Sofî yê kelevajî fistiqîn. Şeva ker û lal jî bi vê yekê re şahid bû ku êdî mirin heye vegera Sofî ji vê riyê tune.

Jinika tîfal di Sofî de dardabûbû ku wî ji biryara wî vangêr bike, lê Sofî li qitê bû. Tu dibêjî quzotiyeye êgir bû çik jê dibarî. Carekê kumê xwe li erdê xistiye û telaqan ji binî ve avêtiye. Kul bi xwe li pêşiyê be jî, ew ê çav girtî bi ser de here. Wî heta niha ji Cemo re dabû hev û îşev êdî her tişt ji şorê derketiye. Ev kar ê îşev yeqîn kuta be û serê lodê wê bê girtin.

Ew kesê ku îşev dest bibe xwe û hewl bide ku Sofî ji biryara wî vangêr bike êdî bila ji ser xwe re tu mêrxasan nebîne. Bila kumê xwe bide tel û mêrxasiyeye erdê dîtî û bêmiz têxe binê potê xwe û nav û pesnên xwe ji heftê heft neviçirkên xwe re mîrat bihêle. Lê kîjan pelewana, na kîjan qefsar, kîjan qafsar ê vê yekê li xwe dayne û bi Sofî re qayîşê bikişîne. Ez bi serê we û heftê bavê we, ewî ku vê yekê bide ber çavê xwe û destê xwe dirêjî vî agirî bike, her wisa gurçikên wî çar in û her çar jî ji polayê ne. Tu kes nikare bi min bide bawerkirin ku kesine bi vê yekê bihisin û ji paşla jina xwe derkevin û rê li Sofî bibirin. Kîjan ûrtqelîn ê mala xwe bi destê xwe wêrtas bike û culetekî li dijî çavsorekî mîna Sofî Heydo nîşan bide. Kîjan lûlepêberjêr vê yekê wek riyekê ji xwe re vebijêre,

wisan e ku wî xwîna xwe daye ser destê xwe û ji canê xwe yê şêrîn bêzar e. Jixwe yê heya niha ji hespa Sofî re ker gotine, yeqîn bibin ku wan hêlîna xwe li ber perê esmên jî çêkiribe jî, ji şetele û şiwûka Sofî nefilitîne. Di rewşeke wiha de, ka kîjan ê mêjiyê xwe bi kadînek kayê ve bixwe û xwe li Sofî dayne. De ka em ê binihêrin kî ji piştava bavê xwe ye, bila ji mala xwe averê bin û nêzikî Sofî bin û rê lê bibirin.

Heke bibêjin jina wî ev culet nîşan daye, ew yek jixwe ji binî ve dereweke bêxwê ye. Belê, wê tiştêkî wisa ce-riband, lê belê ne bi wî celebî bû û dîyê wê jî zêde bilind nebû. Wê jî binê guliyê xwe xwirand û xwe xiste qilinç û di ciyê xwe de sekinî. Jinika tîfal heya ber derê hewşê li pey Sofî ket, xwe avête dest û piyên wî, lavayiyên derûdinê lê kirin û lê xiste arzarî. Lê belê her tişt badilhewa çû. Naxêr, lavayî û bergerînen jinekê jî ew nerm nekir. Wî carekê bêhna xwînê hilkiribû û talaşa xwe tu kesî nedigirt. Ne jina wî, an ne jî yekî din -Xwedê bi xwe jî li jor gazî bikira- ew venedigerî. Herçî jina xwe mîna mêşeke vizvizok tepeqûn dikir. Heta bêyî ku ji bîr bikim bibêjim, wî lûleya tîfingê xiste nava sîngê jinika reben, "Dixwazî guleyeke xwe jî sewa te dêris bikim." got û mîna mûmarekî di nava kuçeya şereş de xijikî û berê xwe da mala Cemeqûnekê.

Belê, waxtê wî bi wê gefegurê berê xwe da mala Cemeqûnekê, jina wî ya rojnêdîtî li wê bestê tiliya wê di dêv de ma. Tiştê ji destê wê dihat bi tenê di canê xwe de dixiste porteport û çûkeçûk. Bêyî ku zêde çermê rûyê xwe biqelişîne, neynûkên xwe di çermê xwe de dikir û berjêr qamprû dikir. Xêleke xurt her wisa di halê xwe de got û be-

riya ku derê malê di ser xwe de bigire, zirzeya devê xwe di ser pêparê Ceme-qûnekê de xera kir. Tu mirî û zindiyên wê di qulekê de nehiştin û her yek anî bi pênc qurûşên qul asê kirin.

Ev tirêteke di nava Bizirxanê de, Cemoya bûka piştperdeyê serê mêrê xwe winda kiriye, bûye benîşteki qanûkê yê qirçqirço, ketiye devê xelkê. Kesek ji wê û ji tevgera wê pakiyekê xeber nade. Her kes pê hisiyaye ku ew destê xwe digêrine. Berê pêşiyê di nava jinan de, li ser kaniyan weke mijareke ku pê devê xwe vala nehêlin qal kirin, di pey re ev gilî geriya û her geriya.

Mêran li serê kûlikan ev gilî xistine mijara qaleqala xwe û dîranên xwe sîqandin. Jinan dema ku li ser kaniyê av tijî kirin, serê giliyên xwe bi vê xeybê vekirin û agir lê barandin. Der-gîstiyar gava ku keys dîtî ku di qulçekî tarî de hevûdin bibînin, bi vê nebaşiyê hevûdin serwest kirin. Zarokan gava ku bi hev re çêr kirin, navê Cemo li diya hevalê xwe kirin. Lê di axirsiyê de, hemû di "pêşdirêj parsîxwar in" li hev dikirin.

Gava ku Sofî Heydo bi keledizî hilkişiya ser kuleka xaniyê Cemo, di gund de du çira diçirûsîn û Cemo li bîr devê sandoqa cihêzê xwe qulefiskî li sandoqê dihurcîlî.

"Ev forqa karê xwe dike ku bide pey qûna tolekî pêxas qey." Sofî di dilê xwe de wiha digot û li ser piyê kulekê xwe ditiftifand.

Sofî Heydo li ser piyê kulekê, çavê wî li hundir, ketibû nava xalîşeyên ku çawa wê û ew mêrikê bi wê re bi hev re li ser mîzê bigire û fitrê wan li wê derê xweş bike.

Cemo ji ber sandoqê rabû, devê wê girt û çend tiştên ji wir derxistibûn da-

nîne ser devê sandoqê. Hat li ber teştê serşokê ya ku danîbû nava xênî, sekinî. Berê pêşiyê şarên li dora serê xwe yeko yeko vekirin û tevî kofiyê virvirandine çimeke xênî. Gongila porê wê mîna lodekê li ser serê wê derkete holê, porekî reşqîr; te digot teniya sêlê ye, na ne tenî, ji teniyê jî reştir tiştêki din e ku teniyê jê re ta badida. Her wekî bi edetî di hubreke îlahî de kirine ew qas reş! Porê xwe di ber de girt, du sê caran dawêşand û avête nav milên xwe. Por di navmilê re heya ser kulêmekan dirêj bû û ma. Pey re dest pê kir yeko yeko dêreyên xwe yên pêşî vekirî ji xwe kirin. Yeqîniya te ji Xwedê hebe xêncî mêzer û kirês, heft dêreyên rengreng. Dêreyên bi her cure rengî; zer, belek, sor, reş, şivîşivî û bi her cure qumaşî; gulavtûn, mexmer, pazên, çît.... Piştî ku hemû dêre ji xwe kirin, bi tenê li ser qama wê ya mîna spîndarekê kiras û hevalkirasekî pitpitî mabû. Mîna ku bedena xwe hînî tazîtiyê bike, an jî xurek li bedena wê meyser be, bi qasî xêlekê pêşir, pişt û binçengên xwe xwirandin.

Dema ku Cemo xwe dikeland, na ne waxtê ku xwe dikeland, waxtê ku dêrê ji xwe yeko yeko dixistin, Sofî hêdî hêdî destê xwe li nava kejika rûyê xwe de digêrand û hêdî hêdî agirê dilê wî diqulipî ser hin tiştên din Agir di celebekî din digihurî. Biryara dilê wî jî hêdîka serobino dibû. A ji wê xerabtir, piştî ku Cemo beroşa li ser kuçikê li binxênîyê anî, li ber teştê danî qewimî. Cemo kiras ji ser serê xwe re şiqitand û pey re jî hevalkiras li pey wî avête kêlekeke teştê. Kelexûyek li bedena Sofî hilat û çav di sêrî de bûne pel. Cemo li ber çavên Sofî di teştê serşokê de, mîna sülêvarikekê dipirpitî. Her taseke avê ya di ser serê

xwe de dikir, heya ji nava hingilan re digihîste binê kapê wê, li ber çavên Sofî dibû şiveriyek û leylan dida. Dev li Sofî bûbû keleşeyekî xirbe, hindik dima ku gilêza wî bê hemd biniqute nava ava teştê serşokê.

Çawa ku Cemo ji serşokê derket û kirasekî çîfîn li xwe kir, hê hê jî nayê bîra Sofî ka ew çawa ji wir derketiye. Heke ev ne xewnek be, Cemo bi emar ji teştê derdikeve û li ber çavên Sofî xwe zuha dike û kirasê xwe li xwe dike, lê Sofiyê reben heke hiş pê ve mabe û çav şêfî nekiribin, divê dîtibe. Lê Sofî dibîne ku hêt û gîten wê yên rûyê rojê nedîtî li ber cavan dikevin û cardin xwe di nava pêşê dêre de vedişêrin.

Cemo vê carê dewsa dêreyên pêşî vekirî fîstaneke pêşgirtî yî bajêr li qama xwe kir, ji ser devê qûtiyê tîtikeke biçûk hilda û li pêş neynikê sekinî. Bi serê tiliya xwe ji tîtikê soraveke sor hêdî hêdî di hinarikên sifetê xwe da, di pey re hinek jî li ser lêvên xwe yên tîje gerand, lêvên xwe mîna ku tiştêkî bimije bi hev da û pey re bi qelemeke reş birî û mijangên xwe bi emar kil kir. Rûyê wê yê xêlekê berê biziyayî û spîçolkî aniha mîna sêveke kulo gevez dikin. Çavên wê yên mîna du tasan di nav sorbelekiya sifetê de diçeyîsin. Porê xwe nexiste gulî û peragende li sermilên xwe belav kir. Por dîsa heya ser kulêmekan daket ser taximeke şefî jî ji ser sandoqê hilda, li ber gerdana xwe ya vekirî girêda.

"Nan bi rûyê xwe ve tê xwarin." Sofî fikirî.

Cemo mîna ku li sergazekî li hemberî arzebayekî pêşên xwe bide bê, milên xwe vekirin, mîna kerkeneyeke li dor lempê bipirpîte li dor xwe zivirî, piyê wê li teştê aravê ket, sekinî û teşt rakir li qulçekî xênî danî, nava

odeyê ji xwe re fireh kir. Dîsa bi he-man rengî zivirî û zivirî... Neynik hilda li rûyê xwe nihêrî, dîsa danî ser sandoqê. Ev dor hev zivirîn têra niv saetekê domand, di pey re tevgera wê her ku çû kêmtir bû. Hêdî hêdî dihat fêmkirin ku Cemo kerba xwe şikestand û westiya û ber bi beroşê avê çû. Ava di beroşê de mayî çeng kir û li rûyê xwe reşand. Bi serê tiliyên xwe ew sorav û kilên li ser rûyê xwe jê bir. Bi pêşa dêre rûyê xwe zuha kir, vege-riya şarek hilda da serê xwe û ber bi nivînê xwe çû. Beriya ku têkeve nava nivînan, pîlta lempeyê kêmkir û pif... Çavê Sofî di valahiya tariya xênî de daliqî man.

Mîna ku ji kerê daketibe inirî. Sofiyê mêrxas him ji dêre mabû himjî ji mizgeftê. Tepeke li sêrî, yeke li qûnê, ji ser kulekê rabû, bi dilekî kul, bi serrekî gêj xwe ji sura hewşa mala Ceme-qûnekê avête nava kuçeyê û di nava tariya dilê xwe de, ber bi mala xwe kuliya. Mîna mirovekî dest ji ber halê xwe hildabe, pirçiyekî tal li rûyê wî ketibû û qermîçekên rûyê wî şerm û poşmanî û mêrxasiyeke têkçûyî hildîçande xwe, li navberê peregende sekinî, qîleya li netika wan bi benîşteki ve zeliqîbû. Dîn û îman li kuncêkî mizgeftê diqeliya. Sofî derdê bi ser kulan ketibû nava Xelîl û Celîl. Şev hatiye nîvekî şevê, Sofî li kuçe û kolanan, li pey heyfa qûna dayê çûbû, lê serê bavo jî dabû ser û posîde posîde takara stuyê xwe dixwirand û riya mala xwe digirt. Xêncî lempeya mala Sofî tu çira veketî nemabûn û jina Sofî ya reben Têlo jî bi tena serê xwe li malê ye...

Gelo yek ji ber xewa rabe û derkeve destavê, wê ji bo çiraya mala Sofî ya nivê şevê wê çî bifikire? Qey kumreşiya wî dê pê negire.

FIRAT CEWERÎ

Li mala
Mir Celadet Ali Bedir-Xan



NÛDEM

FIRAT CEWERÎ

Romanseke çilmisi



NÛDEM

FIRAT CEWERÎ

Rewşeta xer



NÛDEM

ROJEN BARNAS

Şi'r

1.



NÛDEM

PER NILSSON


Ciwanên îro



NÛDEM

HENNING MANKELL

Hingura êvarê



NÛDEM

DERKETIN

Navnîşana xwestinê:

Weşanên NÛDEM

Box: 177, 177 23, Jarfalla-Sweden

E-mail: nudem@telia.com

Weqfa Çand û Lêkolînî ya Kurdî



KÛRT-KAV

**Li zimanê xwe û li
weqfa xwe xwedî derkeve!**